


RÊZIMANA KURMANCÎ

Ferhad Mûsa
Vîyan Hesên

 SZK



RÊZIMANA KURMANCÎ

Ferhad Mûsa


Vîyan Hesên

Ziman

 SZK
2007

RÊZIMANA KURMANCÎ

Ferhad Mûsa
Vîyan Hesên



SZK 01 | Ziman 01

Rêzimana Kurmancî

Ferhad Mûsa

Vîyan Hesên

Edîtorî

Izedîn Mihemed

Redakte

Elî Evdo

Rûpelsazî

Ferîd Xelîl

Bergsazî

Mihemed Şêxo

Çapa yekem

Qamişlo, 2023

Weşanên SZKyê, Qamişlo



✉ szkkurdi@gmail.com

☎ 00963992854574

Danasîn ne tê da, bêyî destûra SZKyê nabe ku ev berhem ji nû ve bihête çapkirin û weşandin. Hemû mafên vê berhemê ji bo SZKyê parastî ne.

Ferhad Mûsa

Sala 1991ê li bajarê Qamişloyê hatiye dinyayê. Enstîtuya Zanistên Perwerdehiyê qedandiye. Ji sala 2020î ve endamê Saziya Zimanê Kurdî ye.

Vîyan Hesen

Sala 1996an li Dêrika Hemkoyê hatiye dinyayê. Ziman û Wêjeya Kurdî li Zanîngeha Rojavayê qedandiye. Ji sala 2019an ve endama Saziya Zimanê Kurdî ye.

NAVEROK

Pêşgotin.....	21
1. DENGNASÎ.....	23
1.1. Deng, fonem, alofon û tîp.....	25
1.2. Alfabeya kurmancî.....	25
1.3. Dengên hilmandî û nehilmandî.....	26
1.4. Dengnedêr li gor jenînê.....	27
1.5. Hin diyardeyên dengnasîni.....	28
1.5.1. Asîmilasyon.....	28
1.5.2. Jêçûna dengî.....	29
1.5.3. Pevgirêdan (peydabûna dengî).....	31
1.6. Kîte.....	33
1.7. Fonemên nekertî (raparçeyî/jorparçeyî).....	34
1.7.1. Guvaş.....	35
1.7.2. Awaze.....	36
2. MORFOLOJÎ.....	39
2.1. Morfem, alomorf û bêje.....	41
2.1.1. Morfem.....	41
2.1.2. Alomorf.....	42
2.1.3. Bêje.....	42
2.2. Bêjesazî.....	43

2.2.1. Lêkdan.....	44
2.2.2. Dariştin.....	44
2.2.3. Guhastin.....	45
2.2.4. Deynkirin.....	47
2.3. Kêşan (înfleksyon/inflection).....	47
2.4. Gire.....	48
2.4.1. Gireyên kêşanê.....	48
2.4.2. Gireyên dariştinê.....	52
2.5. Bêje ji hêla sazûnê ve.....	59
2.6. Cureyên bêjeyan (beşên axiftinê).....	61
2.6.1. Navdêr.....	63
2.6.1.1. Kategoriyên navdêran.....	63
2.6.1.1.1. Li gor taybetmendiyên heyberan.....	63
2.6.1.1.2. Li gor hestpêkirinê.....	63
2.6.1.1.3. Li gor hejmarbariyê.....	64
2.6.1.1.4. Bêjesaziya navdêran.....	65
2.6.1.2. Kêşana navdêran.....	65
2.6.1.2.1. Hejmar.....	66
2.6.1.2.2. Zayend.....	70
2.6.1.2.3. Nasyarî û nenasyarî.....	74
2.6.1.2.4. Rewş.....	75
2.6.1.2.5. Îzafe.....	85

2.6.1.3. Peywira navdêran a rêzimanî.....	88
2.6.2. Cihnav.....	89
2.6.2.1. Cureyên cihnavan.....	89
2.6.2.1.1. Cihnavên kesî.....	89
2.6.2.1.2. Cihnavên nişander.....	91
2.6.2.1.3. Cihnava veşeroke: "xwe".....	94
2.6.2.1.4. Cihnava paşnûsek: "-ê".....	96
2.6.2.1.5. Cihnava hevûdinî.....	97
2.6.2.1.6. Cihnavên nenasyar.....	100
2.6.2.1.7. Cihnavên hejmarî.....	101
2.6.2.1.8. Cihnavên pêwendiyê.....	101
2.6.2.1.9. Cihnavên xwedîtîyê.....	103
2.6.2.1.10. Cihnavên pirsyarî.....	104
2.6.2.2. Bêjesaziya cihnavan.....	105
2.6.3. Kar.....	106
2.6.3.1. Rader.....	106
2.6.3.2. Pareng (partîsîp).....	106
2.6.3.3. Kar ji hêla watayê ve.....	107
2.6.3.4. Kar ji hêla hêzê ve.....	108
2.6.3.5. Kar ji hêla kêşanê ve.....	110
2.6.3.6. Kar li gor peywirê.....	111
2.6.3.7. Bêjesaziya karan.....	115

2.6.3.8. Hin karên xwedî taybetmendiyên cuda.....	118
2.6.3.9. Kêşana karan.....	133
2.6.3.9.1. Reh (rayek).....	133
2.6.3.9.2. Rawe.....	138
2.6.3.9.2.1. Raweya ragihandini.....	138
2.6.3.9.2.1.1. Dema niha.....	139
2.6.3.9.2.1.2. Dema dahati.....	141
2.6.3.9.2.1.3. Dahatiya tamam.....	142
2.6.3.9.2.1.4. Dahatiya bori.....	143
2.6.3.9.2.1.4.1. Dahatiya danani ya sade.....	143
2.6.3.9.2.1.4.2. Dahatiya danani ya dûr.....	144
2.6.3.9.2.1.5. Dema bori ya sade.....	145
2.6.3.9.2.1.6. Dema bori ya berdewam.....	147
2.6.3.9.2.1.7. Dema bori ya tamam.....	148
2.6.3.9.2.1.8. Dema bori ya dûr.....	150
2.6.3.9.2.2. Raweya fermani.....	152
2.6.3.9.2.3. Raweya danani.....	154
2.6.3.9.2.3.1. Dema niha ya danani.....	155
2.6.3.9.2.3.2. Boriya sade ya danani.....	156
2.6.3.9.2.3.3. Boriya dûr a danani.....	158
2.6.3.9.2.3.4. Boriya tamam a danani.....	159
2.6.3.9.2.3.5. Raweya Divêti.....	161

2.6.3.9.2.3.6. Raweya Bilani.....	163
2.6.3.9.2.3.7. Raweya xwasteki.....	164
2.6.3.9.2.3.8. Raweya merci.....	166
2.6.3.9.2.3.9. Raweya dibeti.....	170
2.6.3.9.3. Xuyang.....	171
2.6.3.9.4. Avani.....	173
2.6.3.9.4.1. Avaniya aktif (lebatî).....	174
2.6.3.9.4.2. Avaniya pasîf (tebatî).....	174
2.6.3.9.4.3. Avaniya hokari.....	177
2.6.4. Hevalnav.....	179
2.6.4.1. Cureyên hevalnavan.....	179
2.6.4.1.1. Hevalnavên çawanîyê.....	179
2.6.4.1.2. Hevalnavên nişander (diyarkerên nişander).....	182
2.6.4.1.3. Hevalnavên nenasyar (diyarkerên nenasyar).....	183
2.6.4.1.4. Hevalnavên hejmarîn (diyarkerên hejmarîn).....	184
2.6.4.1.5. Hevalnavên pirsyari (diyarkerên pirsyari).....	185
2.6.4.2. Fraz û hevokên hevalnavi.....	186
2.6.4.3. Bêjesaziya hevalnavan.....	187
2.6.4.4. Peywira hevalnavan a rêzimanî.....	189
2.6.5. Hevalkar.....	190
2.6.5.1. Cureyên hevalkaran.....	190
2.6.5.1.1. Hevalkarên çawanîyê (rewş).....	191

2.6.5.1.2. Hevalkarên demê.....	191
2.6.5.1.3. Hevalkarên cihî.....	192
2.6.5.1.4. Hevalkarên radeyî.....	193
2.6.5.1.5. Hevalkarên dubarekirinê.....	193
2.6.5.1.6. Hevalkarên sedemîn.....	194
2.6.5.1.7. Hevalkarên cextdar.....	194
2.6.5.1.8. Hevalkarên guman û pêşbînîyê.....	195
2.6.5.1.9. Hevalkarên nirxandinê.....	195
2.6.5.1.10. Hevalkarên neyîniyê.....	196
2.6.5.1.11. Hevalkarên nişander.....	196
2.6.5.1.12. Hevalkarên pirsyarî.....	197
2.6.5.2. Fraz û hevokên hevalkarî.....	199
2.6.5.3. Bêjesaziya hevalkaran.....	201
2.6.5.4. Berawirda hevalkaran.....	203
2.6.5.5. Peywira hevalkaran a rêzimanî.....	205
2.6.6. Daçek.....	206
2.6.6.1. Bêjesaziya daçekan.....	206
2.6.6.2. Peywira daçekan.....	208
2.6.6.3. Têkiliya daçekan bi beşên din ên axifinê ra.....	213
2.6.6.4. Hin xalên din der barê daçekan da.....	216
2.6.7. Gihaneke.....	218
2.6.7.1. Gihaneke li gor peywirê.....	218

2.6.7.1.1. Hevgihaneke.....	218
2.6.7.1.2. Bingihaneke (gihaneke alîkar).....	218
2.6.7.2. Gihaneke li gor watayê.....	219
2.6.7.2.1. Gihaneke zêdeker.....	219
2.6.7.2.2. Gihaneke dijber.....	219
2.6.7.2.3. Gihaneke ronîker.....	220
2.6.7.2.4. Gihaneke demê.....	220
2.6.7.2.5. Gihaneke merci.....	221
2.6.7.2.6. Gihaneke cudaker.....	221
2.6.7.2.7. Gihaneke hevkarîyê.....	221
2.6.8. Bang.....	223
2.6.8.1. Cureyên bangê.....	223
2.6.8.1.1. Bangên sereke.....	223
2.6.8.1.2. Bangên nesereke.....	224
2.6.8.2. Bang ji aliyê watayê ve.....	225
2.6.8.2.1. Bangên kêfxweşî û ecibandîne.....	225
2.6.8.2.2. Bangên xemgînî û aciziyê.....	226
2.6.8.2.3. Bangên matmayîne.....	226
3. RISTESAZÎ.....	227
3.1. Fraz, hevok û riste.....	229
3.1.1. Fraz (phrase).....	229
3.1.1.1. Cureyên frazan.....	230

3.1.1.1.1. Fraz a navdêri.....	230
3.1.1.1.2. Fraz a karî.....	231
3.1.1.1.3. Fraz a hevalnavî.....	232
3.1.1.1.4. Fraz a hevalkarî.....	233
3.1.1.1.5. Fraz a daçekî.....	234
3.1.1.2. Peywira frazan a rêzimanî.....	234
3.1.2. Hevok	237
3.1.2.1. Cureyên hevokan.....	237
3.1.2.1.1. Hevoka sereke (bingehîn).....	237
3.1.2.1.2. Hevoka nesereke (alîkar).....	237
3.1.2.1.2.1. Cureyên hevokên nesereke (alîkar).....	238
3.1.2.1.2.1.1. Hevoka navdêri.....	238
3.1.2.1.2.1.2. Hevoka pêwendiyê (hevoka hevalnavî).....	238
3.1.2.1.2.1.3. Hevoka hevalkarî.....	238
3.1.2.1.3. Hevoka navberî.....	239
3.1.3. Riste.....	240
3.1.3.1. Hêmanên risteyê.....	240
3.1.3.1.1. Biker.....	240
3.1.3.1.2. Pêveber.....	241
3.1.3.1.2.1. Kar.....	243
3.1.3.1.2.2. Temamker.....	243
3.1.3.1.2.3. Têrker.....	245

3.1.3.2. Peyvrêzi.....	246
3.1.3.3. Rêkeftina biker û berkarê bi karê ra.....	247
3.1.3.3.1. Ergatîfî.....	247
3.1.3.4. Dahûrandina hin risteyan.....	249
3.1.3.5. Riste ji aliyê binyadê ve.....	251
3.1.3.5.1. Risteya sade.....	251
3.1.3.5.2. Risteya lêkdayî.....	251
3.1.3.5.3. Risteya têkel.....	252
3.1.3.6. Riste ji aliyê watayê ve.....	252
3.1.3.6.1. Risteya ragihandinî	252
3.1.3.6.2. Risteya fermanî.....	253
3.1.3.6.3. Risteya pirsyarî.....	253
3.1.3.6.4. Risteya dananî.....	253
3.1.3.6.5. Risteya bangî.....	254
3.1.3.7. Veguhastina axiftinê.....	255
3.1.3.7.1. Veguhastina rasterast.....	255
3.1.3.7.2. Veguhastina nerasterast.....	256
4. WATANASÎ.....	259
4.1. Cureyên watayê.....	261
4.1.1. Wataya bingehîn.....	261
4.1.2. Wataya mecazî.....	261
4.2. Têkiliya watayî ya di navbera peyvan da.....	261
4.2.1. Peyvên hevwatera.....	262

4.2.2. Peyvên dijwata.....	263
4.2.3. Peyvên hevnav.....	264
4.2.3.1. Peyvên hevdeng.....	264
4.2.3.2. Peyvên hevtîp.....	264
4.2.4. Pirwatayî.....	264
4.2.5. Cotpeyv.....	265
4.3. Yekeyên watayê.....	266
4.3.1. Morfema bend.....	266
4.3.2. Bêje.....	266
4.3.3. Fraz.....	266
4.3.4. Riste.....	266
4.3.5. Deq (text).....	267
4.4. Rolên watayî.....	267
4.4.1. Kara.....	267
4.4.2. Kartêkiri.....	268
4.4.3. Taqîker.....	268
4.4.4. Wergir.....	268
4.4.5. Encam.....	268
4.4.6. Navgîn.....	269
4.4.7. Cih.....	269
4.4.8. Wext.....	269
4.4.9. Jêderk û armanc.....	269

5. RASTNIVÎSÎN.....	271
5.1. Nivîsîna tîpên girdek û hûrdek.....	273
5.2. Nivîsîna "î, ê" ya berî "y" yê.....	281
5.3. Nivîsîna paşdaçekan.....	281
5.4. Dubarekirina tîpekê.....	282
5.5. Nivîsîna gireya neyînîyê "ne-".....	283
5.6. Nivîsîna daçekên "bî" û "bê" yê.....	285
5.7. Ketina "bî-" ya dananîyê ji kara bûnê.....	286
5.8. Nivîsîna gireyên kesî (im/me, î/yî, e/ye, in/ne).....	286
5.9. Nivîsîna hin peyvên.....	287
5.10. Nivîsîna karên lêkdayî.....	288
5.11. Nivîsîna cotpeyvên.....	290
5.12. Nivîsîna hejmarnavan.....	291
6. XALBENDÎ.....	295
6.1. Nîşandekên xalbandîyê.....	297
6.1.1. Navber.....	298
6.1.2. Xal.....	298
6.1.3. Bêhnok ,.....	299
6.1.4. Xalbêhnok ;.....	301
6.1.5. Cotxal :.....	302
6.1.6. Sêxal	303
6.1.7. Pirsnişan ?.....	304

4.2.2. Peyvên dijwata.....	263
4.2.3. Peyvên hevnav.....	264
4.2.3.1. Peyvên hevdeng.....	264
4.2.3.2. Peyvên hevtîp.....	264
4.2.4. Pirwatayî.....	264
4.2.5. Cotpeyv.....	265
4.3. Yekeyên watayê.....	266
4.3.1. Morfema bend.....	266
4.3.2. Bêje.....	266
4.3.3. Fraz.....	266
4.3.4. Riste.....	266
4.3.5. Deq (text).....	267
4.4. Rolên watayî.....	267
4.4.1. Kara.....	267
4.4.2. Kartêkiri.....	268
4.4.3. Taqîker.....	268
4.4.4. Wergir.....	268
4.4.5. Encam.....	268
4.4.6. Navgîn.....	269
4.4.7. Cih.....	269
4.4.8. Wext.....	269
4.4.9. Jêderk û armanc.....	269

5. RASTNIVÎSÎN.....	271
5.1. Nivîsîna tipên girdek û hûrdek.....	273
5.2. Nivîsîna "î, ê"ya berî "y"yê.....	281
5.3. Nivîsîna paşdaçekan.....	281
5.4. Dubarekirina tîpekê.....	282
5.5. Nivîsîna gireya neyîniyê "ne-".....	283
5.6. Nivîsîna daçekên "bi" û "bê"yê.....	285
5.7. Ketina "bi-"ya dananiyê ji kara bûnê.....	286
5.8. Nivîsîna gireyên kesî (im/me, î/yî, e/ye, in/ne).....	286
5.9. Nivîsîna hin peyvên.....	287
5.10. Nivîsîna karên lêkdayî.....	288
5.11. Nivîsîna cotpeyvên.....	290
5.12. Nivîsîna hejmarnavan.....	291
6. XALBENDÎ.....	295
6.1. Nişandekên xalbandiyê.....	297
6.1.1. Navber.....	298
6.1.2. Xal.....	298
6.1.3. Bêhnok ,.....	299
6.1.4. Xalbêhnok ;.....	301
6.1.5. Cotxal :.....	302
6.1.6. Sêxal	303
6.1.7. Pirsnişan ?.....	304

6.1.8. Bangnîşan !	306
6.1.9. Dunik “ ”	308
6.1.10. Yeknik “ ”	308
6.1.11. Ducarek “ ”	309
6.1.12. Dabir ‘	309
6.1.13. Bendik -	310
6.1.14. Xêzik (xêzika axiftinê) –	311
6.1.15. Xwarexêz /	311
6.1.16. Kevanek ()	312
6.1.17. Goşebend []	314
Ferhengoka Termên Rêzimanî.....	317
Çavkani.....	327

RÊZIMAN

Rêz û rêzikên xebitîna zimanekî û avahîsaziya wî diyar dike, rêziman aliyên zimanî yên nezalal zelal dike. Bi rêya rêzimanê mirov bêhtir serwextî zimanekî dibe û dikare di xwendin, nivîsîn û axiftinê da bi kar bîne.

Rêziman bi wataya xwe ya teng binyada riste û bêjeyan ango ristesazî û morfolojîyê vedikole, lê bi wataya xwe ya fireh tevî ristesazî û morfolojîyê, dengnasî, watanasî û heta bi pragmatîkê jî vedihewîne.

Pêşgotin

Li rojavayê Kurdistanê ji 12 salan zêdetir e ku zimanê kurdî di qadeka berfireh da tê bikaranîn. Nexasim piştî ku Birêveberîya Xweser ava bû (21.01.2014) û zimanê kurdî bi awayekê fermî hat nasîn, êdî li nav kurdên Rojavayê minhacên perwerdeyê yên hemû qonaxên xwendinê ji nû ve hatin danîn û zimanê kurdî (zaravayê kurmancî) bû zimanê bingehîn ê perwerdeyê. Derveyî qada perwerdeyê, li dezgehên Birêveberîyê yên din jî zimanê kurdî bi awayekê fermî tê xebitandin û îro bi dehan navgînên ragihandinê û weşanxane, bi kurdî karê xwe dikin.

Nemaze di qada perwerdeyê da, bikaranîna kurdîya nivîskî bi vî rengê berfireh ji rojavayê Kurdistanê ra azmûneka nû û awarte bû. Minhacên perwerdeyê li ber wan berhemên rêziman û rastnivîsinê yên berdest hatin danîn û ev pêvajoya nû bi rê ket. Di vê pêvajoyê da, tevî wan pirsgirêkên zimanî yên têrbelav û naskirî, em di perwerdeyê da li gelek pirs û arîşeyên nû jî rast hatin.

Ji bo ku pirsgirêkên heyî çareser bibin û arîşeyên zimanî yên perwerdeyê û qadên dîtir safî bibin, pêdivîya Rojavayê ji her demê bêhtir bi standardên rêziman û rastnivîsinê hebû. Loma Saziya Zimanê Kurdî (SZK) ku li Rojavayê sazîya zimanî ya bilind û biryarder e, biryar da ku vê berhema li ber destê we, Rêzimana Kurmancî, amade bike.

Ev berhem di hundirê 3 salan da hatiye amadekirin û mijar bi mijar di komîteya zimanî ya SZKyê da hatiye nîqaşkirin. Lê ji sê salên xebatê zêdetir, ev berhema han encama proseseka perwerdeyê ya berfireh e ku 10-12 salan dom kirîye. Lewra di pratikkirinê da babetên zimanî berfireh hatine hilsengandin, arîşe û xalên nakok yek bi yek hatine destnîşankirin û pêşnûmaya standardkirinê li gor pêdivîyan hatiye danîn.

Di vê berhemê da, hemû babetên heyî tevî beş û binbeşan, li gor pîvan û ferhengên zimannasîyê yê hevdem hatine polandin herwiha dem, rawe û avaniyên zimanî jî li vê gorê hatine kategorîkirin. Ji bo hîlbijartina terman, zaravayên kurdî yê din jî hatine liberçavgirtin û ew termên di piraniya zaravayan da rûniştî û likar, hatine hîlbijartin. Lewra bicihkirina ferhengeka termên zimannasîyê ya standard û di vî warî da jihevneziçkirina zaravayan, armanceka SZKyê ya bingehîn e.

Ji bo ku ev berhem bi rengê herî baş û tekûz derkeve û ji hemû dezgehên rojavayê Kurdistanê ra rêbereka rêzimanî ya bikêrhatî be, ji çar parçeyên Kurdistanê û diyasporayê, gelek zimanzan û dezgehan ev berhem xwendîye û nixandîye. Bi saya têbînî û pêşniyazên wan, şaşî û kêmasiyên ku hebûn, hatine serrastkirin.


Em ji dil spasî û malavayîya van hemû kes û dezgehan dikin ku di qonaxa nixandinê da beşdarî vê xebatê bûn û bi baldarî ev berhem xwendin:

Dezgeh: Enstîtûya Kelepora Kurdî ya Silêmaniyê, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Peymangeha Amadekirina Mamostayan a Qamişloyê, Peymangeha Ziman û Wêjeya Kurdî ya Efrînê, Saziya Minhacan, Weqfa Mezopotamyayê, Zanîngeha Kobaniyê, Zanîngeha Newrozê

Kes: Bahoz Baran, Birahîm Bîngol, Ergîn Opengîn, Evdilwehab Xalid Mûsa, Hisên Mihemed, Hîwa Selam, Micheale Chyte, Mikail Bilbil, Mistefa Aydogan, Newzad Hirorî, Reşo Zilan, Samî Tan, Zana Farqinî

Saziya Zimanê Kurdî (SZK)

1. DENGNASÎ



Dengnasî (fonolojî): Beşeka zimannasiya teorîk e, li sistema dengan dikole, peywira dengan a di ragihandinê da destnîşan dike ka gelo kîjan deng ê bingehîn e, herwiha li bandora dengan a li ser hev dikole.

1.1. Deng, fonem, alofon û tîp

Deng: Ew ba ye ku ji pişika mirovî derdikeve, bi rêya organ/endamên axiftinê yên mîna lêv, diran, ziman, zimanê biçûk, qirik, difîn û hwd dirûvekî digire û bi bihîstinê mirov hest pê dike.

Fonem: Yekeya herî biçûk a wataguhêr e. Bo nimûne, dengên “b û s”yê di peyvên “ber û ser”ê da, watayê diguhêrin, loma fonem in.

Alofon: Şêweyekê cuda yê dirkandina heman fonemê ye ku tu guherînê di watayê da çênake. Bo nimûne, di hin peyvên da li şûna “s”yê dengê “ص”yê û li şûna “z”yê dengê “ظ”yê tê bikaranîn, bêyî ku wata bê guhartin.

Mînak:

sal, sed ...

zarok, ziman, zor, hezar ...

Tîp: Wêne û nîşana dengî ya nivîskî ye. Tîpek dikare nîşana dengê yan a çend dengan be.

1.2. Alfabeya kurmancî

Di alfabeya kurmancî da “31” tîp hene.

Tipên girdek

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş
T U Û V W X Y Z

Tipên hûrdek

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Tip ji hêla dirkandinê ve wekî dengdêr û dengnedêr ji hev dabeş dibin.

Tipên dengdêr

Ev tip di dirkandinê da rastî tu astengiyan nayên. Tipên dengdêr 8 in:

a e ê i î o u û

Dengdêrên kurt: e i u

Dengdêrên dirêj: a ê î o û

Tipên dengnedêr

Ev tip di dirkandinê da rastî astengiyan tên û bêyî tipên dengdêr nikarin ji devê mirovî derkevin. Tipên dengnedêr 23 ne:

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

1.3. Dengên hilmandî û nehilmandî

Di kurmanciyê da tipên “ç, k, p, t”yê ji bo du dengên cuda ango dengê hilmandî û dengê nehilmandî tên bikaranîn, ev deng ji di kurmanciyê da fonem in. Dema ku mirov dengê hilmandî bi lêv

bike û destê xwe bide ber devê xwe, dê hest bi hilmê bike, lê dema ku dengê nehilmandî bi lêv bike, hest bi hilmê nake. Mirov di nivîsinê da ji kontekstê, tê digihîje ka kijan ji wan dengan e.

Mînak:

Tip	Hilmandî	Nehilmandî
ç	çilo (çawa) çûn, çawa, çax	çilo (pelên daran) çem, çav, çîya
k	kar (xebat) kember, kengê, kurd	kar (çêlika bizinê) kevn, kadîn, keç
p	par (behr) pel, perwerde, pend	par (sala borî) pêlav, pez, pembû
t	ta (nexweşi) tevn, taze, talde	ta (dezi) tîr, tarî, tav

1.4. Dengnedêr li gor jenînê

Dengnedêr ji gelek alîyan ve ji hev dabeş dibin, ji ber ku diyardeya asimilasyonê ku li jêr hatiye şirovekirin, têkildarî jenînê ye, li vir dengnedêr dê ji aliyê jenînê tenê ve bî dayîn. Hinek dengnedêr dema ku derdikevin jiyên dengî dijenîn, hinek jî jiyên dengî najenîn. Bi vê yekê ev dengnedêr wekî bijen û bêjen ji hev cihê dibin.

Ji bo nasîna dengên bijen û bêjen çend rêbaz hene. Yek ji wan rêbazan gava ku mirov wan dengan derxe û tiliya xwe bide zengelora xwe, dê hest pê bike.

Dengnedêrên bijen	b c d v g j z l m n r w y
Dengnedêrên bêjen	p ç t f k ş s h q x

1.5. Hin diyardeyên dengnasîni

Deng di dirkandinê da bandorê li hev dikin; carinan cihê xwe didin hev, carinan dengê dikeve, hin caran jî dengê zêde dibe, ev yek bi hin diyardeyan tê zelalkirin:

1.5.1. Asimilasyon

Di axiftinê da dema ku deng li pey hev rêz dibin, hinek deng bandorê li dengên din dikin da ku bêhtir nêzikî hev bibin an jî bibin wekî hev. Di dengnasîyê da jî vê diyardeyê ra asimilasyon tê gotin. Asimilasyon di bin bandora çend faktorên da pêk tê, wekî bandora jenînê û bandora cihderkê.

a) Bandora jenînê

Dema ku dengnedêrên bijen û bêjen li pey hev tên, li hev nakin. Lewra di peyvên sade da dengnedêrên ku li pey hev rêz dibin, ji hêla jenînê ve mîna hev in, herwekî: dest, mizgeft, heşt ...

Dengnedêr bandorê li dengê berî xwe dikin, bo nimûne hejmarên "heft" û "heşt"ê bi dengê "t"yê bi dawî bûne. Lê dema ku hejmarên "deh"ê bi wan ve dibe û dengê "t"yê dikeve, êdî dengê "d"yê yê bijen dengên berî xwe "f" û "ş" ku bêjen in, bi dengên bijen "v" û "j" diguhêre û peyv dibin "hevdeh" û "hejdeh".

Ev diyardeya han di kêşana hin karan da berbelav e.

Mînak:

parastin → diparêze

listin → dilize

kuştin → dikuje

axaftin → diaxêve

b) Bandora cihderkê

Deng ji hêla cihderkê ve jî bandorê li hev dikin, bo nimûne di peyva "beranber"ê da dengê "n"yê berî dengê "b"yê hatiye, lê di bilêvkirinê da cihê xwe daye "m"yê û wekî "beramber"ê tê xwendin. Awayê derxistina "n" û "m"yê difinî ye, lê ji aliyê cihderkê ve jî hev cuda ne, cihderka "b" û "m"yê heman e, loma ev bandor çêdibe. Herçiqas di bilêvkirinê da dengê "m"yê be jî di nivîsînê da dengê "n"yê tê parastin.

Mînak:

Devokî	Nivîskî
jimbav	jinbav
Stembol	Stenbol

1.5.2. Jêçûna dengî

Ev diyarde li mijara ketina dengên û sedemên ketina wan dikole.

Ketina dengî hem di bêjeyên sade da hem jî di yên dariştî û lêkdayî da pêk tê.

Jêçûna dengnedêran

Di kurmancîyê da zêdetir dengên “d, f, h, ş, t”yê dikevin.

Mînak:

d	bilindtir	bilintir
	şadbûn	şabûn
f	keftin	ketin
h	hêşîn	şîn
	hişyar	şiyar
ş	firoştin	frotin
	doştin	dotin
t	destsivik	dessivik
	destmal	desmal

Herçiqas ketina dengî di bilêvkirinê da pêk hatibe jî ji bo ku reha peyvê bê parastin, di nivîsinê da ew deng tên parastin, ji bilî hin peyvên sade yên wekî keftin, doştin ...

Jêçûna dengdêran

Di kurmancîyê da zêdetir dengên “a, e, i, î”yê dikevin.

Mînak:

a	dinyaya me	dinya me
	hewayaya sar	hewa sar
e	evî	vî
	perwerdeyê	perwerdê
i	maseya dibistanê	masa dibistanê
	kalikê min	kalkê min
î	destikê beroşê	destkê beroşê
	Tu direvîyî.	Tu direvî.
î	Tu dibezîyî.	Tu dibezî.
	Ew çûyîye.	Ew çûye.

Herçiqas dengdêr di bilêvkirinê da bikevin jî di nivîsinê da pêwîst e bîr parastin, ji bilî hin rewşên kêşana karan û hin mînakên ku cih girtine. Bo nimûne: “evî → vî, ewan → wan”.

1.5.3. Pevgirêdan (peydabûna dengî)

Dema ku du dengdêr li pey hev tînin, jê ra hiyatusa dengdêran (vowel hiatus) tê gotin. Ev yek dirkandinê zehmet dike, loma di hin zimanan da dengê ji wan tê avêtin; ango jêçûna dengî pêk tê û di hinan da dengê din di navbera wan da tê bikaranîn, ango pevgirêdan çêdibe.

Di kurmanciyê da ji bo vê rewşê her du rêbaz (jêçûn û pevgirêdan) peyda dibin. Ji bo pevgirêdanê dengên ku bi vê erkê radibin, dengên "h,w,y"yê ne. Herçiqas peyv û gire ji hev cuda bîn nivîsîn ji dengê pevgirêdanê tê bikaranîn.

Mînak:

H: avahî, keskahî ...

W: bawî, rêwî ...

Y: xwezayî, şînayî ...

Hin caran kêşeya hiyatusa dengdêran bi "jêçûn û pevgirêdan"ê çare nabe û du tîpên dengdêr tên gel hev. Di kurmanciyê da ev yek di sê rewşan da pêk tê.

Di kêşana hin karan da

Mînak:

ajotin → diajo, biajo, neajo

axaftin → diaxêve, biaxêve, naaxêve

Di hevalnavan da

Mînak:

bi + êş → biêş

bê + ol → bêol

bi + aqil → bîaqil

ne + erzan → neerzan

Di nivîsîna hin peyvên biyanî da

Mînak:

Seid, saet, dia ...

1.6. Kîte

Ew yekeya bilêvkirinê ye ku bi carekê ra ji devê mirovî derdikeve.

Taybetmendiyên kîteyan

- Her kîteyeka kurmanciyê dengdêrekê di nav xwe da vedihewîne û nabe ku zêdeyî dengdêrekê bihewîne.
- Di kurmanciyê da dengdêrek bi tena xwe ji kîteyekê pêk tîne, lê dengnedêr nikare bi tena xwe kîteyekê pêk bîne.
- Di kurmanciyê da kîte ji dengê heta pênc dengan pêk tê.
- Di warê fêrbûna zimankî da kîte pir alîkar e ku bilêvkirina mirovî durist bike.

Mînak:

Kîteyên yekdeng

a, e, ê, i, î, o, u, û

azadî, agir, evîn, îşev ...

Kîteyên dudeng

av, ba, ez, ew, ax, rû, aş, ga, mû, ve, ye, ji, tû ...

Kîteyên sêdeng

şev, gul, dar, bar, wan, roj, kal, yek, can, nan ...

Kîteyên çardeng

xweş, rast, pirs, pênc, nerm, xurt, kurd, qenc ...

Kîteyên pêncdeng

stran, stand ...

Bêje ji dikare ji kîteyekê heta çend kîteyan pêk bê.

Mînak:

Bêjeyên yekkîte: av, şev, xweş, stran ...

Bêjeyên dukîte: a-gir, ba-jar, re-vîn, rû-geş ...

Bêjeyên sêkîte: Kur-dis-tan, xem-gî-nî, dû-ra-hî, ra-gir-tin ...

Bêjeyên çarkîte: ser-fi-ra-zî, ra-gi-han-din, ben-de-wa-rî, li-dar-xis-tin ...

Bêjeyên pênckîte: a-ma-de-ki-rin, dest-hi-lat-da-rî, roj-na-me-ge-rî, bi-rê-ve-bi-rin ...

1.7. Fonemên nekertî (raparçeyî/jorparçeyî)

Fonemên nekertî têkildarî axiftin û gotinê ne, herçi qas ne mîna dengên zimanî ne ku binyada bêjeyê pêk tînin, lê bandorê li axiftin û gotinê dikin û dikarin wata û mebestê biguhêrin. Fonemên nekertî ev in: guvaş û awaze.

1.7.1. Guvaş

Guvaş mijareka têkildarî kîteyê ye. Guvaş di bêjeyê da hêza bilêvkirina kîteyekê ye. Hemû kîte di bêjeyê da ne mîna hev tên bilêvkirin, kîteya ku guvaş li ser be, bişidtir û xurttir e.

Cihê guvaşê

Di kurmanciyê da cihê guvaşê tê guhartin; guvaş hertim ne li heman cihî ye. Carinan di bin bandora kêşan û bêjesaziyê da jî dimîne, bo nimûne gireyên neyîniyê guvaşê li xwe digirin.

Guvaşa peyvên yekkîte

Di peyvên yekkîte da guvaş hertim li ser dengdêrê ye.

Mînak:

av, ax, em, rê, ba, dar, ber, zêr, dil, deng, kurd, gîsk ...

Guvaşa peyvên pirkîte

Di peyvên pirkîte da guvaş bi piranî li ser kîteya paşîn e.

Mînak:

kevok, nêrî, bazin, Kurdistan, hevkarî, parastin, karîgerî, belengaz, temendirêjî, mêvanperwerî

Rola guvaşê

Rola guvaşê di zimanan da tê guhartin, guvaş dikare ji aliyê rêzimanî û watayî ve bêjeyê biguhêre. Di kurmanciyê da kar û navdêr bi rêya guvaşê ji hev tên cudakirin, gava ku guvaş li ser kîteya pêşîn be, kar e lê gava ku li ser kîteya paşîn be, navdêr e.

Mînak:

Xwendin zêrê zer e. (navdêr)

Me pirtûk xwendin. (kar)

Gotina wê xweş bû. (navdêr)

Wan sê çîrok ji me ra gotin. (kar)

Herwiha di kurmanciyê da kara "bûn"ê ya rewşê û ya guhartina rewşê bi rêya guvaşê ji hev cuda dibin. Radeya guvaşê^[1] di kara "bûn"ê ya guhartina rewşê da ji "bûn" a rewşê zêdetir e.

Mînak:

Gul sor bû. (rewş)

Gul sor bû. (guhartin a rewşê)

1.7.2. Awaze

Awaze bilindbûn û nizmbûna radeya dengî ya di axifinê da ye.

Rola awazeyê

- Di axifinê da rola xalbendiyê pêk tîne.
- Hestên mirovî yên mîna xemgînî, acizî, kêf, tirs û hwd bi awazeyê diyar dibin.
- Bi awazeyê mirov risteyên ragihandinî, bangî, pirsyarî û hwd ji hev cuda dike.

[1] Guvaş bi xwe ji di nav xwe da radeyê dihewîne.

Mînak:

Xemgîn çû malê.

Xemgîn çû malê!

Xemgîn çû malê?

2. MORFOLOJÎ

Kêşan

Bêjesazî

Gire

Morfem

Bêje

Pêşgir

Reh

Paşgir

ber-

pirs

-yar

Morfoloji: Beşeka zimannasiya teorik e, li teşe û forma bêjeyan dikole, bala xwe dide pevgihîştina morfeman û guherînên ku bêje di risteyê da rastî wan tèn, ango li bêjesazî û kêşanê (inflection) dikole.

2.1. Morfem, alomorf û bêje

2.1.1. Morfem

Yekeya zimanî ya herî biçûk a watadar an jî kargîn e. (George Yule, 2020: 76)

Cureyên morfeman:

a) Morfemên serbixwe (azad)

Ew morfem in ku di risteyê da bi tena xwe tèn bikaranîn, hinek jî wan watadar û hinek jî kargîn in.

Watadar: Beşên axiftinê yên watadar wekî navdêr, hevalnav, hevalkar û karan li xwe digire.

Mînak: dar, qenc, zû, ketin ...

Kargîn: Beşên axiftinê yên kargîn wekî cihnav, gihanek û daçekan li xwe digire.

Mînak: ew, û, jî ...

b) Morfemên bend (gire)

Ev morfem nikarin di risteyê da bi tena xwe bèn bikaranîn, bi morfemeka din ve tèn girêdan. Morfemên bend dibin du beş:

Rêzimanî: Ev morfem ji bo rewşeka rêzimanî ango kêşanê tên bikaranîn.

Mînak: dixwîne, nexwend, şivano ...

Dariştinî: Ev morfem bi erka dariştina peyvên nû radibin, dibe ku wataya peyvê yan cureyê peyvê biguhêrin.

Mînak: kargeh, wergirtin, guhar ...

2.1.2. Alomorf

Guharteyên morfemê ne ku heman erk û peywirê pêk tînin. Di kurmanciyê da gireyên kesî wekî: "im/me", "î/yî", "e/ye" û "in/ne" alomorf in.

2.1.3. Bêje

Yekeya zimanî ya watadar an kargîn e, bo nimûne, bêjeyên "ax, av"ê watadar in, bêjeyên "ji, û"yê kargîn in.

Beşên bêjeyê:

a) **Reh:** Yekeya herî biçûk a bêjeyê ye, piştî ku gireyên dariştinî û yên rêzimanî ji bêjeyê tên avêtin, reh li holê dimîne.

Mînak: dar, baştir, xemgînî, rakirin, dixwend, dibe ...

Di kurmanciyê da kar ji cureyên din ên bêjeyan cuda ne, du rehên karê hene; reha dema niha û ya dema borî, bo nimûne ji bo kara "girtin"ê "gir" reha dema niha ye û "girt" reha dema borî ye.

Reh di nava xwe da dibe du beş; serbixwe û bend

Reha serbixwe: Ev reh dikare bi tena xwe bê bikaranîn.

Mînak: av, guhar, xwarin ...

Reha bend: Ev reh bi tena xwe nayê bikaranîn.^[2]

Mînak: ceribîn, tefandin, helandin ...

b) **Qurm:** Qurm ji rehê mezintir e, piştî ku gireyên kêşanê ji bêjeyê tên avêtin, beşa ku dimîne qurm e. Dibe ku qurm ji rehekê pêk bê, wekî "ax" û "mal"ê, wê demê qurm û reh yek in. Dibe ku qurm ji du rehan pêk hatibe, wekî "destsivik, porxelek", herwiha dibe ku ji rehekê û gireyên dariştinî pêk hatibe wekî, "darik, gulistan, dermal, diywata".

Cudahiya morfem û bêjeyan

Carinan bêje morfemek e, wekî bêjeyên "baş û qenc"ê, carinan jî çend morfem in, wekî bêjeya "rojnamevan"ê ji du morfemên watadar "roj + name" û morfemeka kargîn "van" pêk tê.

2.2. Bêjesazî

Bêjesazî li prosesa çêkirina bêjeyan dikole. Di zimannasiyê da gelek rê û rêbazên vê yekê hene.

Hin rêbazên ku bêhtir di kurdîyê da likar in:

^[2] Di beşa morfemê da hatiye diyarkirin ku morfema bend gire ye. Li vir divê bê zelalkirin ku reha bend ne gire ye, ji ber ku nikare wekî morfemeka serbixwe bê bikaranîn bend e.

2.2.1. Lêkdan

Bi vê rêbazê, ji du yan zêdetir bêjeyên heyî, bêjeyek tê sazkirin, hem bêjeyên watarad hem jî yên kargîn dikarin bi vê rolê rabin.

Mînak:

navdêr + navdêr

çavxêzal, dilkevîr, gulbihar, keçmam, kurmam, mamosta, serokkomar, serokwezîr ...

navdêr + hevalnav

cansivîk, çavreş, dêmsor, destsivîk, porzer, rûgeş, serbilind ...

hevalnav + navdêr

çarçav, dudil, durû, duserî, xweşbext, xweşhal, xweşnav ...

daçek + navdêr

jidil, licih, likar, lirê ...

navdêr + kar

behs kirin, doz kirin, efû kirin, fam kirin, kar kirin ...

hevalnav + kar

geş bûn, kul bûn, sor kirin, xweş kirin, zer bûn, ziwa bûn ...

2.2.2. Dariştin

Bi vê rêbazê jî bêjeyekê û morfemeka dariştinî (gire) bêjeyên nû tên sazkirin, bêjeyek dikare jî gireyekê zêdetir jî wergire.

Herçî ev gire ne, di kurdîyê da li ser pêşgir, paşgir û navbergirê dabeş dibin.

a) **Pêşgir:** Ew gire ye ku bi pêşîya bêjeyê ve dibe û bêjeyeka nû saz dike: (bi-, bê-, der-, ser-, ve-, ra- ...)

Mînak:

biaqil, bêol, derketin, vekirin, rakirin ...

b) **Paşgir:** Ew gire ye ku bi paşîya bêjeyê ve dibe û bêjeyeka nû saz dike: (-a, -dar, -ok, -ane, -istan, -geh ...)

Mînak:

beza, deyndar, şermok, mêrane, daristan, dadgeh ...

c) **Navbergir:** Ev gire di navbera du bêjeyan da cih digire û bi vê yekê bêjeyeka nû saz dike, navbergirên kurmançî pir kêman: "an, e, o".

Mînak:

seranser, keskesor, sarogermo^[3]...

2.2.3. Guhastin

Bi vê rêbazê bêje jî nav cureyekê bêjeyan tê guhastin û cihê xwe di nav cureyekê din da digire, ev yek pêk tê bêyî ku bêje tu gireyên dariştinî bigire, tenê peywira peyvê diguhêre, peyv li gor peywira xwe ya nû dikare gireyên kêşanê bigire.

Di kurdîyê da ev rewş pir belav e.

[3] Li gor tê xuyakirin, "o" gihaneka "û"yê ye, lê dageriyayê "o"yê.

Navdêr ji karan

Hemû karên kurdî dikarin wekî navdêran bên kêşan.

Mînak:

Kar	Navdêr
Min gelek tişt gotin.	Gotina wî bi serê min nakeve.
We gelek roman xwendin.	Xwendin çeka mirovan e.
Gelek gul vebûne.	Vebûna gulên derdorê dixemilîne.
Me dar av dan.	Dar bi avdanê geş dibin.

Navdêr ji hevalnavan

Hevalnav	Navdêr
Ew çiyayekê mezin e.	Mezin melisîn, biçûk reqisîn.
Xemgîn pîr qenc e.	Qencê malê ew e.
Ew mirovekê nezan e.	Nezanan her tişt pûç kir.
Çavê mirovê girtî li azadiyê ye.	Girtî azadiya xwe dixwazin.
Xwe ji ber diwarê ketî bide ali.	Alikariya ketiyan bike.

Hevalkar ji hevalnavan

Hevalnav	Hevalkar
Her mirov azad e.	Ew azad diaxive.

Çiyayê nêzikî gundê me bilind e.	Ew çûk bilind difire.
Ew karekê xweş e.	Ev keç xweş diaxive.
Ev zarok pîr qenc e.	Van cilan qenc bişo.

2.2.4. Deynkirin

Bi vê rêbazê zimanek bêjeyan ji zimanekê din werdigire, kurdî jî wekî gelek zimanan bêje ji zimanên din wergirtine.

Mînak:

aqil, îman, telefon, televîzyon, kontak, grev ...

2.3. Kêşan^[4] (inflaksyon/inflection)

Ew guherîn e ku bêje di nav risteyê da rastî wê tê, ev guherîn bi alikariya gireyên kêşanê pêk tê. Gireyên kêşanê, bêjeyên nû çênakin, lê bi karekê peywirî/rêzimanî yê mîna, girêdan, hejmar, zayend, dem û bangkirinê radibin.

Bo nimûne, kar li gor kes, hejmar, dem, rawe, xuyang û avaniyê tîkên kêşan. Navdêr jî li gor hejmar, zayend, nasyarî û nenasyarî û rewşê (xwerû, tewandî, bangkirin) tîkên kêşan. Cihnav jî ber ku cihê navdêran digirin, ew jî li gor rewşa xwerû û tewandî, zayend

[4] Di zimannasiyê da "inflection" termeka giştî ye ku guherbariya rêzimanî ya bêjeyan digire nava xwe; ew jî du kategoriyên sereke dihewîne: 1- Kêşana karan (conjugation) 2- Kêşana navdêr, cihnav, hevalnav û hevalkaran (declension). Ji ber di kurmanciyê da termeka guncav jî bo "inflection"ê nehat ditin, terma "kêşan"ê hatiye bikaranîn; herwiha jî bo "conjugation"ê "kêşana karan" û jî bo "declension"ê "kêşana navdêran" hatiye gotin.

û hejmarê tèn kêşan.^[5] Hevalnav û hevalkar li gor berawirdê tèn kêşan. Cureyên bêjeyan ên din gihanek, daçek û bang di kêşanê da neguherbar in.

2.4. Gire

Morfemeka bend e ku bi tena xwe nayê bikaranîn, bi bêjeyekê ve dibe, xwedî peywireka rêzimanî yan dariştinî ye. Gireyên kurmancîyê dibin du beş: gireyên kêşanê û gireyên dariştinê.

2.4.1. Gireyên kêşanê

a) Gireyên têkildarî karan

Gireya berdwamî û dubareyîyê “di-”

Mînak:

Ew niha baxçe av dide.

Baran dibare, erd pesinê xwe dide.

Dema ku ez dimeşîyam, baran dibarî.

Em hertim diçûn ser kanîyê.

Gireyên raweyên dananî

a) “bi-” (pêşgira dananî)

b) “-a” (paşgira dananî)

Gireya “bi-”yê di raweyên fermanî, dananî û dema dahatî da tê bikaranîn.

[5] Ne hemû cihnav guherbar in, bo nimûne, cihnavên xwe, hev ... li gor kes û rewşê nayên guhartin.

Mînak:

Gotina xwe bipêje, paşê bibêje.

Bila bixwîne, paşê binivîse.

Divê mirov birîna xwe bi destên xwe derman bike.

Em dê bibezin.

Gireya “-a”yê di hin raweyên dananî da tê bikaranîn ku li ser reha dema borî ava dibin.

Mînak:

Xwezî min bixwenda.

Eger wan xwendibûya, ev derd nedibû para wan.

Bila karên xwe kiribûna.

Gireyên neyînîyê: “na-, ne-, me-, ni-”

Mînak:

Ew îro naçe.

Hûn nebezin/mebezin.

Mîna îro nexwend.

Ew nikare vî karî bi rê ve bibe.

Gireyên kesî “-im/me, -î/yî, -e/ye, -in/ne”

Gireyên kesî têkildarî cihnavên kesî yên xwerû ne û bi karan ve tèn nivîsîn.

Mînak:

Ez dixwînim.

Ez hatime.

Tu dinivîsî.

Ew dê biçe.

Hûn dikenin.

b) Gireyên têkildarî navdêr û cihnavan

Gireyên îzafeyê "-a, -ê, -ên"

Mînak:

Dara xweziyê şîn nabe.

Ewê bedew dê biçe zanîngêhê.

Mîrov bi sozên xwe ve tîr girêdan.

Gireyên tewangê "-î, -ê, -an"

Mînak:

Me li civatê çirok gotin.

Min ji cotkarî pirsî.

Bi salan li xeribiyê ma.

Kijanî bersiv da?

Vê di pêşbaziye da xelat wergirt.

Wan em agahdar kirin.

Herçiqas gireyên tewangê girêdayî navdêr û cihnavan in, lê hin cureyên hevalnavan jî tîr tewandin.

Mînak:

Vi xwendekarî xelat wergirt.

Vê malê alîkarîya me kir.

Van camêran teksîr nekir.

Ew li qata çaran dijî.

Gireyên nenasyariyê "-ek, -in"

Mînak:

Gulek çilmisî.

Gulin çilmisîn.

Gireyên bangkirinê "-o, -ê, -(i)no"

Mînak:

Hevalo, îro wancya me heye.

Dayê! Min bêriya te kiriye.

Zarokino! Hûn çi dikin?

c) Gireyên têkildarî hevalnav û hevalkaran

Gireyên berawirdiyê "-tir, -tirîn"

Mînak:

Hevalnav

Bav divê kur jê çêtir be, hosta divê şagird jê jîrtir be.

Bilindtirin çiyayê Kurdistanê Agirî ye.

Hevalkar

Zûtir hişyar bibe, dê zûtir bigihîjî armancê.

2.4.2. Gireyên dariştinê

a) Pêşgir

bele-: belexwar, beletewş, beleban ...

ber-: berdest, berteng, berbelav, berketî, bernas, bersûc, berguman, berbext ...

bê-: bênav, bêhêvî, bêav, bêaqil, bêkêr, bêmal, , bêxwê ...

bi-: binav, bihêvî, biav, biaqil, biêş, bimal ...

bin-: binemal, binesazî, binbêjing, bindest, binerd, binav, binçav ...

çê-: çêkirin, çêbûn ...

da-: dabeş, dagirtin, dadan, dahat, dakirin, daketin ...

der-: derketin, derling, derdor, dermale, derencam, deraqil, derhiş, derhed ...

dij-: dijber, dijteror, diywata ...

hele-: helesor, helecana, helebez ...

hem-/hev-: hempa, hemsal, hemdem, hemrê, hemçax, hemdil, hevkar, hevbeş, hevpar, hevrê, hevbîr, hevdoz, hevhiş, hevreh ...

hil-: hîlbûn, hildan, hilgirtin, hîlanîn, hîlbijartin ...

î-: îcar, îsal, îşev, îro ...

kele-: kelegirî, kelekort, kelemêr, kelemêş, kelenimêj, kelerim, keleşêr, kelexav ...

man-^[6]: manker, manga ...

nav-: navmil, navpişt, navdil, navçav, navroj, navneteweyî, navser, navxweyî ...

ne-^[7]: nexweş, neyar, nezan, nemir, nemerda ...

paş-: paşnav, paşeroj, paşgo, paşguh, paşhêz, paşmêr, paşdaçek, paşpehnî ...

pêş-: pêşgotin, pêşçax, pêşdem, pêşefser, pêşnivîs, pêşketî, pêşwext, pêşdaraz ...

ra-: radest, raçav, rakirin, rabûn, raketin, raxistin, rahiştin ...

rû-: rûkirin, rûniştin, rûdan ...

ser-^[8]: serbajar, sergotar, sernûçe, serbaz, serdem, sergovend, sernivîs ...

[6] Li gor Tanî pêşgira "man"ê carinan weki "ma, me"yê ji derdikeve holê, bo nimûne, "mêkew, mêkund ..." (Tan, 2015: 64)

[7] "Ne" gireya neyiniyê ye, lê bi rola gireyeka dariştinê ji radibe.

[8] Hin peyvên mîna "serbilind, sergerm, serhişk, sernerm" di rastiyê da, ji peyva "ser"ê ya bi wataya serê mirovî çêbûne, lewra ew ne dariştî, lê lêkdayî ne.

ve-: vedan, vexwarin, vebûn, vegirtin, vejîn, vemirandin ...
wer-: wergerandin, wergirtin, werbûn ...
xwe-: xwecih, xwenas, xwemalî, xweser ...
zir-: zirbav, zirkeç, zirbapîr, zirdê, zirxwestû ...

b) Paşgir

-a: beza, bîna, kara, zana ...
-ahî, awî, ayî: dûrahî, lezahî, mezinahî, ronahî, şînahî, reşahî, ewrawî, şînkayî, bilindayî, kûrayî ...
-ak: civak, honak, mînak, ronak ...
-al: heval, kortal, pêtal ...
-ane: jinane, mêrane, dostane, merdane, şêrane ...
-anî: xortanî, bûkanî, piranî, yekanî ...
-ar: guhar, jengar, mirar, nivîsar, kevnar, komar ...
-asî: kêmasî, kurtasî, tengasî ...
-atî: dijminatî, kirîvatî, mirovatî, xweşikati, şînatî ...
-bar: fambar, xembar, gunehbar, ditbar ...
-baz: canbaz, rimbaz, şûrbaz ...
-bend: nalbend, solbend, sazband, hevalbend, goşebend ...
-çe: baxçe, deryaçe, navçe, xalîçe, nivçe ...
-dank: derzîdank, kildank, xwelîdank, çaydank ...

-dar: birîndar, deyndar, guhdar, maldar, oldar, peyvdar ...
-de: mayînde, diyarde, revde, peyade ...
-dêr: avdêr, çavdêr, rengdêr ...
-e: deste, nerme, xane, firoke, sore, gewre ...
-ek: kulek, çilek, dizek, birek, serek, pişte, parsek, pêçek ...
-em/-emîn: yekem/yekemîn, duyem/duyemîn, sêyem/sêyemîn ...
-ende/-inde: dirinde, firinde, kujende, gerînde ...
-er: bîner, kujer, xwîner, parêzer, bêjer ...
-gar: parêzgar, rojgar ...
-geh: dadgeh, dergêh, balgeh, fêrgeh, kargeh, wargeh ...
-gîn: lezgîn, xemgîn, xwazgîn ...
-ik: destik, kêrik, darik, rindik, gewrik, kinik, sorik ...
-inc: gazinc, navinc, sarinc ...
-istan: daristan, çolistan, gulistan, Kurdistan, şaristan ...
-î:
• Ji hevalnavan, navdêran çêdike.
qencî, başî, azadî, merdî, lawazî ...
• Ji navdêran, hevalnavan çêdike.
avî, axî, bawî, buhiştî ...
• Ji navên gund, bajar û welatan, navên niştecihên wan çêdike.
kurdistanî, dêrikî, amedî, serhedî, dihokey, mehabadî ...

• Ji bikernavan, navên pişeyan çêdike.

dengbêjî, cotkarî, porbirî ...

• Ji reha dema borî, hevalnav/parengan çêdike.

kuştî, ketî, girtî, şûştî ...

• Navê zimanan çêdike.

kurdî, farisî, erebî, îngilîzî ...

-în: berfîn, darîn, derewîn, îroyîn, pêşîn, paşîn, rengîn, zêrîn, zîvîn ...

-îne: çavîne, yekîne, kêmine ...

-înî: bavînî, hevalînî, kurdînî, lawînî ...

-k: berdilk, berçavk, jêderk ...

-ka: hêdika, zûka, xwezîka ...

-kar: amadekar, cotkar, xebatkar, xizmetkar, xwendekar ...

-kî: devkî, nivîskî, devdevkî, serserkî ...

-mend: aqilmend, bawermend, dewlemend, hunermend ...

-nak: derdnak, endîşenak, tirsnak, xemnak, xeternak ...

-ok: bezok, devok, kenok, revok, şevşevok, şermok, zarok, xişok ...

-onek: bizdonek, tirsonek ...

-saz: diransaz, çeksaz, karsaz, plansaz ...

-tî: hevaltî, pismamtî, xanimtî ...

-van: baxçevan, dergevan, nêçîrvan, bilûrvan, tembûrvan ...

-war/-wer: bendewar, xwendewar, bîrewer, serwer ...

-waz: bangewaz, cihêwaz, şaşwaz ...

-xane: dermanxane, nexweşxane, çapxane ...

-yar: bextyar, cotyar, pirsyar, kiryar, zanyar ...

-zar: gulzar, kurdîzar, şermezar, tengezar ...

Reha dema niha ya hin karan wekî gireyên dariştinî

Reha dema niha ya hin karan di dariştina bêjeyan da pir karîger e, lewra wekî gireyên dariştinî tê senifandin.

Mînak:

ajotin → -ajo: pêvajo, dûvajo ...

avêtin → -avêj: tîravêj, peravêj, rimavêj, topavêj ...

birin → -ber:^[9] rêber, rênçber, dilber, birêveber ...

birîn → -bir: cawbir, darbir ...

bînan/dîtin → -bîn: dûrbîn, geşbîn, bedbîn, hûrbîn ...

firotin → -firoş: nanfiroş, darfiroş, çekfiroş ...

gerîn → -ger: tevger, şevger, bager ...

gotin → -bêj: çîrokbêj, stranbêj, dengbêj, pîrbêj ...

girtin → -gir: avgir, alîgir, destgir, kefgir, rêgir ...

[9] Tanî diyar kiriye ku reha "birin"ê ya dema niha "ber" e, lê bi demê ra sivik bûye û "b" maye. (Tan, 2015: 234)

guhastin → -guhêz: malguhêz, wêneguhêz, dîmenguhêz ...

kêşan → -kêş: pêşkêş, şûrkêş, renckêş, balkêş, barkêş, derdkêş, rastkêş ...

kirin^[10] → -ker: karker, zîvker, dagirker, talanker, têrker ...

kuştin → -kuj: agirkuj, êşkuj, mirovkuj, biraku, xwekuj ...

kotin → -koj: hestîkoj, darkoj ...

mêtin → -mij: xwînmij, şîrmij ...

malaştin/maltin → -mal: destmal, pêşmal ...

nivîsin → -nivîs:^[11] çîroknivîs, dîroknivîs ...

pehtin → -pêj: aşpêj, nanpêj, xwarinpêj ...

rêtin → -rêj: avrêj, xwînrêj, rondikrêj ...

sotin → -soj: dilsoj, cegersoj ...

xwarin → -xwer/-xur: kurtêlxwer/kurtêlxur, bertêlxwer/
bertêlxur, nanxwer/nanxur...

Herçiqas ev reh wekî gireyên dariştinî karîger in, lê dema ku gireyên dariştinî digirin, reh in ne gire ne.

Mînak:

ajokar, bîner, bêjer, kujer, sojer, firoşgeh, nivîsgeh, pêjgeh, kêşe, rêje, sojende, gerok, xurek, birek ...

^[10] Li gor Tanî reha vê karê "ker" e, lê sivik bûye û bûye "k". (Tan, 2015: 242)

^[11] Di soraniyê da, reha vê karê "nûs" e, derbasî kurmanciyê ji bûye, bêjeyên mîna "lênûs, pênûs, çarenûs"ê pê çêbûne.

c) Navbergir

an: seranser, beranber, seranpê ...

e: saregerm, keskesor, rasterast, kalemêr, jinebî, zarezar ...

o: soromoro, sarogermo, şilopilo, xwaromaro ...

2.5. Bêje ji hêla sazûnê ve

a) Bêjeyên sade

Ev bêje ji rehekê bi tenê pêk tên û nayên dabeşkirin.

Mînak:

av, pir, çem, şikeft, dep, gul, gotin, bûn, çûn, sor, kesk, hişk, zû, ji, bê, ku ...

b) Bêjeyên dariştî

Ev bêje ji rehekê û gireyên dariştinî pêk tên.

Mînak:

dûrahî, derzîdank, oldar, nexweş, vexwarin, rabûn, hilweşandin ...

c) Bêjeyên lêkdayî

Ev bêje ji du yan zêdetir rehên watadar an kargîn pêk tên, bêjeyên lêkdayî dikarin gireyên dariştinî ji wergirin.

Mînak:

Rojname, nasname, sorgul, hişyar bûn, amade kirin, av dan, çavreş, bejnzirav, zikmakî, rasterast, kurtenûçe, gulgulî, çavreşî, bi lez, li ser, li ber ...

Hin nişeyên giştî

a) Gireyên dariştinî yê resen bêwata ne, lê gireyên dariştinî yê neresen hin bêje ne ku dibe watadar bin, wekî: "sef, ber, paş, pêş, kar ..." an kargîn bin wekî, daçekên "bi" û "bê"yê, lê ji ber karîgerîya van di prosesa dariştinê da êdî wekî pêşgir û paşgir tên hesabandin. Herwiha carinan hin bêje bi xwe wataya xwe ji dest didin û wekî gireyên dariştinî tev digerin, herwekî bêjeya "çê"yê ya di karên "çêbûn û çêkirin"ê da ku bi wataya "baş"ê tê, lê di van karan da wekî pêşgir dixebite.

b) Hin gireyên dariştinî dibe ku di heman demê da zêdeyî cureyekê bêjeyan saz bikin, wekî:

der-:

kar: derketin, derkirin ...

navdêr: dermale, dermal ...

hevalnav: deraqil, derhiş ...

ok-:

hevalnav: kenok, şermok ...

navdêr: bêhnok ...

ve-:

kar: vebûn, vekirin ...

hevalnav: veder ...

c) Bêjeyên dariştî dikarin çend gireyên dariştinî wergirin.

Mînak:

bindestî, berdevk, berpirsyar, wergerandin, dawêşandin ...

d) Carinan hin rehên ku wekî gire likar in, gireyan digirin, wê demê dibin reh û bêje li ser wan ava dibin.

Mînak:

dijatî, pêşîn, paşîn, serik, navîn, navik, kujer, nivîsgeh ...

2.6. Cureyên bêjeyan (beşên axiftinê)

Bêje li gor peywir û wataya xwe di risteyê da tên dabeşkirin.

Cureyên bêjeyan heşt in:

1. Navdêr

2. Cihnav

3. Kar

4. Hevalnav

5. Hevalkar

6. Daçek

7. Gihanek

8. Bang

Der barê hejmara bêjeyan da lihevkirinek di navbera zimannasên kurd da nîne. Bedirxanî ew li ser deh cureyan dabeş kirine: "Di zmanê kurdmançî de, birên qisetê deh in: navdêr, veqetandek, rengdêr, pronav, lêker, jimarnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan." (Bedirxan, 2002: 45).

Farqînî ji bo vê mijarê wiha gotiye: "li gorî tesnîfa klasîk bi xwe meyla me li ser wê ramanê ye ku dibêje cureyên bêjeyan heşt in." (Farqînî, 2019: 31)

Gireyên îzafeyê, hem wekî morfemeka bend hem jî wekî morfemeka serbixwe derdikevin holê, gava wekî morfemeka bend bin, gireyên kêşanê ne, lê gava wekî morfemeka serbixwe bin, cihnav in, lewra ew di nav cihnavan da hatine senifandin. Ji bo hejmarnavan jî ne wekî beşeka serbixwe, lê wekî hevalnav, cihnav û hevalkaran derdikevin pêş. Lewra wekî beşeka serbixwe nehatiye senifandin.

Hin morfem hene ku ne di nav cureyên bêjeyan da, ne jî di nav gireyan da tîn senifandin. Di îngilîzîyê da ji wan ra partîkil (particle) ango amraz tê gotin. Di kurdîyê da, morfema dema dahatî "dê/ê" wiha ye, lewra wekî amraz hatiye dayîn.

Di zimannasîyê da cureyên bêjeyan wekî bêjeyên vekirî û girtî tîn senifandin. (Nelson & Greenbaum, 2016: 36)

Bêjeyên watarar wekî bêjeyên vekirî û bêjeyên kargîn wekî bêjeyên girtî ne. Mebest jî cureyên vekirî ew e ku mirov dikare bêjeyan li wan zêde bike û yên girtî mirov nikare bêjeyan li wan zêde bike. Bi kurtî, mirov dikare bêjeyên nû li navdêr, hevalnav, kar û hevalkaran zêde bike, lê mirov nikare bêjeyên nû li daçek, gihanek û cihnavan zêde bike.

2.6.1. Navdêr

Cureyekê bêjeyan e ku tiştêkî bi me dide nasîn, wekî navê kes, tişt û hwd. Navdêr jî aliyê rêzimanî ve jî tê kêşan û di risteyê da peywirekê bi cih tîne.

2.6.1.1. Kategoriyên navdêran

2.6.1.1.1. Li gor taybetmendiyên heyberan

a) Navdêrên taybet

Navên tekane û yekta ne, wekî navê kes, bajar, welat, sazî ... ev navdêr bi tîpên girdek dest pê dikin.

Mînak:

Azad, Delal, Xelat, Amed, Dêrik, Firat, Dicle, Agirî, Saziya Zimanê Kurdî, Heyva Sor a Kurd ...

b) Navdêrên cureyî

Navên giştî ne, cureyekî nîşan didin ku heman taybetmendiyên di hewînin. Navdêrên cureyî bi tîpên hûrdek dest pê dikin.

Mînak:

mirov, dibistan, kevir, bajar, gund, çiya, çem, giya, gul, kerî, artêş ...

2.6.1.1.2. Li gor hestpêkirinê

a) Navdêrên şênber

Mirov dikare van navdêran bi her pênc lebatên sehekê (ditin, bihîstin, bêhn kirin, tam kirin, dest dan) destnîşan bike.

Mînak:

kevir, dar, pirtûk, tembûr, muzik, pêûs, mase, av, zêr, ziv, tehlayî, şorayî ...

b) Navdêrên razber

Mîrov nikare van navdêran bi her pênc lebatên sehekê destnîşan bike. Ew bêhtir girêdayî aliyê mêjî û hestên mirovî ne.

Mînak:

qencî, sûcdarî, bawerî, kîn, xeyal, hezkirin, xemgînî, kêfxweşî, hizir ...

2.6.1.1.3. Li gor hejmarbariyê

a) Navdêrên hejmarbar

Navên wan heyberan in ku tên hejmartin û yek bi yek ji hev tên cudakirin. Ev navdêr wekî pirhejmar û yekhejmar ji hev cuda dibin.

Mînak:

dar, mal, welat, baxçe, kanî, mase, gul ...

Navdêrên komî ji hejmarbar in. Navdêrên komî ji aliyê watayê ve komekê di nav xwe da dihewînin, lê ji aliyê rêzimanê ve wekî yekhejmar tên hesabandin.

Mînak:

kerî, pez, gel, artêş, millet, malbat, deste ...

b) Navdêrên nehejmarbar

Ev navdêr nayên hejmartin û ji aliyê çendaniyê ve ji nayên dabeşkirin. Mîrov dikare pîvana van navdêran bi rêya hin navgînan diyar bike.

Mînak:

av, şekir, birinc, çay, nîsk, kuncî, ard ...

2.6.1.1.4. Bêjesaziya navdêran

a) Navdêrên sade: Ev navdêr ji rehekê pêk tînin.

Mînak:

ax, av, por, mase, şal, roj, heyv, pel, sêv ...

b) Navdêrên dariştî: Ji rehekê û gireyên dariştinî pêk tînin.

Mînak:

berçavk, binbêjing, pêşgotin, paşnav, dûrahî, zanîngêh, xwelîdank, baxçe, kujer, dermanxane, berpirsyarî, nexweşî ...

c) Navdêrên lêkdayî: Ji du rehan an zêdetir pêk tînin, dibe ku navdêrên lêkdayî gireyên dariştinî jî bigirin.

Mînak:

nasname, tîrmeh, mamosta, rojname, keskesor, zûgotinok, hêkerûn ...

2.6.1.2. Kêşana navdêran

Herwekî di morfolojiyê da jî hatiye behskirin, ne tenê kar, lê navdêr, cihnav, hevalnav û hevalkar jî tînin kêşan. Di kurmanciyê da, navdêr li gor hejmar, zayend, nasyarî û nenasyarî û rewşê (xwerû, tewandî,

bangkirin) tên kêşan. Hin ji van xalan di navbera navdêr û cihnavan da ji hevpar in, bi taybetî cihnav ji di rewşa xwerû û tewandî da tên kêşan.

2.6.1.2.1. Hejmar

Hejmar ew kategoriye ku yekhejmarî û pirhejmarîya navdêran diyar dike. Di hin zimanan da wekî zimanê erebî, yekhejmarî, duhejmarî û pirhejmarî heye, lê di kurmanciyê da tenê yekhejmarî û pirhejmarî heye, ew ji bi çend awayan diyar dibe.

a) Navdêrên hejmarbar

Navdêrên kurmanciyê dema bi tena xwe bin, yekhejmar in û tu gire di kurmanciyê da nîne ku navdêran bi tena xwe bixin pirhejmar. Wekî din yekhejmarî û pirhejmarîya navdêran di rîsteyê da bi van awayan diyar dibe:

Bi karan

Yekhejmarî	Pirhejmarî
Min sêv xwar.	Min sêv xwarin.
Wi helbest got.	Wi helbest gotin.
Zarok dixwîne.	Zarok dixwînin.

Bi gireyên îzafeyê

Yekhejmarî	Pirhejmarî
Xwişkê min xwendekar e.	Xwişkên min xwendekar in.
Apê Delalê pizîşk e.	Apên Delalê pizîşk in.

Bi tewangê

Yekhejmarî	Pirhejmarî
Pirtûkê baş bixwîne.	Pirtûkan baş bixwîne.
Ew li bin sîya darê rûnişt.	Ew li bin sîya daran rûnişt.

Bi gireyên nenasyariyê

Yekhejmarî	Pirhejmarî
Zarokê dimeşe.	Zarokin dimeşin.
Darek bi kulilkan xemilî bû.	Darin bi kulilkan xemilî bûn.

Bi diyarêrên nişander

Yekhejmarî	Pirhejmarî
vê xezalê	van xezalan
vi çûkî	van çûkan

Bi gireyên bangkirinê

Yekhejmarî	Pirhejmarî
hevalo, lawo	hevalino, lawino
bedewê, rindê	bedewino, rindino

Bi diyarêrên hejmarin

Yekhejmarî	Pirhejmarî
Ø	çar zarok, pênc dar, sê pirtûk

Navdêrên komî

Herçiqas ev navdêr komekê di nav xwe da dihewînin jî wekî yekhejmar tên kêşan.

Mînak:

Artêş di gundî ra derbas bû.

Pezê xwe birîye çêreyê.

Malbata wê ji Serhedê ye.

✱ Eger mebest ji komekê zêdetir be, hingê em van navdêran pirhejmar dikişînin.

Mînak:

Gelên herêmê bi xweşî bi hev ra dijîn.

Malbatên wan jî hazir bûn.

Gelek keriyên pezî li wan zozanan xuya bûn.

b) Navdêrên nehejmarbar

Ev navdêr nayên hejmartin û jî aliyê çendanîyê ve jî nayên dabeşkirin. Ev navdêr bêhtir wekî yekhejmar likar in, lê hin jî van navdêran wekî pirhejmar jî derdikevin pêş.

Mînak:

Yekhejmar

Min av ji kanîyê vexwar.

Wî rûn ji firoşgehê kirî.

Me îsal genim çand.

Pirhejmar

Me par nok çandin.

Gundîyan fasolî av dan.

Herwiha navdêrên ku nayên hejmartin, dikarin bi hin navgînan bên pîvan û hejmartin.

Mînak:

Wan du mist ax avêtin nav çavên wî.

Me piştîyek pûş anî.

Min sê zerik av ji kanîyê vexwarin.

Wî du zembil mewij kirin.

Wê çar bermil êzing şewitandin.

Hin caran bi alîkarîya diyarkerên nenasyarîyê jî miqdara hindikbûn û gelekûna van navdêran diyar dibe.

Mînak:

Min piçek av ji kanîyê vexwar.

Min gelek av ji kanîyê vexwar.

Min hinek goşt da pisikê.

• Ev navdêr jî wekî navdêrên din gireyên nenasyarî, îzafê û tewangê digirin.

Mînak:

Min avek vexwar.

Min aveka cemidî vexwar.

Avekê bîne em vexwin.

2.6.1.2.2. Zayend

Zayend ew taybetî ye ku navdêran wekî mê, nêr û nêtar nîşan dide. Hin ziman zayendî û hinek jî nezayendî ne. Kurdîya kurmancî zimanekê zayendî ye, ango zayenda her peyvê heye; bêje nêr an mê yan jî nêtar e. Du cureyên zayendê hene; zayenda xwezayî û ya rêzimanî.

a) Zayenda xwezayî: Ev zayend taybetmendiyeka xwezayî ya mirov û ajelan e, hinek jê nêr, hinek jê mê ne.

Minak:

Zayenda mirovan

Mê	Nêr
dayik	bav
keç	kur
jin	mêr
dapîr	bapîr
met	mam/ap
xaltîk	xal

Zayenda ajelan

Mê	Nêr
mirîşk	dîk
mih	beran
bizin	<u>nêrî</u>
çêlek	ga

Nîşe: Nêr û mêtiya hemû ajelan bi zayenda xwezayî diyar nabe. Di hin ajelan da serdestiya zayendekê heye; hin ajel bi nêritiyê serdest in herwekî, şêr, gur, piling, mar, baz, kund, keftar û hwd, hin jî bi mêtiyê serdest in herwekî, kergoşk, kew, kevok, req, mêş, hirç, qaz, werdek, pisik ...

Minak:

Filan kes marê bin kayê ye.

Dijminê me wekî gurê har e.

Pisikê çênîyek goşt revand.

Kevoka wan bilind firî.

Ji bo ku nêr û mêtiya van ajelan ji hev cuda bibe, çend rêbaz hene:

1- Mirov dikare bi peyvên "mê, nêr, dêl, mak, man"ê zayenda wan diyar bike.

Minak:

mêkew, nêrekew, dêlegur, dêlehirç, makker, manga ...

Nîşe: Mirov dikare peyvên "mê û nêr"ê bi rêya îzafeyê piştî peyvên jî binivîse.

Minak:

kevoka mê	kevokê nêr
pisîka mê	pisîkê nêr
hirça mê	hirçê nêr

2- Herwiha nêr û mêtîya hin ajelan bi zayenda rêzimanî dîyar dibe, ev yek jî bi gireyên îzafeyê û tewangê dîyar dibe.^[12]

Mînak:

Bi îzafeyê

Gurê har

Gura har

Bi tewangê

Vî kerî

Vê kerê

b) Zayenda rêzimanî

Zayenda wan peyvên dîyar dike ku ne xwedî zayenda xwezayî ne. Bo nimûne peyvên wekî: dar, kevir, xanî, pênuş, pirtûk, gul, kulîlk, ax ... ku ne xwedî zayenda xwezayî ne, bi zayenda rêzimanî ango bi alîkarîya gireyên îzafeyê û tewangê zayenda wan dîyar dibe, hinek jî van peyvên mê hinek nêr^[13], hinek jî nêtar in. Rêzikeka destnîşankirî nîne ku zayenda peyvên a rêzimanî dîyar bike, lewra dema ku kesek hînî zimanekî bibe, neçar e ji ber bike.

[12] Celadet Bedirxan wiha amaje bi vê xalê kirîye: "Zayendê heywanekî, carina bi veqetandek û tewangê jî têtê nîşankirin. Gava em dibêjin; hespa min bine yan kera min bine, xuyaye ko em qala mehîn û makerê dikin. Disa gava em dibêjin; ez li hespê siwar bûm yan ez li kerê siwar bûm, gelek kifş e heywanê ko em lê siwar bûne, mehîn an maker e û ne hespê nêr û kerê nêr e." (Bedirxan, 2002: 53)

[13] Hin peyv hene ku li hin herêman nêr û li hinan jî mê likar in. Mirov di metnên nivîskî da jî rasti her du awayan tê, wekî: por, kursî, xatir, bingeh, girî, ken, rih, paytext, wext, dimen, balgeh, wênc, erk, rêbaz û hwd. Hilbijartina zayendekê jî bo her peyvekê jî van, mijara lihevkerîne ye.

Peyvên mê

Bi îzafeyê	Bi tewangê
Mala wan biçûk e.	Malê ava bike.
Gula sor bişkivî.	Gulê bêhn bike.

Peyvên nêr

Bi îzafeyê	Bi tewangê
Gundê wan mezin e.	Ez li vî gundî mezin bûme.
Me ew jî çiyayê mezin derbas kir.	Refek çivîk li ser çiyayî danî.

Peyvên nêtar

Hin peyv hene ku dikarin hem mê hem jî nêr werin bikaranîn. Ew peyvên bi vî awayî nêtar in, herwekî: heval, hevrê, dost, mirov, kes, serok, hevserok, mamosta, nivîskar, dengbêj, gundî ...

Mînak

Awayê mê

Bi îzafeyê	Bi tewangê
Hevala min alîkarîya min kir.	Vê hevalê alîkarîya min kir.
Gundîya me mala xwe bar kir.	Vê gundiyê mala xwe bar kir.

Awayê nêr

Bi îzafeyê	Bi tewangê
Hevalê min alîkarîya min kir.	Vî hevalî alîkarîya min kir.
Gundiyê me mala xwe bar kir.	Vî gundiyî mala xwe bar kir.

ben

Nîşe: Gava ev peyvên nêtar bi awayekê giştî bên bikaranîn, herçiqas mebest jê her du zayend in jî zayenda wan a serdest nêr e.

Mînak:

Kesê mino, destê mino.
Kedkarê xwe be, şîrînê li ber dilê hevalê xwe be.
Bi benê her hevalî xwe bermede bîran.
Haya kesî jî kesî nîne.

2.6.1.2.3. Nasyarî û nenasyarî

Nasyarî û nenasyarîya navdêran bi awayên cuda di zimanan da derdikeve holê. Bo nimûne, di zimanê erebî da peyv di bingeha xwe da nasyar in, peyvên erebî bi alîkarîya "el (ال)"ê dibin nasyar herwekî: qerye (قرية) → elqerye (القرية)

Lê rewşa kurmancîyê ne bi vî awayî ye, navdêrên kurmancî di bingeha xwe da nasyar in û bi alîkarîya gireyên nenasyarîyê "ek û in" dibin nenasyar.

"-ek": Ev gire ji hejmara "yek"ê hatiye û ji bo nenasyarîya navdêrên yekhejmar tê bikaranîn.

Mînak:

Mirovek jî dûr ve tê.
Her canek di dilê xwedîyê xwe da siltanek e.
Her darek jî berê xwe tê nasîn.

berker = obje
biker = subj

"-in": Ev gire ji hevalnava nenasyarîyê "hin" hatiye û ji bo nenasyarîya navdêrên pirhejmar tê bikaranîn.

Mînak:

Mirovin hene dildarên welatî ne.
Darin nehatin avdan.
Kulîlkin bişkivîne.

2.6.1.2.4. Rewş

rişte ⇒ hevok, umle

Rewş, peywira rêzimanî ya navdêr û cihnavanango cihê wan di risteyê da dîyar dîke. Di kurmancîyê da mirov dikare behsa sê rewşên sereke (xwerû, tewandî û bangkirin) bike.

a) Rewşa xwerû:

Dibe ku navdêr di vê rewşê da bi tena xwe be, yan jî gireyên nenasyarîyê bigire. Kara risteyê jî hertim di bin bandora rewşa xwerû da dimîne, lewra eger navdêr an cihnav xwerû bin, kar li gor wan tê kêşan. Di kurmancîyê da, bikera dema niha û ya dema dahatî û berkara dema borî di vê rewşê da derdikevin holê.

Mînak:

Rojda dibeze.
Ez dibezim.
Rojdayê Serdar dît.
Min ew dît.

b) Rewşa tewandî:

Ev rewş di kurmanciyê da bi rêya gireyan çêdibe, navdêr û cihnav di vê rewşê da gireyên tewangê digirin.

Tewang

Dema ku navdêr û cihnav di rewşa tewandî da tên kêşan, tûşî guherînekê tên, ev guherîn bi rêya gireyên tewangê pêk tê.

Gireyên tewangê: (ê, î, an)

Gireyên tewangê ji bo navdêrên nasyar û nenasyar heman in.

-ê: yekhejmar û mê

Mînak:

Ki nanekî li malê zêde bike, xwediyê malê ew e.

Kesê ku ji xezalan bitirse, naçe nêçîrê.

Kijanê ders xwend?

Her kes xwediyê hunerekê ye.

-î: yekhejmar û nêr

Mînak:

Ehmedî pezê xwe birîye mêrgê.

Ew nani dipêje.

Kijani got?

Li her welatekî maleka xwe çêke.

-an: pirhejmar

Mînak:

Hevalê rêwîyan nan e.

Li ber sîya daran sêv nakevin devan.

Kijanan ev kar kir?

Navê hin kesan li cihanê belav bûye.

• Li hin herêman bêjeyên nêr ên ku dengên "a" û "e" yê dihewînin, ji nava xwe tên tewandin, ev her du deng bi dengê "ê" yê tên guhartin.

Mînak:

bajar → Em li nav bajêr diman.

çem → Gîya li ber qeraxên çem har bûbû.

Silêman → Silêmên nan xwar.

Azad → Azêd ji me ra got.

Tewanga hejmarnavan

Hejmarnav jî ditewin, di tewangê da hin taybetmendiyên hejmarnavan ên cuda hene, lewra pêwîst e tewanga wan cuda bê dayîn.

Yek: Ev hejmarnav mê ye û bi "ê" yê tê tewandin.

Mînak:

Waneya yekê pir hêsan bû.

Di rêza yekê da rûniştibû.

- Dema ku hejmara “yek”ê cihna nenasyar be, nêtar e û li gor zayenda kesê mebestkirî tê tewandin.

Minak:

Yekî xelat wergirt.

Min ji yekî ra got.

Yekê mijar xwend.

Bila yekê bigota.

Hejmarnavên din ji duyan heta nozdehan bi “an”ê ditewin.

Minak:

Duyan xatir ji me xwast.

Sêyan xwendina zanîngehê qedand.

Pêncan helbest nivîsîn.

Çardehan civîn li dar xist.

Hejmarên ku bi sifirê diqedin ji bilî hejmara dehan, hemû bi “î”yê ditewin. Wekî: bistî, sihî, çilî, pêncîyî, şeştî, sedî, hezarî, milyoni, milyari ...

Minak:

Şeştî alîkarî ji me xwast.

Sedî xwe ji karî vekişand.

Hezarî bide wan.

Milyoni dengên xwe dan wê partîyê.

Pirxane

Ev hejmarnav dema ku mebest ji wan zêdeyî sedekî, hezarekî, milyonekî ... be, bi “an”ê ditewin

Minak:

Bi sedan hatin birîndarkirin.

Çalakvan bi hezaran bûn.

Bi milyonan hatin koçberkirin.

Tewanga hejmarnavên dabeşî

- Niv: Bi “î”yê ditewe.

Minak:

Nivî bixwe.

Nivî bibe.

Bi nivî kir.

- Çaryek: Bi “ê”yê ditewe.

Minak:

Çaryekê (ribek) bide wî.

Ez ê çaryekê ji xwe ra bibim.

Bi çaryekê ev pênûs kirî.

Hejmarnavên pirxane

- Di hejmarnavên pirxane da hejmarnava dawîn ditewe.

Minak:

Bi şeşt û yekê dest pê kir.

Ev bûyer di sala du hezar û yekê da qewimî.

Sih û sêyan kar kir.

Di sala hezar û sed û bist û pêncan da ji dayik bûye.

- Gava ku hejmarnavek berî "nîv"ê hebe, li gor hejmara berî xwe ditewe.

Mînak:

Du kilo û nîvan bîne.

Qîma xwe bi yek û nîvê nayîne.

- Hejmarnavên "hezar, milyon, milyar û hwd" gava ku bi hejmareka din ra bînin, dikevin bin bandora wê hejmarê û li gor wê tîn tewandin.

Mînak:

Bîst hezarî serî hilda.

Çar hezaran serkêşî kir.

Wê ew avahî bi du milyaran kirî.

Dema ku hejmarnav dibin hevalnav

- Dema ku hejmarnav dibin hevalnav, tewanga wan derbasî navdêran dibe.

Mînak:

Çar mamostayan pirtûk amade kir.

Bîst û pênc xwendekaran dibistan xemiland.

Ji bîst xwendekarî ra wane şirove kir.

Bi sed endamî karekê baş tê kirin.

Şêst jinî ev kar kir.

Xaniyê xwe bi hezar dolarî kirî.

- "Nîv" û "çaryek" dema ku bibin hevalnav, bandorê li navdêran piştî xwe nakin û navdêr li gor zayenda xwe ditewin.

Mînak:

Nîv sêvê bide wî.

Nîv nanî ji wî ra ji bîne.

Çaryek sêvê bixwe.

Çaryek nanî ji wî ra ji bîne.

Kengê navdêr û cihnav tîn tewandin?

- a) Di hemû dem û raweyan da ku li ser reha dema niha ava dibin, berkar ditewe.

Mînak:

Amed pirtûkan tîne.

Ew ê çendan vexwîne şahiyê?

Darê av bide.

- b) Di hemû dem û raweyan da ku li ser reha dema borî ava dibin, eger kar têper be, biker ditewe.

Mînak:

Bahozî dar çandibûn.

Pêncan alîkarî ji me xwast.

Kijanê alîkarîya te kir?

c) Berkara daçekan ditewe.

Minak:
Em li Efrîne mezin bûn.
We ji kijanan pirsî?

d) Di ravekê da dema ku ravek bi îzafeyê pêk bê, raveker ditewe.

Minak:
Dayika Zelalê jê hez dike.
Pirtûkên zarokan rengîn in.

e) Navdêr û cihnavên ku piştî karên berpêbûnê yên mîna, "çûn, hatin, şandin, anîn, birin û hwd" tên, ditewin.

Minak:
Şagird çûn dibistanê.
Ew hat gundî.
Wî em şandin zanîngê.
Wê pirtûk bi xwe ra bir dibistanê.

Eger navdêr li gel hevalnavên nîşander bikevin ber rewşa tewandî, navdêr û hevalnav her du tên tewandin.

Minak:
Wî hevalî alîkarî ji min xwast.
Wan gundiyan em pêşwazî kirin.
Vê zarokê şîr vexwar.
Van çûkan hêlinên xwe çêkirin.

Hin nîşe der barê tewangê da

a) Dema ku çend navdêr bikevin ber rewşa tewandî, navdêra dawîn tenê tê tewandin.

Minak:
Serdar, Ehmed, Zilan û Dilberê xwarin çêkir.
Ez li bajarên Qamişlo, Mehabad, Wan û Dihokê geriyame.
Ew rojname, kovar û pirtûkan dixwînin.

b) Gelek caran tîpa "n"yê ya gireya tewangê ya pirhejmarîyê "-an" di devokan da dikeve û ev yek derbasî nivîsînê ji dibe, lê di nivîsînê da ya rasttir ew e ku tîpa "n"yê were parastin.

Minak:

Devokî	Nivîskî
Me ji zaroka pirsî.	Me ji zarokan pirsî.

c) Eger du peyvên hejmarcûda bikevin ber tewangê, pêwîst e her du bîna tewandin. ✖

Minak:
Ez hespî û mehînan dibînim.
Ez mehîne û beranan difiroşim.^[14]

d) Eger navdêrên zayendnêr bibin navên cihan an jî navên kovar û rojnameyan, pêwîst e ew jî wekî hemû navdêrên din "mê" bîna tewandin. (Rêbera Rastnivîsînê, 2019: 127-129)

[14] Rêbera Rastnivîsînê, 2019: 124

Mînak:

Ez çûm Zanîngeha Selahedînê.
Li Rojavayê xwendin bi kurdî ye.
Min serdana Başûrê kir.
Kovara Welatê derket.

e) Carinan daçek ji hin cihan dikeve, lê her bandora wê dimîne û peyva di pey wê ra tê tewandin.

Mînak:

Rojekê gur û rovî bûne heval.
Havînan dinya germ dibe.

f) Carinan daçek dikeve û gireya "î" yê cihê wê digire, lê ev "î" bi rola daçekê radibe û peyva piştî xwe ditewîne.

Mînak:

Ez li civînê beşdar bûm.	Ez beşdarî civînê bûm.
Ez li wî rast hatim.	Ez rastî wî hatim.
Ew li dij me kar dike.	Ew dijî me kar dike.
Em bi wê hewce ne.	Em hewceyî wê ne.

c) Rewşa bangkirinê

Navdêr di vê rewşê da gireyên bangkirinê digirin:

Gireyên bangkirinê: "-o, -ê, -ino"

Navdêrên nêr û yekhejmar: -o

Navdêrên mê û yekhejmar: -ê

Navdêrên pirhejmar: -ino/no

Mînak:

Hevalê, li me guhdar bike.
Dosto, ev karê te ye!
Gundîno, berê we li ku ye?

Herwiha bi peyvên "ey, lê, lo, hêê, gelî, wa û hwd" ji navdêr dikevin rewşa bangkirinê.

Mînak:

Gelî hevalan, li gotinên min guhdar bin.
Hêê xwişkê! Tu dûrî cihê xwe ketî.
Wa Xemgîno, ka wê pirtûkê bide min.
Lo, çima tu xeydîyî?

2.6.1.2.5. Îzafe

Navdêrên kurmancî di rewşa îzafeyê da gireyan werdigirin, bi van gireyan ev peyv bi hev ve tîr girêdan. Herwiha ev gire zayend û hejmara peyvan jî dîyar dikin. Di heman demê da eger ev gire navdêr û cihnavan bi peyva berî wan ve girê bidin, rewşa xwedîtîyê pêk tê. Celadet Bedirxanî ji van gireyan ra "veqetandek" gotiye.

-a: yekhejmar û mê

Mînak:

Dara xweziyê şîn nabe.

Hînbûn ronahîya çavan e.

Mala kurdan mala merdan.

-ê: yekhejmar û nêr

Mînak:

Kes nabêje dewê min tirş e.

Kalê malê rûmet li balê.

Agirê biyaniyan mirovî germ nake.

-ên: pirhejmar

Mînak:

Hevalên baş di rojên teng da xuya ne.

Mirov bi sozên xwe ve tîn girêdan.

Her pênc tiliyên mirovî ne mîna hev in.

Gireyên îzafeyê li gel navdêrên nenasyar

Celadet Bedirxan gireyên îzafeyê kirine du beş: veqetandekên binavkirî (a, ê, ên) û veqetandekên nebinavkirî (eke, ekî, ine). (Bedirxan, 2022: 62-67) Piştra gelek rêzimannasên din jî ev mijar bi vî awayî daye.

Lê Rêbera Rastnivîsinê hin awayên cuda yên rewşa nenasyariyê şirove kirine; awayê yekem ê sivikkirî ku Celadet Bedirxanî daye û awayê duyem ku ev gire di rewşa nenasyar da jî nayên sivikkirin û wekî (a, ê, ên) dimînin. Rêberê tercîh kirîye ku gireyên "a" û "ên"ê wekî xwe bimînin û neyên sivikkirin, ji bo "ê"yê, ev awayê siviknekirî jî daye, lê tercîh kirîye ku awayê sivikkirî "î" bimîne. (Rêbera Rastnivîsinê, 2019: 132-138)

Gava ku "ê" bi navdêrên nenasyar ra jî neyê sivikkirin û awayê wê yê resen bê parastin baştir e. Herçiqas awayê sivikkirî berbelav be jî lê bandorê li rêgezê dike.

Tu girêdana gireyên îzafeyê bi rewşa nasyarî û nenasyariyê ra nîne. Ev tenê peywira gireyên nenasyariyê ye. Lewra nabe em gireyên îzafeyê wekî nasyar û nenasyar dabeş bikin; gireyên îzafeyê li gel navdêrên nasyar û nenasyar heman in.

Mînak:

Navdêrên nasyar	Navdêrên nenasyar
Mala me li wir e.	Maleka me li wir e.
Mijara me der barê hunermendê navdar da bû.	Mijara me der barê hunermendekê navdar da bû.
Gulên sor li vî baxçeyî hene.	Gulinên sor li vî baxçeyî hene.

2.6.1.3. Peywira navdêran a rêzimanî

biker	Zarok girî.
berkara rasterast	Dilovanî xelat wergirt.
berkara nerasterast	Wê gulek da Delalê.
temamkera bikerê	Ew xatûn e.
temamkera berkarê	Wan ew kir mamosta.
têrker	Ew çû malê.

2.6.2. Cihnav

Ew cureyê bêjeyan e ku cihê navdêr û frazên navdêrî digire, erk û peywira wan pêk tîne.

2.6.2.1. Cureyên cihnavan

2.6.2.1.1. Cihnavên kesî

Ev cureyê cihnavan cihê kesan^[15] digire. Di kurmanciyê da du komên cihnavên kesî hene:

a) **Koma xwerû** (ez, tu, ew, em, hûn, ew)

b) **Koma tewandî** (min, te, wî/wê, me, we, wan)

Cihnav		Kes
Xwerû	Tewandî	
ez	min	kesê yekem (axiver) yekhejmar
tu	te	kesê duyem (bihîzer) yekhejmar
ew	wî/wê	kesê sêyem (dabaş) yekhejmar
em	me	kesê yekem (axiver) pirhejmar
hûn	we	kesê duyem (bihîzer) pirhejmar
ew	wan	kesê sêyem (dabaş) pirhejmar

[15] Hin ji van cihnavan wekî ew, wê ... cihê ajel û tiştan ji digirin.

Cihnavên kesî yê xwerû: Cihê navdêrên xwerû digirin, zayenda wan nêtar e, lê hejmara wan dîyar e. Bandora wan rasterast li karê ye; gava ku bibin biker an jî berkar, kar li gor wan tê kêşan.

Kara "bûn"ê ya ku rewşê nîşan dide, bi van cihnavan ra tê bikaranîn; dema ku bi karan ra bê, dibe gire û bi wan ve tê nivîsîn, lê dema ku bi navdêr, cihnav, hevalnav û hevalkaran ra tê, kara bûnê ye û cuda tê nivîsîn.

Mînak:

Ez diçim

Tu Dilşêr î.

Ew jêhatî ye.

Em ji zû ve hev dinasin.

Hûn Xemgîn û Berfîn in.

Ew li jor in.

Yekhejmarî û pirhejmarîya kesê sêyem ê koma xwerû (ew) di nav risteyê da dîyar dibe.

Cihnavên kesî yê tewandî: Cihê navdêrên tewandî digirin. Ji van cihnavan zayenda "wî û wê"yê dîyar e, yê din nêtar in.

Mînak:

Mîn par karê xwe qedand.

Te derdor paqij kir.

Wî/wê qevdek gul dîyarî mamostayê kir.

Me ew rojên berê anîn bîra xwe.

We piştî xwe spartîye çiyayekê asê.

Wan bîranînen xwe nivîsîn.

Nîşe: Cihnavên tewandî yê kesê sêyem ên yekhejmar û pirhejmar ji cihnavên kesê sêyem ên xwerû û gireyên tewangê pêk hatine.

Ew + î → (e)wî

Ew + ê → (e)wê

Ew + an → (e)wan

Peywira cihnavên kesî ya rêzimanî

biker	Ez hatim.
	Te dîyarîyeka hêja wergirt.
berkara rasterast	Rêzanî tu ditî.
	Ez wê dibînim.
berkara nerasterast	Dilanê pêntûsek da min.
	Birûskî romanek da me.
temamkera bikerê	Ev, ew e.
	Kesê li ber deriyê ez im.

2.6.2.1.2. Cihnavên nîşander

Ev cihnav kes û heyînan nîşan didin.

a) Cihnavên nîşander ên xwerû: "ev, ew"

Cihnavên nîşander ên xwerû ji hêla zayend û hejmarê ve nêtar in, yekhejmarî û pirhejmarîya wan ji risteyê dîyar dibe. Cihnav "ev"ê kes û heyînen nêz nîşan dide; cihnav "ew"ê kes û heyînen dûr nîşan dide.

Mînak:

	Nêz	Dûr
Yekhejmar	Ev zevîyan av dide.	Ew zevîyan av dide.
	Ev li bilûrê dide.	Ew li bilûrê dide.
Pirhejmar	Ev zevîyan av didin.	Ew zevîyan av didin.
	Ev li bilûrê didin.	Ew li bilûrê didin.

b) Cihnavên nişander ên tewandî: “vî, vê, van, wî, wê, wan”

Dema ku cihnavên nişander ên xwerû “ev û ew” gireyên tewangê “ê, î, an” digirin, ditewin û awayê wan ê tewandî derdikeve holê. Zayenda cihnavên nişander ên tewandî yên yekhejmar diyar e, lê cihnavên pirhejmar nêtar in.

Nêz	ev + î = evî → vî	yekhejmar û nêr
	ev + ê = evê → vê	yekhejmar û mê
	ev + an = evan → van	pirhejmar
Dûr	ew + î = ewî → wî	yekhejmar û nêr
	ew + ê = ewê → wê	yekhejmar û mê
	ew + an = ewan → wan	pirhejmar

Nîşe: Di hin devokan da tîpa “e” yê ya destpêka van cihnavan (evî, evê, evan, ewî, ewê, ewan) ketiye û ev awayê sivikbûyî derbasî nivîsînê jî bûye.

Mînak:

Nêz	Dûr
Vî xelat wergirt.	Wî barê me sivik kir.
Vê xatir ji hevala xwe xwast.	Wê gotara xwe pêşkêş kir.
Van mal paqij kir.	Wan em rizgar kirin.

Nîşe: Bêjeyên “han/ha ...” ji bo xurtkirin û teqezkirina wataya nişandanê tên bikaranîn.

Mînak:

Eva **han** çû.

Ewa **han** hat.

Vêya **han** xwend.

Wîyê **han** da.

Wanên **han** teqez kir.

- Li gor devokan, carinan peyva “han”ê bi cihnavên nişander ra bi kar nayê, lê “an/a/e” dimîne û bi rola wê radibe.

Mînak:

Eve/ewe hat.

Vêya/wêya got.

Van/wanan got.

Peywira cihnavên nîşander a rêzimanî

biker	Ev dibeze. Wê xelat wergirt.
berkara rasterast	Bêrîvanê ew anî. Ez vê dibînim.
berkara nerasterast	Min pirtûkek da van. Nûdayê hinar frotin vê.
temamkera bikerê	Xwendekarê serkeftî ev e. Mamostayê ku me behsê dikir, ew e.

2.6.2.1.3. Cihnav a vegerok: "xwe"

Gava ku biker û berkar heman kes an tişt bin, ev cihnav dibe berkar û bûyerê li bikerê vedigerîne, ango heman kes bi bûyerê radibe û wê bûyerê werdigire. Di kurmanciyê da ev cihnav neguherbar e; di her rewş, hejmar û zayendê da yek e. Dikare cihê nêr û mê, yekhejmar û pirhejmar, herwiha cihê navdêrên xwerû û tewandî jî bigire.

Mînak:

Wî xwe da nasîn / Wê xwe da nasîn. (nêr û mê)

Ew xwe dibîne / Ew xwe dibînin. (yekhejmar û pirhejmar)

Min xwe dit / Ew xwe dibîne. (xwerû û tewandî).

Bikaranînên cihnav a "xwe"yê

a) Gava ku biker û berkar heman kes an tişt bin, dibe berkara rasterast.

Mînak:

Em tu carî xwe bi paş da nadin.

Xwe nede ber dîwarê ketî!

Nîşe: Gava ku ev cihnav dibe berkara rasterast wekî yekhejmar likar e, lewra di demên borî da kar li gor wê yekhejmar tê kêşan.

Mînak:

We xwe birîndar kir.

Wan xwe ji bindestiyê rizgar kir.

b) Di ravekê da dibe raveker

Mînak:

Karê xwe qedand.

Wê mala xwe li pala çiyayî ava kir.

Birîndar ji birîna xwe hîni hekîmiyê dibe.

c) Bi mebesta teqezkirin û xurtkirina bikerê tê.

Mînak:

Ew bi xwe hat.

Min bi xwe anî.

Wan bi xwe got.

Nîşe: Di hin devokên kurmancîyê da wekî devoka Efrîn û Kobanîyê, cihna "xwe" yê li cihê "wî/wê" yê bi kar tê, lê belê ev bikaranîn ne li gor erkên cihna "xwe" yê ye. Lewra nabe ku em cihna "xwe" yê li şûna "wî/wê" yê bi kar bînin.

Mînak:

Navê xwe Dilber e. (Navê wê Dilber e.)

Bavê xwe ne li vir e. (Bavê wî/wê ne li vir e.)

2.6.2.1.4. Cihna paşnûsek: "-ê"

Ev cihnav cihê navdêrên yekhejmar digire û bi dawîya kar û daçekan ve tê nivîsîn. Ji hêla hejmarê ve yekhejmar e, lê zayenda wê nêtar e.

a) Cihna "-ê" yê bi karan ra

Taybetmendîya wê ew e ku piştî hin karan tê, wekî: "çûn, hatin, ketin, xistin, şandin, gotin, dan, firotin, avêtin ..."

Mînak:

Ez çûm malê. → Ez çûmê.

Te av xist cerî. → Te av xistê.

Serdarî pênûs dan wî. → Serdarî pênûs danê.

Şivanî berx firotin Rênasî. → Şivanî berx firotinê.

b) Bi daçekan ra: Bi daçekên "li, ji, bi, di" ra tê.

Mînak:

Ez bi pênûsê/wê dinivîsim. → Ez pê dinivîsim.

Ew ji Evînê/wê ra dibêje. → Ew jê ra dibêje.

Mîna li Mêrdînê xwend. → Mîna lê xwend.

Hûn di avê werbûn. → Hûn tê werbûn.

Nîşe: Ev cihnav carinan bi daçekên lêkdayî ra jî tê bikaranîn.

Mînak:

Kalê malê rûmet li balê.

Ez sê rojan li cemê mam.

2.6.2.1.5. Cihna hevûdinî

Ev cihnav têkilî û tevgera çend alîyan rave dike ku li beramber hev an bi hev ra heman tevgerê dikin. Li cihê navdêrên pirhejmar bi kar tê û jî hêla zayendê ve nêtar e.

Di devokên kurmancîyê da ev cihnav bi du awayên cuda derdikeve pêşberî mirovî; hev û êk. Cihnavên "hev û êk"ê xwediyên heman peywîr û watayê ne. Hem ji bo "hev"ê hem jî ji bo "êk"ê di devokan da awayên cuda hene, lê wataya wan heman e.

Hev: hevûdin, hevûdu, hevdu ...

Êk: êkûdin, êkûdu, êkdu ...

Herçiqas ev awayên cuda hene, lê êdi "hev/êk" bi tenê jî vê peywîrê bi cih tîne.

Mînak:

Gelên herêmê jî çanda hev/êk ra rêzdar in.

Ew jî zaroktiyê ve hevalên hev/êk in.

Em jî hev/êk bawer dikin.

Heta kengê hûn ê jî hev/êk dîr bin?!

Peywîra cihna hevûdinî ya rêzimanî

berkara rasterast	Wan hev/êk dît.
	We hev/êk nas kir.
berkara nerasterast	Wan diyarîyên xweşik dan hev/êk.
	Wan tîr avêtin hev/êk.

Nîşe: Gava ku cihna "hev/êk"ê di dema borî da bi tena xwe bibe berkar, wekî yekhejmar likar e, lewra kar li gor wê yekhejmar tê kêşan.

Mînak:

Me hev/êk dît.

Wan hev/êk birîndar kir.

Cihna hevûdinî bi daçekan ra

ji + hev → jev	ji + êk → jêk
bi + hev → pev	bi + êk → pêk
li + hev → lev	li + êk → lêk
di + hev → tev	di + êk → têk

• Di hin rewşan da mirov dikare daçek û van cihnavan jî hev veqetîne.

Mînak:

Wan jev ra got / Wan ji hev ra got.

Em pev ketin / Em bi hev ketin.

Ew lêk hatin / Ew li êk hatin.

• Lê daçek û van cihnavan di hin rewşan da bi hev ra peyvek pêk anîye û jî hev cuda nabin, ev rewş zêdetir di karên biwêjî da heye.

Mînak:

Ew têk çûn.

Karê me pêk hat.

Wan ev kar pêk anî.

Hûn tev hatin.

karên biwêjî

2.6.2.1.6. Cihnavên nenasyar

Ev cihnav cihê navdêrên nediyar digirin. Bo nimûne, dema ku em bibêjin: "Hin li dibistanê dixwinin." Em li vir qala hinekan dikin, lê em diyar nakin ew kî ne. Cihnavên nenasyar li gor zayend û hejmarê xwe ditewin, wekî: yekê, yekî, filanê, hemûyan, gelek, hinan ...

Hin cihnavên nenasyar: hin, yek, kes, hemû, gelek, pir, tev, giş, tu, filan, bêvan, tişte, her kes, tu kes, her tişt, filan kes, bêvan kes, bêvan tişt ...

Mînak:

Hin dikin, hin dixwin.

Dinya ava ye, her kes bi aqilê xwe şa ye.

Yek tê û yek diçe.

Tu kes ranahêje barê ketî.

Tu li êşa xwe nepirsî, kes lê napirse.

Gelek ji min pirsî.

Hemûyan bi hev ra karê xwe qedand.

Hindikana zora gelekana bir.

Peywira cihnavên nenasyar a rêzimanî

biker	Hin hatin.
berkara rasterast	Em hemûyan diparêzin.
berkara nerasterast	Te gul dan gelekana.
temamkera bikerê	Ew hemû ne.

2.6.2.1.7. Cihnavên hejmarî

Ew hejmarnav in ku li cihê kes û tiştan tên bikaranîn. Ji bilî hejmarnava "yek"ê ku cihnavên nenasyar e, hemû hejmarnavên din dibin cihnavên hejmarî. Cihnavên hejmarî pirhejmar in û ji hêla zayendê ve nêtar in.

Mînak:

Çar derdora darên dibistanê dixepêrin.

Şeş man, sê bi rê ketin.

Heft li vî gundî mamosta ne.

Duyan em ji vî tengasiyê derxistin.

Pêncan doza mafê xwe kir.

Peywira cihnavên hejmarî a rêzimanî

biker	Çar bi gogê dilizin.
berkara rasterast	Ez ê sêyan bibînim.
berkara nerasterast	Min got duyan.
temamkera bikerê	Xwendekar deh bûn.

2.6.2.1.8. Cihnavên pêwendîyê

Ev cihnav dibin du beş:

a) "a, ê, ên"

Gava ku gireyên îzafeyê li şûna navdêran bi kar tên, dibin cihnav. Bo nimûne, eger em bibêjin "Pirtûka wî ya wêjeyê" li vir "ya" bi

rola cihnavê rabûye û cihê pirtûkê girtiye. Ev riste di rastîyê da wiha ye: "Pirtûka wî, pirtûka wêjeyê." Her sê gireyên îzafeyê "ê, a, ên" jî dikarin bi vê rolê rabin.

Mînak:

Xwişka min a biçûk bi ser ket.

Birayê te yê mezin çû Amedê.

Hevalên min ên dibistanê hatin mala me.

b) "a ku, ê ku, ên ku"

Ev cihnav cihê navdêran digirin û hevokan bi hev ve girê didin, jî gireyên îzafeyê (a, ê, ên) û gihaneka "ku"yê pêk tên. Bo nimûne: Dara ku min çandibû, şin bûye. Ev riste di rastîyê da wiha ye: "Min darek çandibû, ew dar şin bûye." Bi rêya gireya "a"yê û gihaneka "ku"yê peyva darê nehat dubarekirin û pêwendî di nav risteyê da çêbû.

Mînak:

A ku bi te ra axivî, hevala min bû.

Kaniya ku te av jê vexwar, gemar neke.

Ê ku hat, birayê min bû.

Serê ku neêşe, tu paçan lê negerîne.

Kesên ku li ber hindikî nekevin, li ber gelekî nakevin.

Peywira cihnavên pêwendiyê ya rêzimanî

bikera hevoka	Kesê ku qenciye bike, qenciye dibîne.
nesereke	Xwendekarê ku çû zanîngehê, tev li azmûnê bû.
berkara hevoka	Dara ku we çandibû, şin bû.
nesereke	Xortê ku we gihand, pismamê min bû.

2.6.2.1.9. Cihnavên xwedîtîyê

Di kurmancîyê da tu cihnavên xweser ku bibin cihnavên xwedîtîyê nînin, lê dema ku cihnavên kesî û nîşander ên tewandî, herwiha cihnava hevûdinî "hev/êk" û cihnava vegerok "xwe" di nav ravekê da wekî raveker cih digirin, bi erka xwedîtîyê radibin. Ev cihnavên navborî bi alîkarîya gireyên îzafeyê "a, ê, ên" cihnavên xwedîtîyê pêk tinin, zayend û hejmaran wan jî diyar dibin.

Mînak:

Dayika min rê nîşanî min dide.

Pênûsa li ser maseyê ya te ye.

Pirtûka vê gelekî bedew e.

Ev xanî yê wan e.

Dengê van dilsoj e, mirovî xemgîn dike.

Siyabendî pirtûka xwe da hevalê xwe.

Her kes a xwe dibêje.

Wan alîkarîya hev kirîye.

2.6.2.1.10. Cihnavên pirsyarî

Ev cihnav, pirsya navdêr û cihnavên din dikin. Pirsya kîjan cihnavê bikin, erka wê ya rêzimanî pêk tînin. Cihnavên pirsyarî ev in:

“kî, kê, çi, kîjan, çend”

Kî/kê: Ev cihnav pirsya kesan dikin; “kî” li navdêr û cihnavên xwerû û “kê” li navdêr û cihnavên tewandî dipirse. Ji hêla zayendê ve nêtar in.

Mînak:

Kî dipirse? Ez dipirsim.

Kî ket? Beko ket.

Kê ev çîrok gotiye? Wê ev çîrok gotiye.

Kê anî? Xezalê anî.

Kî kê dibîne? Ew wê dibîne / Nûjin Zozanê dibîne.

Kê kî dît? Wê ew dît / Zozanê Nûjin dît.

Çi: Pirsya tişt û heyberên di rewşa xwerû û tewandî da dike. Ji hêla zayendê ve nêtar e.

Mînak:

Çi firî? Çûk firî.

Te çi xwend? Min rojname xwend.

Dengê çi hat? Dengê daholê hat.

Tu dê çi binivîsî? Ez dê mijarekê binivîsim.

Ew çi av dide? Ew zevîyan av dide.

Kîjan: Ev cihnav pirsya cihnavên nîşander dike, di rewşa xwerû da nêtar e, bi alikariya gireyên tewangê rewşa wê ya tewandî bi dest dikeve û zayend û hejmarê wê diyar dibe.

Mînak:

Kîjan hat? Ev hat.

Kîjan dixwîne? Ew dixwîne.

Kîjanî çûk firand? Wî çûk firand.

Tu kîjanê dixwazî? Ez vê dixwazim.

Kîjanan ev kar qedand? Van ev kar qedand.

Çend: Ev cihnav pirsya cihnavên hejmarî dike, ji hêla hejmarê ve pirhejmar e û zayenda wê nêtar e. Bi alikariya gireya tewangê ya pirhejmar “an” ditewe.

Mînak:

Çend avjeniyê dikin? Pênc avjeniyê dikin.

Çend malê ava dikin? Sê malê ava dikin.

Çendan ew parast? Çaran ew parast.

Çendan şahî li dar xist? Dehan şahî li dar xist.

2.6.2.2. Bêjesaziya cihnavan

a) **Sade:** Ji rehekê pêk tînin.

Mînak:

ez, min, ev, kî, çi ...

b) **Lêkdayî:** Ji du rehan an zêdetir pêk tînin.

Mînak:

her kes, kîjan (kî + ji + wan), çardeh ...

2.6.3. Kar

Ew cureyê bêjeyan e ku rûdan, kar, tevger û rewşê radigihîne. Piştî navdêran cureyê bêjeyan ê herî berfireh ê zimanekî, kar e. Kategoriyên rêzimanî yên mîna: kes, hejmar, dem, rawe, xuyang û avaniyê têkildarî karê ne. Kar risteyê sergihayî dike û bêyî wê riste ava nabe.

2.6.3.1. Rader *masdar*

Radera karê: Teşe û forma karê ya bingehîn e ku hîn li gor kes, hejmar û deman nêhatiye kêşan.

Mînak:

kirin, gotin, karîn, mirin, dadan, dagirtin, vegotin, vexwarin, rûniştin, amade kirin, hişyar bûn, jê birin, li hev dan ...

2.6.3.2. Pareng (partîsîp)

Reha karê ye ku bi hin gireyan dibe hevalnav. Di kurmanciyê da reha dema borî bi gireya "î"yê parenga dema borî pêk tîne, wekî:

Reh	Gire	Pareng
Ket	î	Ketî
kola	(y)î	kolayî
ra-ket	î	raketî
xemiland	î	xemilandî
keli	o	keli
zer bû	(y)î	zerbûyî

Nîşe: Karên ku reha wan bi "î"yê bi dawî dibe "î"ya parengê nagirin, ji bilî hin karên wekî civîn, kelîn, bezîn, êşîn ... ku di formeka din da ji tînen kêşan, wekî civiyayî, keliyayî, beziyayî, êşiyayî.

Bikaranîna parengê

Wekî hevalnav

Ew dê vî xaniyê ketî ji nû ve ava bikin.

Destê westiyayî li ser zikê tîr e.

Darên avdayî geş in.

Nîşe: Karên tîneper dema ku bi parengê dibin hevalnav, wataya "aktîf"ê didin, lê karên tîper wataya "pasîf"ê didin. Bo nimûne, "ketî" wataya yê ku ketiye dide, lê "xistî" wataya yê ku hatiye xistin dide.

Di dem û raweyan da

Gireya parengê "î" di hemû dem û raweyan da bûye "î", ji bilî dema borî ya temam bi kesê duyem û sêyem ra herwekî "î" maye.

Mînak:

Ew hatîye. (dema borî ya temam)

Wî xwendibû. (dema borî ya dûr)

Eger xwastibe. (dananiya borî ya temam)

Bila guhartibûya (dananiya borî ya dûr)

2.6.3.3. Kar ji hêla watayê ve

Ji hêla watayê ve ji kar ji hev tînen cudakirin, hin kar hene ku çalakîyan destnîşan dikin, hinek jî rewşê diyar dikin. Mirov dikare karan ji hêla watayê ve wekî du cureyên sereke bide:

a) **Karên çalakî û tevgerê:** Di van karan da tevger û çalakîyek heye ku di nav pêvajoyekê da tê kirin.

Mînak:

xwendin, kirin, nivîsîn, ava kirin, baz dan, avjenî kirin, meşîn, gerîn ...

b) **Karên rewşê:** Ev kar rewşekê diyar dikan.

Mînak:

bûn, mirin, birçî bûn, mezin bûn ...

Karên rewşê ji di nav xwe da dabeş dibin:

Karên rewşê yên hestî: hez kirin, aciz bûn, xwastin ...

Karên rewşê yên pêhisinê: tam kirin, bêhn kirin, dîtin, bihistin ...

Karên rewşê yên pêzanînê: hizirîn, tê gihîştin, bawer kirin, ji bir kirin ...

Karên rewşê yên girêdanê: bûn, xuya bûn ...

Karên rewşê yên xwedîtîyê: hebûn, bûn ...

2.6.3.4. Kar ji hêla hêzê ve

Têperî taybetmendiyeka karan a rêzimanî ye, ev rewş karîn û şiyana karan di avakirina risteyê da diyar dikan. Têperî û teneperîya karan li gor berkarê diyar dibe, karên ku berkaran digirin têper in, lê karên ku berkaran nagirin teneper in.

Kar ji hêla hêzê ve di kurmancîyê da dibin du beş: Têper û teneper.

a) **Karên Teneper:** Pêdivîya van karan bi berkarê nîne, wekî: çûn, hatin, man, ketin, firin, civîn, rabûn, hişyar bûn ...

Mînak:

Ez ketim.

Çûk firî.

Bilind çû.

b) **Karên Têper:** Pêdivîya van karan bi berkarê heye. Karên têper dibin du beş:

Karên yektêper: Berkarekê bi tenê werdigirin, wekî: xwendin, bihistin, xwarin, birin, kirin, rakirin, vexwarin, ava kirin, bar kirin, li dar xistin ...

Mînak:

Me mala xwe bar kir.

Wî gotarek xwend.

Ew dengî dibihîze.

Karên dutêper: Du berkaran werdigirin, wekî: dan, gotin, firotin ...

Mînak:

Min gulek da Ahîne. "Gulek" berkara rasterast e, "Ahîne" ya nerasterast e.

Min agahîyek got wî. "Agahîyek" berkara rasterast e, "wî" ya nerasterast e.

Min pez firot bazirganî. "Pez" berkara rasterast e, "bazirganî" ya nerasterast e.

2.6.3.5. Kar ji hêla kêşanê ve

Wekî ku di hin zimanan da karên rêzîkî û nerêzîkî hene, di kurmancîyê da jî ev taybetmendî xuya dibe; di kurmancîyê da hin kar li gor rêzîka giştî tîn kêşan û hinek jî rêzîka giştî der in. Kar ji hêla kêşanê ve dibin du beş:

a) Rêzîkî

Ew kar in ku li gor rêgezeka diyar tîn kêşan. Bo nimûne, karên "kirin, xwarin, ketin ..." hem bi dema niha ra hem jî bi dema borî ra li gor rêzîka giştî tîn kêşan. Piraniya karên kurmancî rêzîkî ne.

Mînak:

Kar	Dema niha	Dema borî
kirin	Ez dikim.	Mîn kir.
xwarin	Ez dixwim.	Mîn xwar.
çûn	Ez diçim.	Ez çûm.
birin	Ez dibim.	Mîn bir.

b) Nerêzîkî

Hinek jî van karan tenê di dema borî da û hinek jî di dema niha da tîn kêşan. Dema ku mirov bixwaze van karan di hemû deman da bikêşe, reha radereka din bi kar tîne.

Mînak:

Karên nerêzîkî	Dema niha	Dema borî
herîn	Ew dihere.	
gotin		Wî got.
hiştin		Wî hişt.
dîtin		Wî dît.

2.6.3.6. Kar li gor peywirê

a) Karên bingehîn

Ev kar bi tena xwe, bêyî ku pêdiviya wan bi kareka din hebe, risteyekê pêk tînin.

Mînak:

Wî ji me ra çirokek got.

Ew daran diçîne.

Ew dê gotarekê binivîse.

b) Karên alîkar

Ew kar, ji bilî erka xwe ya bingehîn di avakirina dem, avanî û raweyan da bi karên bingehîn ra dibin alîkar û wataya kara bingehîn temam dikin. Karên alîkar: bûn, hatin, dan, kirin, vîyan, xwastin, karîn (kanîn/şîyan), zanîn, wêrîn.

- Karên alîkar ên sereke: bûn, hatin, dan

Kara “bûn”ê

Ev kar di van dem û raweyan da alîkar e:

Dema borî ya dût: Reha “bûn”ê ya dema borî piştî parenga dema borî tê.

Mînak:

Wî pembû çinibû.

Ez hatibûm geştê.

Wan fêki firotibûn.

Dananîya borî ya dût: Reha “bûn”ê ya dema borî piştî parenga dema borî tê.

Mînak:

Xwezî xwendibûya.

Bila hatibûya.

Eger çûbûya.

Dananîya **temam**: Reha “bûn”ê ya dema niha “b” piştî parenga dema borî tê:

Mînak:

Bila wan gotibe.

Divê wî ew biribe.

Dibe ku Zinar ev tişt anîbin.

Kara “hatin”ê

Di avaniya pasîf da alîkar e û li gor deman tê kêşan.

Mînak:

Xanî tê avakirin.

Azmûn dê bê çekirin.

Agahî hat dayîn.

Kara “dan”ê

Di avaniya hokarî da dibe alîkar û li gor deman tê kêşan.

Mînak:

Xwendekar spartekên xwe dide nivîsin.

Dilgeş dê mala xwe bide avakirin.

Bagerî zevîya xwe da avdan.

- Karên alîkar ên raweyî (modal): xwastin, karîn, şîyan, zanîn, wêrîn, kirin.

Ev kar ji karên alîkar ên din cuda ne; ji hêla watayê ve di pêkanîna raweya dananî da alîkar in, lê ji hêla ristesazîyê ve rîsteyeka têkel pêk tînin. Nimûne, “**Ez dizanim biçim.**” ji hêla watayê ve kara “zanîn”ê bûye alîkar da ku wataya “çûn”ê **temam** bike, lê ji hêla ristesazîyê ve “**ez dizanim**” hevoka sereke ye û “**biçim**” hevoka nesereke ye.

Kara "xwastin"ê

Mînak:

Ez dixwazim bixwînim.

Min dixwast wi bixwenda.

Me dixwast wan xwendibûya.

Kara "vîyan"ê

Mînak:

Divê em fêrî zimanê xwe bibin.

Divîya me karê xwe bikira.

Min divê bixwînin.

Min divîya biçûya.

Kara "zanîn"ê

Mînak:

Ew dizane stranan bibêje.

Min zanîbû bi gogê bilîzim.

Min berê zanîbû karê lêkirinê bikim.

Kara "karîn"ê

Mînak:

Ez dikarim bibeze.

Min dikarî derbas bikim.

Wê karîbû bê.

Kara "wêrîn"ê

Mînak:

Ez diwêrim bi şev bigerim.

Wi diwêrî bi tenê biçe.

Wê diwêrî di şevreşê da bihata.

Kara "kirin"ê

Ev kar wataya nêzîkbûnê dide kara bingehîn.

Mînak:

Ew dike bixwîne.

Wan dikir biçin.

Min dikira nexwenda.

2.6.3.7. Bêjesaziya karan

a) Karên sade

Ev kar ji rehekê tenê pêk tên.

Mînak:

alastin, anîn, avêtin, axiftin, bihîstin, bijartin, biraştin, birin, bûn, çûn, cûtin, firotin, girtin, gotin, guvaştin, hatin, hejmartin, hiştin, ketin, kirin, kolan, lîstin, mêtin, nivistin, pêçan, sotin, xistin, xwarin ...

b) Karên dariştî

Ev kar ji bêjeyekê û gireyên dariştinî pêk tên. Dibe ku ew bêje kar, navdêr, hevalnav an jî reheka bend be.

Mînak:

Cureyê bêjeyê		Gire	Kara dariştî
Kar	gotin	ve-	vegotin
Nav	êş	-în	êşîn
Hevalnav	germ	-ixîn	germixîn
Reha bend	cerib	-andin	ceribandin

Ev kar hem bi pêşgiran hem jî bi paşgiran bi dest dikevin, dibe ku heman kar pêşgir û paşgiran bigire.

Bi paşgiran: Karên dariştî bêhtir bi alîkarîya paşgirên "-în" û "-andin"ê çêdibin. Ji wan "-în" karên teneper, "-andin" karên têper çêdike. Karên mîna: nivîsîn, pirsîn ... herçiqas bi "-în"ê diqedin jî têper in.

Mînak:

Reh	Têneper	Têper
bar	barîn	barandin
bez	bezîn	bezandin
bor	borîn	borandin
civ	civîn	civandin
êş	êşîn	êşandin
fir	firîn	firandin
ger	gerîn	gerandin
herik	herikîn	herikandin
kel	kelîn	kelandin

ken	kenîn	kenandin
meş	meşîn	meşandin
qeris	qerisîn	qerisandin
rev	revîn	revandin
weş	weşîn	weşandin
xeyid	xeyidîn	xeyidandin

Paşgirên mîna "ijîn, ijandin, isîn, isandin, ixîn, ixandin"ê jî hene ku kêmtir tên bikaranîn:

Mînak:

Reh	Têneper	Têper
nerm	nermijîn	nermijandin
tep	<u>tepisîn</u>	<u>tepisandin</u>
germ	germixîn	germixandin

Bi pêşgiran: Dema ku gireyên "da-, hil-, ra-, ve-, wer-, rû- ..." tên pêşîya karan, karên nû pêk tînin.

da-: dadan, daketin, daxistin, dagirtin, dawêşandin
hil-: hildan, hilkirin, hilgirtin, hılanîn, hilbijartin
ra-: rakirin, raborîn, raketin, razan, rabûn, raxistin, ragihandin, rahiştin
rû-: rûdan, rûniştin, rûkirin
ve-: vedan, vebûn, vekirin, vexwarin, vejîn, vegirtin, vemirandin
wer-: wergerîn, wergerandin, wergirtin, werbûn, werdan

Ji bilî van, çend pêşgirên din hene ku di bingeha xwe da peyv in, lê wekî pêşgiran kar dikin. Ew jî “çê-, ber-, der-” in.

Mînak:

çê-: çêkirin, çêbûn

ber-: berdan, berbûn

der-: derxistin, derçûn

c) Karên lêkdayî

Ev kar ji du hêmanan an zêdetir pêk tên. Dema ku mirov wan ji hev cuda bike, her yek ji wan bêjeyeka serbixwe ye.

Mînak:

av dan, ava kirin, diyar kirin, baş bûn, bilind bûn, hûr kirin, sor kirin, amade bûn, aciz bûn, guh dan, bêhn vedan, biryar dan, bi paş ketin, nexweş ketin, li hev xistin, pêk anîn, têk çûn, tê gihîştin, ji nav birin, li dar xistin, pev çûn ...

2.6.3.8. Hin karên xwedî taybetmendiyên cuda

Bûn

Ev kar du watayên cuda dide ku ji hêla kêşanê ve jî ji hev cuda ne.

a) Ev kar rewşekê diyar dike.

Mînak:

Ez xwendekar bûm.

Ew zîrek bû.

Tu merd î.

b) Ev kar guhartina rewşekê diyar dike.

Mînak:

Ez bûm xwendekar.

Ew zîrek bû.

Tu merd dibî.

Dema ku ev kar tê kêşan, ji aliyê teşeyî ve jî ji hev cuda dibe.

Mînak:

Dem	Rewş	Guhartina rewşê
Dema niha	Ez mamosta me.	Ez dibim mamosta.
	Ew xwendekar e.	Ew dibê xwendekar.
	Hûn hunermend in.	Hûn dibin hunermend.
Dema borî	Ez mamosta bûm.	Ez bûm mamosta.
	Ew xwendekar bû.	Ew bû xwendekar.
	Hûn hunermend bûn.	Hûn bûn hunermend.
Dema dahatî	Ez ê mamosta bim.	Ez ê bibim mamosta.
	Ew ê xwendekar be.	Ew ê bibe xwendekar.
	Hûn ê hunermend bin.	Hûn ê bibin hunermend.

Herwekî diyar e, cihê her du karan jî di risteyê da ji hev cuda ye; ya rewşê piştî navdêran û ya guhartina rewşê berî navdêran tê nivîsin. Lê dema ku wekî karên lêkdayî mîna “mezin bûn, bilind bûn, sar

bûn, germ bûn ..." bèn bikaranîn, cihê wan dibe yek. Îcar di dema niha da ji ber ku teşeyê wan ne yek e, ji hev cuda dibin, lê di dema borî da teşeyê wan ji dibe yek û êdî bi rêya guvaşê ji hev tèn cudakirin.

Mînak:

Dem	Rewş	Guhartina rewşê
Dema niha	Ez amade me.	Ez amade dibim .
	Ew qenc e.	Ew qenc dibe .
	Tu bedew î.	Tu bedew dibî .
Dema borî	Ez amade bûm.	Ez amade bûm .
	Ew qenc bû.	Ew qenc bû .
	Tu bedew bûyî.	Tu bedew bûyî .
Dema dahatî	Ez dê amade bim.	Ez dê amade bibim .
	Ew dê qenc be.	Ew dê qenc bibe .
	Tu dê bedew bî.	Tu dê bedew bibî .

Neyîniya wan ji ji hev cuda ye; "bûn" a bi wataya rewşê, gireya wê ya neyîniyê jê cuda tê nivîsîn, lê ya bi wataya guhartina rewşê, gireya wê ya neyîniyê, wekî kareka asayî pê ve tê nivîsîn.

Rewş	Guhartina rewşê
Ew ne xwendekar e.	Ew nabe xwendekar.
Ew ne mamosta bû.	Ew nebû mamosta.
Ew ne dirêj bû.	Ew dirêj nebû.
Av ne sar bû.	Av sar nebû.

Paşok

• "Bûn" a bi wataya rewşê, gireya dananiyê "bi" nagire, lê "bûn" a guhartina rewşê, gireya dananiyê "bi" digire.

Rewş	Guhartina rewşê
Divê ew cotkar be.	Divê ew bibe cotkar.
Xwezî zîrek be.	Xwezî zîrek bibe.
Bila av germ be.	Bila av germ bibe.
Bila baş bûya.	Bila baş bibûya

• "Bûn" a rewşê tenê di dema borî ya sade da tê bikaranîn, lê "bûn" a guhartina rewşê, di her çar demên borî da tê bikaranîn.

Mînak:

Dem	Rewş	Guhartina rewşê
Dema borî ya sade	Ew mamosta bû.	Ew bû mamosta.
Dema borî ya berdewam	o	Ew dibû şervan.
Dema borî ya temam	o	Ew bûye mamosta.
Dema borî ya dût	o	Hûn bûbûn mamosta.

Der barê vê mijarê da xala gireyên kesî (im/me, î/yî, e/ye, in/ne) jî heye ku cihê nakokiyê ye, Bedirxan & Lescotî ew wekî kara bûnê bi nav kirine (Bedirxan & Lescot, 1970: 149). Tan diyar dike ku ew ji kara bûnê cudatir in û wekî cihnavên kesandinê bi nav kirine (Tan, 2015: 137-141). Di soraniyê da wan wekî cihnavên likaw bi nav dikin (39-42 :2013, خوشتناو). Ebdulfetah diyar dike ku ew ne cihnav ne jî kara bûnê ne, lê wan wekî paşkokên navdêr û cihnavan dihesibîne (Ebdulfetah, 2020c: 256-262).

diyar herî ke

Di encamê da mirov dikare bibêje ku ev ne cihnav in, dema bi karan ra tèn, gireyên kesî ne. Bo nimûne: "Ew dixwîne." Lê dema bi navdêr, cihnav, hevalkar û hevalnavan ra tèn, kara "bûn"ê ne û dema niha diyar dikin. Bo nimûne: "Ew xwendekar e."

Hebûn

Ev kar du watayan dide: (Bedirxan & Lescot, 1970: 199)

a) Wataya hebûnê

Dema niha	Dema borî	Dema dahatî	Boriya sade ya danani
Ez heme.	Ez hebûm.	Ez ê hebim.	Ez hebûma.
Tu heyî.	Tu hebûyî.	Tu yê hebî.	Tu hebûyayî.
Ew heye.	Ew hebû.	Ew ê hebe.	Ew hebûya.
Em hene.	Em hebûn.	Em ê hebin.	Em hebûna.
Hûn hene.	Hûn hebûn.	Hûn ê hebin.	Hûn hebûna.
Ew hene.	Ew hebûn.	Ew ê hebin.	Ew hebûna.

b) Wataya xwedîtiyê

Dema ku bi vê watayê tê, tenê li gor kesê sêyem (yekhejmar û pirhejmar) tê kêşan.

Ev kar, di hemû deman da nayê kêşan. Ji demên borî bi tenê di dema borî ya sade da tê bikaranîn (Ebdulfetah, 2020: 263)

Dema niha	Pirtûkeka min heye.	Pirtûkinên min hene.
Dema borî	Pirtûkeka min hebû.	Pirtûkinên min hebûn.
Dema dahatî	Dê pirtûkeka min hebe.	Dê pirtûkinên min hebin.
Boriya sade ya danani	Pirtûkeka min hebûya.	Pirtûkinên min hebûna.

lêkdayî

• Herçiqas ev kar teneper e, lê li hin herêman formeka bikaranîna wê ya bi cihnavên tewandî heye.

Mînak:

Min çar pirtûk hene.

Min hevalek hebû.

Awayê neyînîyê

Der barê ... de ⇒ der barê ... de

Neyînîya vê karê bi kara "tune bûn, nebûn/nînbûn"ê çêdibe.

Mînak:

Pênûsên depê li vir tune ne.

Pênûsên depê li vir nînin.

Der barê nivîsîna awayê neyînîya vê karê da nêrînên cuda hene. Ji bo "tune bûn"ê ji ber ku kareka lêkdayî ye, her kes gireyên kesî cuda dinivîse, wekî: tune ye, tune ne.

Lê ji bo "nînbûn"ê hin kes bi hev ve dinivîsin û hinek jî cuda.

Zilan dibêje: "Eşkere ye, ku nîne ji «nebûn»ê têt. Ji nebûnê re, di hin devokên kurmancî de, dibêjin nînbûn... Her çî be, eger ev forma han carina ji ber neçariyê bête bi kar anîn jî, divê pirtika nîn-ê bi kara bûn-ê ve bête nivîsîn." Ji ber vê sedemê "nîne" bi hev ve hatiye nivîsîn.

Mînak:

Min heye/nîne.

Te heye/nîne.

Wi/wê heye/nîne.

Min dê hebe/nînbe. (Zilan, h5: 37)

guyay

Dema niha	Maleka me nîne/tune ye. Mizgeftêk li taxa me nîne/tune ye.
Dema dahatî	Maleka me dê nebe/tune be. Mizgeftêk dê li taxa me nebe/tune be.
Dema borî	Maleka me nebû/tune bû. Mizgeftêk li taxa me nebû/tune bû.

Ev kar ji bilî erka xwe ya sereke ku wekî kar tê kêşan, herwekî me li jor diyar kir, kara "hebûn"ê pê tê neyînîkirin. Ji ber ku ev kar jî bi bûnê çêbûye, her du watayên bûnê angoyê rewşê û guhartina rewşê di nav xwe da dihevine. Bi wataya xwe ya yekem, bêhtir wekî neyînîya hebûnê tê bikaranîn. Bi wataya xwe ya duyem, bi wataya "ji holê rabûn û neman"ê tê, ew wekî kareka serbixwe tê bikaranîn. Cudahîya wan bi guvaşê derdikeve.

Mînak:

Dem	Rewş	Guhartina rewşê
Dema niha	Ez tune me.	Ez tune dibim/tune nabim.
	Tu tune yî.	Tu tune dibî/tune nabî.
	Ew tune ye.	Ew tune dibe/tune nabe.
	Em tune ne.	Em tune dibin/tune nabin.
	Hûn tune ne.	Hûn tune dibin/tune nabin.
	Ew tune ne.	Ew tune dibin/tune nabin.

Dema dahatî	Ez ê tune bim.	Ez ê tune bibim/tune nevim.
	Tu dê tune bî.	Tu dê tune bibî/tune nebî.
	Ew ê tune be.	Ew ê tune bibe/tune nebe.
	Em ê tune bin.	Em ê tune bibin/tune nebin.
	Hûn ê tune bin.	Hûn ê tune bibin/tune nebin.
	Ew ê tune bin.	Ew ê tune bibin/tune nebin.
Dema borî ya sade	Ez tune bûm.	Ez tune bûm/tune nebûm.
	Tu tune bûyî.	Tu tune bûyî/tune nebûyî.
	Ew tune bû.	Ew tune bû/tune nebû.
	Em tune bûn.	Em tune bûn/tune nebûn.
	Hûn tune bûn.	Hûn tune bûn/tune nebûn.
	Ew tune bûn.	Ew tune bûn/tune nebûn.

Demên borî yên din

Me berê daye diyarkirin ku kara "hebûn"ê bi tenê di dema borî ya sade da tê bikaranîn. "Tune bûn" ku bi wataya rewşê tê, bêhtir wekî neyînîya "hebûn"ê tê, loma ew jî bi tenê di dema borî ya sade da heye. Lê ya din ku bi wataya guhartina rewşê tê, di hemû demên borî da tê bikaranîn.

Tune bûn (guhartina rewşê)

Dem	Erênî	Neyînî
Dema borî ya berdewam	Ez tune dibûm.	Ez tune nedibûm.
	Tu tune dibûyî.	Tu tune nedibûyî.
	Ew tune dibû.	Ew tune nedibû.
	Em tune dibûn.	Em tune nedibûn.
	Hûn tune dibûn.	Hûn tune nedibûn.
Dema borî ya temam	Ew tune dibûn.	Ew tune nedibûn.
	Ez tune bûme.	Ez tune nebûme.
	Tu tune bûyî.	Tu tune nebûyî.
	Ew tune bûye.	Ew tune nebûye.
	Em tune bûne.	Em tune nebûne.
Dema borî ya dûr	Hûn tune bûne.	Hûn tune nebûne.
	Ew tune bûne.	Ew tune nebûne.
	Ez tune bûbûm.	Ez tune nebûbûm.
	Tu tune bûbûyî.	Tu tune nebûbûyî.
	Ew tune bûbû.	Ew tune nebûbû.
Dema borî ya dûr	Em tune bûbûn.	Em tune nebûbûn.
	Hûn tune bûbûn.	Hûn tune nebûbûn.
	Ew tune bûbûn.	Ew tune nebûbûn.

Nîşe: "Tune kirin" awayê vê karê yê têper e.

Vîyan/vîn

Bedirxan & Lescotî ji bo radera vê karê ev her çar rader: "vîn, vîyan, vêtin, vên" û ji bo fermaniyê "bivê, bive" dane. (Bedirxan & Lescot, 1970: 204)

Aliyê vê karê yê balkêş ew e ku di dema niha da koma cihnavên tewandî pê ra tê bikaranîn.

Mînak:

Wan tîfingek divê/divêt.

Min tîfingin divên/divêtin.

Li hin herêman bikera wê di dema niha da di rewşa xwerû da jî tê bikaranîn û wekî hemû karên din ên asayî tê bikaranîn.

Mînak:

Ew tîfingekê divên.

Ez tîfingin divêm.

Lê divê bê diyarkirin ku awayê vê karê yê awarte berbelavtir e.

Mînak:

"Min nevêt dinya bi carek paşî wê sîmaperî" (Xani, 2019: 238)

"Min postekî baqî divê

Kewser ji dest saqî divê" (Teyran, 2017: 330)

Ev kar di raweya ragihandinî da jî tê, lê zêdetir di raweya dananî da tê bikaranîn.

Ragihandini	Min tifingek divê / Min tifingek navê. Xaniyek ji min ra divê.
Danani	Divê/divêt em hîni zimanê xwe bibin. Divîya me ew agahdar bikira. Divîya ew çûbûna şevbuhêrkê. Divê ew hatibe sînemayê.

Kêşana kara "vîyan"ê ya dema borî

Ebdulfetahî wekî hemû karên din, ev kar li gor hemû demên borî kêşaye:

Wi sêvek divîya. (dixwast)

Te sêvek vîyaye. (xwastiye)

Wan sêvek vîyabû.^[16] (xwastibû)

Xwezî min çar sêv bivîyana. (bixwastina)

Bila te ji pênc sêv vîyabûna. (xwastibûna)

(Ebdulfetah, 2020c: 222)

Bedirxan û Lescotî kara "vîyan"ê di dema borî ya dûr da kêşaye û ji bo demên din ên borî gotine ku kêma tê bikaranîn û li şûna wê, kara hevhataya wê "xwastin" herwiha "lazim bûn, gerek bûn, dil hebûn" tên bikaranîn:

^[16] Di devokan da kêşana dema borî ya dûr bi awayê "diviyabû"yê ji heye, nimûnc: *Yewnanan dikir ko vegerin welatê xwe. Diviya bû di Diçlê re derbas bibin.* (Hawar, c2: 788)

berber

Jê ra çausorî lazim bû.

Soro xwest here bîstana xwe. (Bedirxan & Lescot, 1970: 206)

Zanîn

Kareka têper e, berkara wê hevok e û li pey tê.

Mînak:

Ez dizanim li bilûrê bidim.

Wî zanî xaniyan ava bike.

Min zanîbû ew ê li vir bimîne.

Min dizanî ez pirsgirêkê çareser bikim.

Carinan berkarekê werdigire ku ne hevok e.

Mînak:

Ez bi çîrokê dizanim.

Ez bi wan mijaran dizanim.

Awayê neyîniyê

Neyîniya vê karê cuda ye, bi alikariya gireya "ni-"yê tê neyînikirin, tenê di dema borî ya berdewam da bi gireya "ne-"yê tê neyînikirin.

Mînak:

Ez nizamim li tembûrê bidim.

Wî nizanî vî karî bike.

Min nizanîbû ew ê biçê.

Wî nedizanî avdanê bike.

Formên vê karê yên cuda hene ku ne wekî karên din in. Aydogan çend formên vê karê ji romanên kurdî dide, wekî “dizanîbû, bizanîbûya” û wan wekî karên marjînal bi nav dike. (Aydogan, 2013: 64-65). Herçiqas ev form di nivîs û devokên kurdî da bên dîtî jî ya baş ew e ku formên rêzimanî bên parastin.

Karîn

Kareka têper e, berkara wê hevok e û li pey tê.

Mînak:

Mîn karî wan razî bikim.

Mîn karîbû vî karî bibim serî.

Ew dikare vê dozê çare bike.

Carinan berkarekê werdigire ku ne hevok e.

Mînak:

Kes bi wî nikare.

Ew bi zimanê xwe nikare.

Awayê neyînîyê

Neyînîya “karîn û zanîn”ê bi heman awayî çêdibe, karîn jî bi “nî”yê tê neyînîkirin û di dema borî ya berdewam da, bi “ne-”yê tê neyînîkirin.

Mînak:

Ew nikare li gundî bimîne.

Wî nikarî wan li vir bi cih bike.

Wan nikariye xwe bigihînin wê deverê.^[17]

Me nedikarî vê ramana wan biguhêrin.

Formên bikaranîna vê karê yên cuda wekî “dikarîbû, bikarîbûya, bikaribe” jî tînin dîtî, lê ya baş ew e di nivîsînê da formên rêzimanî bên parastin.

keşê = problem

Şîyan

Kareka têper e û bi wataya “karîn”ê tê, berkara wê karê jî hevok e û li pey tê.

Mînak:

Hûn dişên me ji vir dûr bikin.

Wî şîya vê kêşeyê safî bike.

Mîn şîya ez zû xwe xelas bikim.

Awayê neyînîyê

Neyînîya vê karê di hemû dem û raweyan da bi “ne-”yê pêk tê. (

Mînak:

Ez neşêm dev ji te berdim.

Ez ê neşêm alîkariya te bikim.

Wê neşîya mijarê zelal bike.

Wan neşiyabû her tiştî bikin.

We neşiyaye amadekariyan bikin.

We nedişîya bi wan ra bilizin.

[17] Li gor Ebdulfetahî, ev dem zêde nayê bikaranîn (Ebdulfetah, 2020c: 235-236)

Wêrin

Kareka têper e, berkara vê karê ji hevok e û li pey tê.

Mînak:

Ez diwêrim pê ra biçim.

Ew diwêre nêzîkî wan bibe.

Tu diwêrî mijarê pê ra gengeşe bikî.

Carinan berkarekê werdigire ku ne hevok e.

Mînak:

Ez bi wî diwêrim.

Em bi dijminan diwêrin.

Awayê neyîniyê

Ev kar ji di hemû dem û raweyan da bi alîkarîya gireya "ne-"yê tê neyînikirin.

Mînak:

Ez newêrim bi wan ra biaxivim.

Ew ê newêre rastiyê bibêje.

Te newêrî guh bidî wan.

Te newêribû di wê tarîtiyê da biçî.

Me nediwêrî em zû bi zû ji gundî bar bikin.

2.6.3.9. Kêşana karan

Kêşan: Ew guherîn e ku kar di risteyê da rastî wê tên. Karên kurmancî li gor kes, hejmar, dem, rawe, xuyang û avaniyê tên kêşan. Dem û rawe li ser reha karan ava dibin.

2.6.3.9.1. Reh (rayek)

Yekeya herî biçûk a karê ye. Dema ku hemû gireyên kêşanê û yên bêjesaz ji karê tên rakirin, reh li holê dimîne. Di kurmanciyê da du rehên karê hene; reha dema borî û ya dema niha.

a) Reha dema borî

Ew beşa karê ye ku dema borî li ser tê avakirin. Gava ku em gireyên raderîn (in/n) ji karan radikin, reha dema borî bi dest dikeve:

Kar	Reha dema borî
ristin	rist
vekirin	ve-kir
gerandin	gerand
meşîn	meşî
karîn	kari

b) Reha dema niha

Ew beşa karê ye ku dema niha û dahatî li ser tê avakirin.

Reha dema niha ji bo hemû karan ne bi heman awayî tê bidestxistin, li gor her karekê tê guhartin. Gava ku kar tê kêşan, mirov gireya "di"yê û gireya kesî radike, reha dema niha dimîne. Bo nimûne, kara "diçim"ê gava ku em "di" û "im"ê jê rakin, "ç" dimîne, ew reha dema niha ye.

başlangıç / ketene

Herwiha dema ku kar di raweya fermanî da jî bê kêşan, mirov dikare reha dema niha bi dest bixe. Wekî: biçê, dema ku em "bi" û "e"yê jê rakin "ç" dimîne. Axiverên zimanî bi tenê dikarin bi vî awayî rehê bi dest bixin, ji bo kesên neaxiver divê ji ber bikin.

Mînak:

Kar	Kêşana wê di dema niha da	Reh
kotin	dikoje	koj
birin	dibe	b
xwendin	dixwîne	xwîn

Bidestxistina reha dema niha li gor komên karan tê guhartin; ji bo nişankirina reha dema niha awayên cuda hene, hin rêgezên bidestxistina reha dema niha: (Muhammed, 2015)

a) Karên dariştî yên ku bi "în"ê diqedin, "în" tê rakirin.

Kar	Reha dema niha
civîn	civ
revîn	rev
bezîn	bez
birîn	bir
nivîsîn	nivîs

b) Karên dariştî yên ku bi "andin"ê diqedin, "andin" radibe û "în" dikeve şûnê.

kar	Reha dema niha
civandin	civîn
kelandin	kelîn

revandin	revîn
bezandin	bezîn

c) Karên dukîte yên ku bi "an"ê diqedin, "an" radibe.

Mînak:

Kar	Reha dema niha
hêran	hêr
kutan	kut
kolan	kol
hêlan	hêl
kêşan	kêş

d) Ji bilî "dan û man"ê karên yekkîte yên ku bi "an"ê diqedin, "an" radibe û "ê" şûna wê digire.

Kar	Reha dema niha
zan	zê
pan	pê

e) Karên ku bi "ûn" û "ûtin"ê diqedin; ên ku bi "ûn"ê diqedin "n" ji wan dikeve, yên ku bi "ûtin"ê diqedin "tin" ji wan dikeve. "Bûn û çûn" ku "ûn" ji wan radibe, ji vê rêgezê der in.

Kar	Reha dema niha
dirûn/dirûtin	dirû
cûn/cûtin	cû

bijen bejen

f) Karên ku bi "tin"ê diqedin ku berî wê dengnedêrek hebe û berî dengnedêrê "a" hebe, "tin" radibe û "a" dibe "ê". Eger dengê berî "tin"ê bêjen (f, s, ş) be, dibe dengê bijen (v, z, j)

Mînak:

Kar	Reha dema niha
axaftin	axêv
bijartin	bijêr
parastin	parêz
hinartin	hinêr

g) Karên ku bi "tin"ê diqedin eger berî wê dengnedêrek hebe û berî dengnedêrê "a" nebe, "tin" radibe, eger dengê berî "tin"ê bêjen (f, s, ş) be, dibe dengê bijen (v, z, j)

Kar	Reha dema niha
kuştin	kuj
axiftin	axiv
Lîstin	lîz
girtin	gir

h) Karên ku bi "rin"ê bi dawî dibin û berî wan dengdêrek hebe, hem "rin" dikeve hem jî tîpa dengdêr a berî wê.

Kar	Reha dema niha
kirin	k
xwarin	xw
birin	b

i) Karên ku bi "êtin"ê bi dawî dibin, "tin" radibe û "ş" ya ku ji raderê ketiye dibe "j".

Kar	Reha dema niha
avêtin	avêj
rêtin	rêj
mêtin	mêj

j) Karên ku bi "otin"ê bi dawî dibin, "tin" radibe û "ş/j" li şûna wê tê.

Kar	Reha dema niha
firotin	firoş
dotin	doş
sotin	soj
kotin	koj

k) Karên ku bi "istin"ê bi dawî dibin, "istin" radibe.

Kar	Reha dema niha
xistin	x
nivistin	niv

Hin kar hene ku ne li gor van rêgezên navborî tîpên kêşan û awayê bidestxistina reha wan cuda ye:

Mînak:


Kar	Reha dema niha
şikestin	şik
şûştin	şo
mirin	mir
hatin	hê/ê

2.6.3.9.2. Rawe

grammatical mood
lip

Rawe kategoriyeke rêzimanî ye ku bi alikariya teşe û forma "kar"ê, pêkhatina karekî diyar dike. Rawe nişan dide ka karê ku tê kirin di qada rastiyê da ye yan na. Rawe dibin sê beş:

- a) Raweya ragihandinî
- b) Raweya fermani
- c) Raweya dananî



2.6.3.9.2.1. Raweya ragihandinî

Ev rawe karên di qada rastiyê da nişan dide, bi rêya vê raweyê diyar dibe ka gelo kar di pêvajoya pêkhatinê da ye, pêk hatiye, yan jî dê pêk bê; ango ev rawe dem in.

Dem weki sê demên bingehîn dabeş dibin: dema niha, dema dahatî, dema borî. Ji van deman, dema niha û dema dahatî li ser reha dema niha ava dibin û dema borî li ser reha dema borî ava dibe.

Demên ku li ser reha dema niha ava dibin	1. Dema niha 2. Dema dahatî
Demên ku li ser reha dema borî ava dibin	1. Dema borî ya sade 2. Dema borî ya berdewam 3. Dema borî ya temam 4. Dema borî ya dûr

2.6.3.9.2.1.1. Dema niha

amraz

Ev dem hem bûyerên ku di dema vegotinê da hem jî bûyerên ku li ser hev tînin kirin, nişan dide.^[18]

Carinan mirov bi hevalkarên "niha, va ye, va, wa ..." bûyerên di dema vegotinê da û bi hevalkarên "her roj, hertim, carinan, hin caran, her sibeh ..." bûyerên ku bi dubareyî tînin kirin, jî hev cuda dike. Carinan jî bêtî hevalkaran lê ji konteksta risteyê tê digihîje.

Ev dem bi alikariya gireya "di-"yê, reha dema niha ya karê û gireyên kesî pêk tê, gireya "di-"yê tê pêşîya reha dema niha.^[19]

Form

"di-" + reha dema niha + gireyên kesî

sahî elberî

Mînak:

Ez gulê diçînim.

Bahoz her sibeh diçe dibistanê.

Hesp siwarê xwe nas dike.

- Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "di-"yê dikeve navbera pêşgîrê û reha karê ya dema niha.

[18] Di hin zimanan da mîna zimanê îngilîzî, vê demê jî hev cuda dikin; ji bo bûyerên dema axiftinê "dema niha ya berdewam" û ji bo bûyerên ku bi dubareyî tînin kirin "dema niha ya sade" tê bikaranîn.

[19] Ji bo kêşana dema niha formên cuda hene. Ew form bi alikariya hin amrazan pêk tînin, lê ne awayê standard in, bi tenê cudabûnên di navbera devokan da ne. Mînak: Ez a diçim, ez ê diçim, ez diçime, em diçine ...

Mînak:

Dîlan avê vedixwe.

Amed zû ji civatê radibe.

Ew barê me hildigire.

Neyînî

Neyînîya dema niha bi alîkarîya gireya neyînîyê "na-" pêk tê. Gireya "na-"yê cihê "di-"yê digire. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya neyînîyê "na-" piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Ji her ewrî baran nabare.

Agirîn rojane venagere malê.

Her car ji mirovî ra li hev nayê.

- Di vê demê da karên "zanîn û karîn"ê bi "ni-"yê tên neyînîkirin.

Mînak:

Heta ku birçî nebe, qedirê xwarinê nizane.

Ew nikare li xerîbîyê bijî.

- Di vê demê da karên "şîyan û wêrîn"ê bi "ne-"yê tên neyînîkirin.

Mînak:

Ez newêrim bi tenê biçim.

Em neşên vî karî bikin.

2.6.3.9.2.1.2. Dema dahatî *bê*

Ev dem behsa wan kar, rûdan û tevgeran dike ku dê bên kirin. Herçiqas ev dem bi teşeyê xwe wekî raweyên dananî ye, lê ji ber ku plana karekê paşerojê vedihewîne, cihê xwe di nav raweyên ragihandinî da digire. Dema dahatî bi alîkarîya amraza "dê/ê"yê pêk tê.

Form

"dê/ê" + "bi-" + reha dema niha + gireyên kesî

Mînak:

Ez ê îşev zû binivim.

Tu dê di betlaneyê da çi bixwîni?

Ew dê îsal xwendina zanîngê bîqedîne.

Em ê fêrî zimanê xwe bibin.

- Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "bi-"yê radibe.

Mînak:

Hûn ê vî barî hilgirin.

Ez dê vê nivîsê wergerînim.

Neyînî

Bi alîkarîya gireya "ne-"yê pêk tê. Gireya "ne-"yê tê cihê gireya "bi-"yê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya neyînîyê "ne-" piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Em dê vi karî nekin.

Ew dê ji ser banî danekeve.

Xemlîn dê avjenîyê neke.

2.6.3.9.2.1.3. Dahatîya tamam

Ev dem behsa karekî dike ku dê di demeka paşerojê da tamam bûbe.

Form

“dê/ê” + parenga dema borî (reha dema borî + “î”) + reha “bûn”ê ya dema niha + gireyên kesî

Mînak:

Heta wê demê ew dê hatibe malê.

Heta hingê, wî dê xelata xwe wergirtibe.

Heta tu bigihîji, dê pêk anîbe.

Karên ku reha wan a dema borî bi dengdêrê diqede, gireya parengê “î” nagirin.

Mînak:

Ew dê çûbe.

Wî dê anîbe.

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alikariya gireya “ne-”yê pêk tê; “ne-” tê pêşîya reha karê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, “ne-” piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Heta em bigihîjin, dê karê xwe neqedandibe.

Heta wê demê ez dê venegerîbim.

Heta sibe jî wî dê amade nekiribe.

2.6.3.9.2.1.4. Dahatîya borî

2.6.3.9.2.1.4.1. Dahatîya dananî ya sade

Ev dem qala karekî dike ku hatiye plankirin, lê pêk nehatiye.

Form

“dê/ê” + “bî” + reha dema borî + gireyên kesî + gireya “-a”yê

Mînak:

Ez dê bihatima gundî.

Ew dê li vir bimana.

Mîna dê bixwenda.

Te dê ew agahdar bikira.

Karên ku bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya “bi-”yê nagirin.

Mînak:

Te dê vexwara.

Ew dê rûnişta.

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alikariya gireya "ne-"yê pêk tê; gireya "ne-"yê cihê gireya "bi-"yê digire, eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, "ne-" dikeve navbera pêşgir û reha karê.

Mînak:

Ez dê neçûma Qamişloyê.

Em dê şeva din zû raneketina.

Me dê ji bo vî karî avahiyek ava nekira.

2.6.3.9.2.1.4.2. Dahatiya dananî ya dûr

Ev dem ji qala kareki dike ku di demeka dûr da hatibû plankirin, lê pêk nehatibû.

Form

"dê/ê" + parenga dema borî (reha dema borî + "î") + reha dema borî ya "bûn"ê + gireyên kesî + gireya "-a"yê

Mînak:

Te dê çareser kiribûya.

Wî dê em biribûna.

Wan dê ew şandibûya.

Karên ku reha wan a dema borî bi dengdêrê diqede, gireya parengê nagirin.

Mînak:

Em dê çûbûna.

Wan dê gotarek nivîsibûya.

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alikariya gireya "ne-"yê pêk tê. Gireya "ne-"yê tê pêşîya reha dema borî ya karê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, "ne-" piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Wî dê nexwaribûya.

Ew dê raneketibûna.

Wan dê nexwendibûya.

2.6.3.9.2.1.5. Dema borî ya sade

Ev dem wan kar û tevgeran radigihîne ku di dema borî da qewimîne û bi dawî bûne. Ev dem li ser reha dema borî ava dibe.

Reha dema borî di heman demê da dema borî ya sade ya kesê sêyem ê yekhejmar nişan dide.

Di dema borî da eger kar têper be, biker tewandî ye û kar li gor berkarê tê kêşan, eger kar teneper be, biker xwerû ye û kar li gor bikerê tê kêşan.

Form

reha dema borî + gireyên kesî

Mînak:

Karên têneper

Ez çûm.

Tu çûyî.

Ew çû.

Em çûn.

Hûn çûn.

Ew çûn.

Karên têper

Mîname nivîsî.

Te name nivîsî.

Wi/wê name nivîsî.

Me name nivîsî.

We name nivîsî.

Wan name nivîsî.

Ji mînakan jî diyar dibe gava ku em karan bi kesê sêyemê yekhejmar ra dikişînin, em gireya kesî "e/ye" bi kar nayînin.

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alikariya gireya neyînîyê "ne-" çêdibe, gireya neyînîyê tê pêşîya reha dema borî ya karê. Eger kar bi alikariya pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgîrê cih digire.

Mînak:

Mîname nexwend.

Ew neçû.

Em raneketin.

2.6.3.9.2.1.6. Dema borî ya berdewam

Ev dem hem kar û bûyerên ku di dema borî da berdewam bûn hem jî karên ku li ser hev dihatin kirin, nîşan dide.

Mînak:

Dema ku min taştê dixwar, ew hat.

(xwarina taştê di dema borî da berdewam bû)

Dema ku em biçûk bûn, ez hertim diçûm mala kalikê xwe.

(karekê ku berê bi dubareyî dihat kirin)

Ev dem li ser reha dema borî û bi alikariya gireya "di-"yê pêk tê.

Form

di + reha dema borî + gireyên kesî

Mînak:

Karên têneper

Ez dibezîm.

Tu dibezî.^[20]

Ew dibezî.

Em dibezîn.

Hûn dibezîn.

Ew dibezîn.

Karên têper

Min kovar dixwend.

[20] Karên ku reha wan a dema borî bi "î"yê bi dawî dibe, gireya kesê duyem "î" nagirin.

Te ez diditim.

Wê gelek mijar dinivîsin.

*To ez vînegêre / digêre
Aye zaf babetê nustêre*

Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "di-"yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Ez zû radiketim.

Ez rew rakewtêre

Em li ser giyayî rûdiniştin.

Ma vaxî ser o ronîstêre.

Me mala xwe çêdikir.

Ma bejeyê xo vînegtêre.

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alikariya gireya "ne-"yê pêk tê, "ne-" tê pêşîya gireya "di-"yê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Me nedigot.

ma nevatêre

Wî venedixwar.

Ez nênimîtêre

Ez ranediketim.

Ez nêrnekewtêre

2.6.3.9.2.1.7. Dema borî ya tamam

Ev dem wan kar û bûyeran rave dike ku di demeka borî ya nediyar da qewimîne. *→ ?(ew)*

Di van rewşan da tê bikaranîn:

- Karekê ku di dema borî da qewimîye û bi dawî bûye, lê encama wî li ber çavan e, nimûne: Min ew bajar dîtîye.

- Karekê ku di dema borî da qewimîye, lê hin ji berdewam e, nimûne: Ji biharê ve dest bi xwendinê kirîye.

- Ji bo rûdanên ku mirovî ji hinan bihistibin, nimûne: Dibêjin ku ew hatiye gundî.

Dema borî ya tamam li ser reha dema borî û bi alikariya paşgira partîsîpê "i" û koma duyem a gireyên kesî (me, yî, ye, ne) pêk tê. Paşgira partîsîpê "i" ji "i"yê sivik bûye, lê ji bo kesê duyem û sêyem paşgira partîsîpê "i" berî "yî" û "ye"yê, tê parastin. (Bûlbûl, Folklor û Ziman, h1,c1,2020: 118)

Form

parenga borî (reha dema borî + î/i) + gireyên kesî

Mînak:

Karên teneper

Ez ketime.

Ez kewta

Tu ketîyî.

tî kewtî / kewta

Ew ketîye.

o kewta / a kewta

Em ketine.

ma kewtîne / kewtê

Hûn ketine.

şîma kewtê

Ew ketine.

ê kewtê

Karên têper

Min pirtûk xwendîye.

Mî kitab wenda

Wê xwe amade kirîye.

Aye xo amade kerdê

Me gul çandine.

Ma vîlî kerîtê

Bêrivanê pez dotîye.

Berivane pez dîto.

dîtere = doth

Karên ku reha wan a dema borî bi dengdêrê diqede, paşgira parengê "i/i" nagirin.

Mînak:

Min çar pirtûk kirine. *Mî çar kitabi heşingê*

Te bîrek kolaye. *Te bîrê aşarayo.*

Ew çûye. *O şîro / A şîro.*

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alîkarîya gireya "ne-"yê pêk tê. Gireya "ne-"yê tê pêşîya parenga dema borî ya karê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Bahozî dilan negerandiye. *Bahozî dilan neqerandiye.*

Agirîn rûneniştiye. *Agirîn reronişto.*

Berfinê dar av nedane. *Berfinê darî avê nedaye.*

2.6.3.9.2.1.8. Dema borî ya dûr

Ev dem wan kar û bûyeran radigihîne ku di demeka borî ya dûr da pêk hatine; gava ku du bûyer li pey hev pêk hatibin, ji bo bûyera pêşîn dema borî ya dûr tê bikaranîn. Ev dem zêdetir di risteyên têkel da tê bikaranîn. Bo nimûne: "Dema ku ew ji bajarî derketin, bazar hatibû girtin." Li vir em tê digihîjin ku bazar hatîye girtin, paşê ew ji bajarî derketine.

Dema borî ya dûr bi alîkarîya parenga borî, reha "bûn"ê ya dema borî û gireyên kesî pêk tê.

Form *parenga borî + bûyere + gireyên kesî (2)*

parenga borî + reha "bûn"ê ya dema borî + gireyên kesî (4)

Mînak:

Karên teneper

Berî ku ew were cihê geştê, em çûbûn. *ma şîro*

Heta ku geştyar gihîşt rawestgehê, erebe bi rê ketibû. *bi şîro kitabi*

Dema ku ez gihîştim bin darê, tû tev weşiyabûn. *rişiyaybû.*

Karên têper

Heta ew hat, me sparteka xwe nivîsibû. *nuştû*

Dema ku ji karî vegeyriyan, me salona şahiyê xemilandibû. *xemilandi.*

Min berî wê serdana bajarê Amedê kiribû. *ziyaret kiribû.*

Karên ku reha wan a dema borî bi dengdêrê diqede, paşgira parengê "i/i" nagirin.

Mînak:

Min name nivîsibû. *mî nektibe nuştû.*

Ez çûbûm. *Ez şîro.*

Wê dan hêrabû. *aye dan tektû.*

Neyînî

Neyînîya vê demê bi alîkarîya gireya neyînîyê "ne-" pêk tê, "ne-" tê pêşîya parenga borî. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Dema ku em gihîştin zanîngê, mamosta hîn neçûbû. *neçûbû*

Dema ku bavê min hat, em raneketibûn. *ma ~~ne~~ neraketibû.*

2.6.3.9.2.2. Raweya fermanî

Ev rawe fermana bicihanîna karekî nîşan dide, ev ferman li bihizerî ango kesê duyem tê kirin.

Form

gireya "bi-"yê + reha dema niha + gireyên kesî "-e/-in"

Mînak:

Vê sêvê bixwe.

Van gulan bêhn bikin.

Wan daran av bidin.

Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "bi-"yê radibe.

Mînak:

Yekê ji van hilbijêre.

Li vir rûne.

Neyînî

Bi alikariya gireya "ne-/me-"yê pêk tê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya neyînîyê piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Wan sévan nexê selikê.

Guh mede her kesî.

Hêviyan jê neke.

Vê nivîsê wernegerînin kurdîyê.

Raweya fermanî û bikaranîna bikerê

Herwekî ji mînakan jî diyar e, ^{subje} biker di raweya fermanî da ^{mostly} ^{zafone} bi piranî veşartî ye. Lê carinan jî bo teqezîyê yan jî ji bo ku kes tevlihev nebin, biker tê diyarkirin. → ^{hîn coor}

Mînak:

Te got min an na? Erê, tu biçê bazarê, bila Ehmed alikariya min bike.

Me berî niha çend caran gotiye, hûn vi karî bikin, nedin dest kesekê din.

- Bi xêra xwe wê pencereyê veke.

- Tu nêziktir î, tu veke.

"Ey perestowa Spartayê tu bibe şabida min ko min nemerdî ne kiriye." (Ronahî, c1: 238)

Go: "Ez kû da diçim tu bide dû min." (Ronahî, c1: 363)

- Carinan cihnavên nenasyar jî di raweya fermanî da dibin biker.

Mînak:

Her kes dora xwe paqij bike.

Hemû rabin ser xwe.

Tu kes neçe wir.

- Carinan navên kesan jî di vê raweyê da tèn bikaranîn, ev nav di rewşa bangkirinê da ne û nabin biker, lê biker veşartî dimîne.

Mînak:

Ehmed, (tu) biçê gundi.

(tu) Vê bibe Delal.

Zarokino, (hûn) pirtûka xwe vekin.

- Raweya fermanî carinan ji fermanê derdikeve û dikeve warê hêvî, rica (lava) û şîretê.

Mînak:

Bike zehmet, bixwe nimet.

Bike bi Xwedê ra, berde bi avê ra.

Li min bibore!

- Karên ku reha wan bi dengdêrekê diqedin, gireya “-e”yê nagirin.

Mînak:

Siwareyê biajo. *erebe birame.*

Cilan bidirû. *hincan/kelekan bidere.*

Destên xwe bişo. *Destanê xê bişoye.*

2.6.3.9.2.3. Raweya dananî

Ew rawe ji bo derbirîna karên ne di qada rastîyê da ango sêwirandî tê bikaranîn; di vê raweyê da daxwaz û hêviya karekê ku me di serê xwe da nimandiye, tê vegotin.

Ji hêla watayê ve ev rawe watayên mîna “divêtî, bilanî, mercî, xwastekî, dibetî (ihtîmal) û hwd” bi hin peyvên raweyî dinimîne. Raweyên dananî hem li ser reha dema niha hem jî li ser a dema borî ava dibin. Di vê raweyê da kar li gor çar forman tê kêşan.

Formên kêşana karê di raweya dananî da:

1. Dema niha ya dananî (bixwîne)
2. Borîya sade ya dananî (bixwenda)
3. Borîya dîr a dananî (xwendibûya)
4. Borîya temam a dananî (xwendibe)

2.6.3.9.2.3.1. Dema niha ya dananî

Di vê raweyê da daxwaz, merc, ihtîmal û divêtiya kirina karekî tê vegotin ku derfeta pêkanîna wî karî pêkan e.

Form

“bi-” + reha dema niha + gireyên kesî

Karên teneper

Ez birevim.

ez birevî

Tu birevî.

ti birevî / bireva

Ew bireve.

o bireve /a bireva

Em birevin.

ma birevî / birevîne

Hûn birevin.

şîma birevî

Ew birevin.

e birevî

Karên têper

Ez bibînim.

Ez bibînî

Tu bibînî.

Ti bibînî / bibîna

Ew bibîne.

o bibîna /a bibîna

Em bibînin.

ma bibînî / bibînîne

Hûn bibînin.

şîma bibînî

Ew bibînin.

e bibînî

Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya “bi-”yê dikeve.

Mînak:

Ez vekim.

ez akerî

Tu dakevî.

ti bêrî cêr / bêra cêr

Ew vegere.

o aqerîya / aqerîya / a aqerîya / aqerî

Neyîni

Neyîniya vê demê bi alikariya gireya neyîniyê "ne-" pêk tê. Gireya "ne-"yê cihê gireya "bi-"yê digire. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:	
Divê em li wir nemînin.	borî na we nêmanê
Xwezî ew venegere.	keşta o anêgêro/a nêşê
Dibe ku em wan agahdar nekin.	Derê ke na inê agahdar nêberine/nêberî

2.6.3.9.2.3.2. Borîya sade ya dananî

Ev rawe daxwaza kirina karekê pêknehatî nîşan dide ku derfeta kirina wî karî ne pêkan e.

Form *mênê*
"bi-" + reha dema borî + gireyên kesî + "-a"

Mînak:	
Karên teneper	
Ez bihatima.	ez bihatimê
Tu bihatayî. ^[21]	tu bihatayî / bihatayê
Ew bihata. ^[22]	o bihatayê / a bihatayê
Em bihatina.	na bihatimê

[21] Bi kesê duyem ra gireya "a"yê tê pêşîya gireyên kesî "i/yî".
[22] Ji minakên "ew bihata û wî bigota" diyar dibe ku di vê raweyê da gireya kesê sêyem ê yekhejmar "e/ye" bi kar nayê.

Hûn bihatina.	şîna bihatimê
Ew bihatina.	e bihatimê
Karên teneper	
Min bigota.	mi bihatimê
Te bigota.	tu bihatimê
Wî/wê bigota.	ez hatimê "
Me bigota.	na "
We bigota.	şîna "
Wan bigota.	inê "

Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya dananiyê "bi" dikeve.

Mînak:	
Min vexwara.	mi bihatimê
Ew daketa.	o bihatimê / e bihatimê

Neyîni

Neyîniya vê raweyê bi alikariya gireya neyîniyê "ne-" pêk tê, gireya "ne-"yê cihê "bi-"yê digire. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:	
Tu neketayî.	tu nêketayê
Wî venexwenda.	ez daket nêketayê
Me guhdar nekira.	na goşdar nêketayê

ne-ker-a => nê-kerd-ayê

2.6.3.9.2.3.3. Borîya dûr a dananî

Ev rawe ji wekî raweya dananî ya sade, daxwaz û hêvîya kirina karekê pêknehatî nişan dide ku derfeta kirina wî karî ne pêkan e. Lê dîyar dibe ku sêwirandina karî di demeka borî ya dûr da hatîye nimandin.

Form

parenga dema borî (reha dema borî + gireya parengê "î") + reha dema borî ya "bûn"ê + gireyên kesî + gireya dananîyê "-a"^[23]

Mînak:

Karên têneper

Ez ketibûma.

Tu ketibûyayî.^[24]

Ew ketibûya.^[25]

Em ketibûna.

Hûn ketibûna.

Ew ketibûna.

Karên têper

Min xwendibûya.

Te xwendibûya.

Wi/wê xwendibûya.

Me xwendibûya.

^[23] Di hin devokên kurmançî da forma vê demê kurt bûye, mîna:

xwendibûya → xwendiba, hatibûya → hatiba, bûbûya → bûba û hwd.

^[24] Gireya kesê duyem di vê demê da ji tê pişt "a"yê

^[25] Gireya kesê sêyem di kêşana vê formê da dikeve.

We xwendibûya.

Wan xwendibûya.

Karên ku reha wan a dema borî bi dengdêrê diqede, gireya parengê "î" nagirin.

Mînak:

Ez çûbûma.

Te kolabûya.

Neyînî

Neyînîya vê raweyê bi alikariya gireya neyînîyê "ne-" pêk tê, gireya neyînîyê tê pêşîya reha dem borî ya karê. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-" yê piştî pêşgirê tê.

Mînak:

Ez neketibûma.

Ew raneketibûna.

Em amade nebûbûna.

2.6.3.9.2.3.4. Borîya tamam a dananî

Ev rawe daxwaza karekê temambûyî nişan dide, bi parenga dema borî ya karê, reha dema niha ya "bûn"ê û gireyên kesî pêk tê.

Form

parenga borî (reha dema borî + gireya parengê "î") + reha dema niha ya bûnê "b" + gireyên kesî

Mînak:

Karên têneper

Ez daketibim.

Tu daketibî.

Ew daketibe.

Em daketibin.

Hûn daketibin.

Ew daketibin.

Karên têper

Min gotibe.

Tê gotibe.

Wi/wê gotibe.

Me gotibe.

We gotibe.

Wan gotibe.

Karên ku reha wan a dema borî bi dengdêrê diqede, gireya parengê "î" nagirin.

Mînak:

Mîn dabe.

Tu çûbî.

Neyînî

Neyînîya vê raweyê bi alikariya gireya "ne-"yê pêk tê, "ne-" tê pêşîya parenga dema borî. Eger kar bi pêşgiran hatibin dariştin, gireya "ne-"yê piştî pêşgîrê tê.

Mînak:

Wi nexwaribe.

Wan venexwaribe.

Ew amade nebûbe.

Raweya dananî bi van her çar formên navborî û bi alikariya peyvên raweyî van watayan dide:

- Raweya divêti
- Raweya bilanî
- Raweya xwastekî
- Raweya mercî
- Raweya dibetî

2.6.3.9.2.3.5. Raweya Divêti

Ev rawe pêwîstî û mecbûriya pêkanîna karekî nişan dide. Di kurmanciyê da ev rawe bi alikariya kara "vîyan"ê pêk tê. Kara "vîyan"ê li gor deman tê kêşan; dibe "divê/ divîya" û tê serê risteyê.

Neyînîya vê raweyê bi alikariya gireya "ne"yê pêk tê, kara di forma dananî da tê neyînîkirin.

Raweya divêti di dema niha ya dananî da

Mînak:

Erênî	Neyînî
Divê em biçin.	Divê em neçin.
Divê em dev jê berdin.	Divê em dev jê bernedin.
Divê em vî xaniyî ava bikin.	Divê em vî xaniyî ava nekin.

Raweya divêti di borîya sade ya dananî da

Mînak:

Erênî	Neyînî
Divîya em hemû bihatina.	Divîya em hemû nehatina.
Divîya hûn li wir raketina.	Divîya hûn li wir raneketina.
Divîya we ew agahdar bikira.	Divîya we ew agahdar nekira.

Raweya divêti di borîya dûr a dananî da

Erênî	Neyînî
Divîya min ew parastibûya.	Divîya min ew neparastibûya.
Divîya wê ev bar rakiribûya.	Divîya wê ev bar ranekiribûya.
Divîya we ev kêşe çareser kiribûya.	Divîya we ev kêşe çareser nekiribûya.

Raweya divêti di borîya tamam a dananî da

Erênî	Neyînî
Divê zarok çûbin malê.	Divê zarok neçûbin malê.
Divê ew zû raketibe.	Divê ew zû raneketibe.
Divê ew li wir amade bûbe.	Divê ew li wir amade nebûbe.

Carinan peyva "divê" yê wataya xwastinê jî dide:

Mînak:

Min divê tu bi ser bikevî.

Wî divê em li vir bimînin.

Ev rawe carinan bi alikariya peyvên mîna "pêwîst e/gerek e ..." jî pêk tê.

Mînak:

Pêwîst e em bixwînin.

Gerek e em havînê biçin geştê.

2.6.3.9.2.3.6. Raweya Bilanî

Fermaneka nerasterast e, li kesê sêyem tê kirin, herwiha mirov dikare hêvî û daxwazekê bi vê raweyê nişan bide. Eger mebest hêvî û daxwaz be, mirov dikare vê raweyê bi hemû kesan ra bi kar bîne.

Neyîniya vê raweyê bi alikariya "ne-" yê pêk tê.

Raweya bilanî di dema niha ya dananî da

Erênî	Neyînî
Bila gulan biçîne.	Bila gulan neçîne.
Bila konê xwe vegirin.	Bila konê xwe venegirin.
Bila xwe amade bike.	Bila xwe amade neke.

Raweya bilanî di borîya sade ya dananî da

Erênî	Neyînî
Bila min ew name bixwenda.	Bila min ew name nexwenda.
Bila cil li ser banî raxistina.	Bila cil li ser banî ranexistina.
Bila me li wî guhdar bikira.	Bila me li wî guhdar nekira.

Raweya bilanî di borîya dûr a dananî da

Erênî	Neyînî
Bila zû çûbûya.	Bila zû neçûbûya.
Bila daketibûya.	Bila daneketibûya.
Bila amade kiribûya.	Bila amade nekiribûya.

Raweya bilanî di borîya tamam a dananî da

Erênî	Neyînî
Bila genim <u>dêrabe</u> .	Bila genim nedêrabe.
Bila ji wî cihî derketibe.	Bila ji wî cihî derneketibe.
Bila amade bûbe.	Bila amade nebûbe.

2.6.3.9.2.3.7. Raweya xwastekî

Ev rawe hêvî û daxwaza kirina karekî nişan dide, bi alikariya peyva "xwezî" yê^[26] pêk tê, peyva "xwezî" yê tê serê risteyê û kar li gor forma raweyên danani tê kêşan.

[26] Formên "xwezî" yê yên wekî "xweska, xwezîka, xweziya ..." ji carinan tên bikaranîn.

Neyînîya vê raweyê bi alikariya "ne-" yê pêk tê.

Raweya xwastekî di dema niha ya dananî da

Erênî	Neyînî
Xwezî van daran bibire.	Xwezî van daran nebire.
Xwezî dev ji vî karî berde.	Xwezî dev ji vî karî bernede.
Xwezî ji taxê bar bike.	Xwezî ji taxê bar neke.

Raweya xwastekî di borîya sade ya dananî da

Erênî	Neyînî
Xwezî ew îşev bihatina.	Xwezî ew îşev nehatina.
Xwezî we agir dadaya.	Xwezî we agir danedaya.
Xwezî me ew zû hişyar bikira.	Xwezî me ew zû hişyar nekira.

Raweya xwastekî di borîya dûr a dananî da

Erênî	Neyînî
Xwezî me peyam ji wan ra şandibûya.	Xwezî me peyam ji wan ra neşandibûya.
Xwezî ew raketibûna.	Xwezî ew raneketibûna.
Xwezî we baxçe av dabûya.	Xwezî we baxçe av nedabûya.

Raweya xwastekî di borîya tamam a dananî da

Erênî	Neyînî
Xwezî ew hatibe.	Xwezî ew nehatibe.
Xwezî ew vegeerîyabe malê.	Xwezî ew venegerîyabe malê.
Xwezî ew li civînê amade bûbe.	Xwezî ew li civînê amade nebûbe.

2.6.3.9.2.3.8. Raweya mercî

Ev rawe pêkanîna karekî bi şert û mercan ve girê dide; ango ji bo ku karek biçe serî, berî wê mercek heye ku pêwîst e pêk bê. Ev rawe bi alikariya peyvên "eger, ku"yê pêk tê. Ev peyv tên serê risteyê û kar li gor formên dananî tê kêşan.

Raweya mercî hem li ser formên raweya dananî hem jî li ser formên raweya ragihandinî çêdibe.

a) Raweya mercî bi raweya dananî ra

Raweya mercî di dema niha ya dananî da

Erênî	Neyînî
Eger ez wî bibînim, ez naçim.	Eger ez wî nebînim, ez naçim
Eger tu rakevî, ew ê jî rakeve.	Eger tu ranekevî, ew ê jî ranekeve.
Eger hûn daran av bidin, dê geş bibin.	Eger hûn daran av nedin, dê hişk bibin.

Raweya mercî di borîya sade ya dananî da

Erênî	Neyînî
Eger wan bidîta, dê li bendê nemana.	Eger wan nedîta, dê li bendê bimana.
Eger gul vebûya, wan dê jê bikira.	Eger gul venebûya, wan dê jê nekira.
Eger xanî ava bikira, dê bihata.	Eger xanî ava nekira, dê bihata.

Raweya mercî di borîya dûr a dananî da

Erênî	Neyînî
Eger xwendibûna, dê bi ser ketibûna.	Eger nexwendibûna, bi ser nediketin.
Eger ew rûniştibûya, em ê jî mabûna.	Eger ew rûneniştibûya, em jî nediman.
Eger amade kiribûya, me dê bianîya.	Eger amade nekiribûya, me dê neanîya.

Raweya mercî di borîya tamam a dananî da

Erênî	Neyînî
Eger baran barîbe, berhem dê baş bin.	Eger baran nebarîbe, berhem dê ne baş bin.
Eger daketibin, em dê dereng nemînin.	Eger daneketibin, em dê dereng bimînin.
Eger dest pê kiribe, dê bigihîje encamê	Eger dest pê nekiribe, nagihîje encamê

dest pê bikin

b) Raweya mercî bi raweya ragihandinî ra

Raweya mercî di dema niha da

Erênî	Neyînî
Eger ew dixwînin, bila biminin.	Eger ew naxwînin, bila bèn.
Eger tu werdigerînî, dê zû biqede.	Eger tu wernagerînî, zû naqede.
Eger zû amade dibin, wan bine.	Eger zû amade nabin, wan neyîne.

Raweya mercî di dema dahatî da

Erênî	Neyînî
Eger em ê bixwînin, dê bèn bi me ra bixwînin.	Eger em ê nexwînin, ew dê li malê bixwînin.
Eger ew ê agirî dade, bila biçê dade.	Eger ew ê agirî danede, bila neçe.
Eger hûn ê ava bikin, ji me ra bibêjin.	Eger hûn ê ava nekin, ji me ra bibêjin.

Raweya mercî di dema borî ya sade da

Erênî	Neyînî
Eger min ew dît, ez ê wî bînim malê.	Eger min ew nedît, ez nikarim bêm.
Eger we vexwend, dê bê.	Eger we venexwend, dê neyê.
Eger wî dest pê kir, em ê jî dest pê bikin.	Eger wî dest pê nekir, em ê dest pê bikin.

Raweya mercî di dema borî ya berdewam da

Erênî	Neyînî
Eger ew dihat, bila bi xwe ra bianîya.	Eger ew nedihat, bila bigota.
Eger vedigot, bila baş vegota.	Eger venedigot, bila behsê nekira.
Eger dar av didan, çima hişk bûne.	Eger dar av nedidan, çima hişk nebûne.

Raweya mercî di dema borî ya temam da

Erênî	Neyînî
Eger wê dîtîye, bila ji me ra behsê bike.	Eger wê nedîtîye, dê çawa ji me ra behsê bike.
Eger ew xanî hilweşiyaye, dê çawa tê da bijîn.	Eger ew xanî hilneweşiyaye, dê tê da bijîn.
Eger we ava kirîye, nişanî me bidin.	Eger we ava nekirîye, nişanî me nedin.

Raweya mercî di dema borî ya dûr da

Erênî	Neyînî
Eger xwendibû, çima bi ser neket.	Eger nexwendibû, çima bi ser ket.
Eger raketibû, çawa deng kir.	Eger raneketibû, çawa deng nekir.
Eger xwe amade kiribû, bila bihata.	Eger xwe amade nekiribû, bila nehata.

2.6.3.9.2.3.9. Raweya dibetî

Ev rawe dibetîya (ihtîmal) kirina karekî nîşan dide. Bi peyvên “dibe ku/ belkî/ reng e, heye ku”yê pêk tê. Ev peyv tîr serê risteyê û kar li gor formên raweya dananî tê kêşan.

Neyîniya vê raweyê bi alîkarîya “ne-”yê pêk tê.

Raweya dibetî di dema niha ya dananî da

Erênî	Neyîni
Dibe ku em wê bişînin bajarî.	Dibe ku em wê neşînin bajarî.
Dibe ku ew wê agahîyê zû ragihînin.	Dibe ku ew wê agahîyê zû ranegihînin.
Dibe ku pileya germahîyê îsal bilind bibe.	Dibe ku pileya germahîyê îsal bilind nebe.

Raweya dibetî di borîya sade ya dananî da

Erênî	Neyîni
Dibe ku wî bîr bikolaya.	Dibe ku wî bîr nekolaya.
Dibe ku ew ji dibistanê derketa.	Dibe ku ew ji dibistanê derneketa.
Dibe ku wan xanî xirab bikira.	Dibe ku wan xanî xirab nekira.

Raweya dibetî di borîya dûr a dananî da

Erênî	Neyîni
Dibe ku nêrîna xwe guhartibûya.	Dibe ku nêrîna xwe neguhartibûya.

Dibe ku ronîyê vedabûya.

Dibe ku ronîyê venedabûya.

Dibe ku kom bûbûna.

Dibe ku kom nebûbûna.

Raweya dibetî di borîya temam a dananî da

Erênî	Neyîni
Dibe ku ew îşev li wir mabin.	Dibe ku ew îşev li wir nemabin.
Dibe ku wê hûn vexwendibin.	Dibe ku wê hûn venexwendibin.
Dibe ku bi vê şahîyê kêfxweş bûbin.	Dibe ku bi vê şahîyê kêfxweş nebûbin.

Nîşe: Ji bilî raweyên “divêtî, bilanî, xwastekî, mercî û dibetî”yê raweya dananî bi karên raweyî “xwastin, zanîn, karîn (şîyan) û wêrîn” jî çêdibe, ev mijar di beşa karên alîkar da hatiye dayîn.

2.6.3.9.3. Xuyang

Kategorîyeka tîkildarî karan e, bala xwe dide aliyê hundirîn (navekî) ê rewş û rûdanan, ka bûyer temam bûye yan jî temam nebûye.

Herçiqas xuyang di nav deman da tê dayîn, lê xuyang û dem ji hev cuda ne; dem, dema rûdana karî nîşan dide, xuyang bala xwe dide aliyê hundirîn ê wê rûdanê ka temam bûye yan na. Bo nimûne, dema borî ya temam an jî dema borî ya berdewam, ev her du jî dema borî ne, lê xuyang aliyê wê demê yê temambûn û netemambûnê cuda dike. Xuyang wekî xuyanga temam û netemam tê dabeşandin.

Xuyanga temam

Bala xwe dide bûyerê bi giştî, ango bûyereka temambûyî nîşan dide.

Mînak:

Wî xwendîye.

Wî xwendibû.

Xuyanga netemam

Parçeyekê bûyerê nîşan dide. Ev xuyang wekî xuyanga adetî, berdewamî û dubareyî tê dabêşkirin.

Xuyanga adetî:

Wan bûyeran nîşan dide ku di demên cuda da hertim tên kirin.

Mînak:

Ew cotkarîyê dike.

Ew hertim zû radibe.

Wê her car ji me ra çîrok digotin.

Xuyanga berdewam

Bûyerekê nîşan dide ku di demeka diyar da pêvajoyeka berdewam dihewîne.

Mînak:

Ew dimeşe.

Ew niha bi gogê dilîze.

Dema ez diçûm malê, baran dibarî.

Xuyanga dubareyî

Bûyerekê nîşan dide ku çend caran tê kirin.

Mînak:

Ew duh gelek caran dikuxî.

Ew sê-çar caran digihîşt nivê rê û diket.

Tan diyar dike ku di kurmanciyê da xuyanga dubareyî bi pêşgira “ve-” û paşgira “-eve”yê çêdibe. “*Hogir firaqan dişo û vedişo an ji dişoteve.*” (Tan, 2020: 4)

Herwekî ji nimûneyan diyar dibe, morfema “di-”yê bi xuyanga adetî, berdewam û dubareyî ra ji derdibire.

Xuyanga ferhengî ji heye ku pêwîst e mirov balê bikişîne ser. Xuyanga ferhengî bala xwe dide polinkirin û senifandina karan; bêhtir bala xwe dide karan ka di demên berdewam da tên bikaranîn an na. Bo nimûne karên rewşê di demên berdewam da nayên bikaranîn, lê ev yek di zimanan da hinekî ji hev cuda ye. (Altinkiliç, 2020, Folklor û Ziman: 140-148)

2.6.3.9.4. Avani

Kategoriya rêzimanî ye ku bala xwe dide avaniya risteyê û tekiliya bikerê ya bi karê ra diyar dike; nîşan dide ka biker li pêş e yan cihê xwe daye berkarê, herwiha zelal dike ka bikerê bi xwe kar kiriye yan ji bi hinan daye kirin.

Di kurmanciyê da sê avani hene: aktif, pasif û hokarî

2.6.3.9.4.1. Avaniya aktîf (lebatî)

Di avaniya aktîf da bikera karê dîyar e.

Mînak:

Serdarî zevî av dane.

Ehmed vê avahîyê çêdike.

Zelalê çêlek dotiye.

Wan xwendina xwe qedandiye.

2.6.3.9.4.2. Avaniya pasîf (tebatî)

Di avaniya pasîf da dîyar dibe ka çawa cihê biker û berkarê tê guhartin. Bi vê yekê êdî berkar cihê bikerê digire û dibe bikera risteyê.

Eger carinan bikera (kara) risteya aktîf di risteya pasîf da derkeve jî bi awayekê nerasterast ango bi alîkarîya daçekan derdikeve holê. Ji hêla watayê ve her dimîne "kara", lê belê ji hêla ristesazîyê ve, dibe berkara nerasterast ango temamker.

- Ev avanî, bi alîkarîya kara "hatin"ê çêdibe. Kara "hatin"ê li gor dem û kesên tê kêşan û kara bingehîn wekî xwe dimîne, eger kara bingehîn lêkdayî be, pêwîst e di avaniya pasîf da bi hev ve were nivîsîn. Di neyînîyê da jî kara "hatin"ê tê neyînîkirin.

a) Raweya ragihandini

Biker	Kêşana kara alîkar		Kara bingehîn
	Erênî	Neyînî	
dar	tê	nayê	avdan
xanî	dê bê	dê neyê	avakirin
pirtûk	hat	nehat	xwendin
gund	hatiye	nehatiye	avakirin
peyam	dihat	nedihat	nivîsîn
mal	hatibû	nehatibû	paqjîkirin

b) Raweyên dananî

Peyvên raweyî	Biker	Kêşana kara alîkar		Kara bingehîn
		Erênî	Neyînî	
xwezî	mal	bê	neyê	avakirin
dibe ku	gerdenî	hatibe	nehatibe	windakirin
divê	kar	bihata	nehata	qedandin
bila	derdor	hatibûya	nehatibûya	xemilandin
Eger	erd	hatibe	nehatibe	cotkirin

Nîşe: Dema ku em risteyekê ji avaniya aktîf veguhêzin avaniya pasîf û di risteyê da cihnav "xwe"yê hebe, ev cihnav tê guhartin û li şûnê peyva ku vê cihnavê cihê wê girtiye, tê nivîsîn.

Mînak:

Wan mala xwe firot. → Mala wan (ji hêla wan ve) hat firotin.

Wan xwe birîndar kir. → Ew (ji hêla xwe ve) hatin birîndarkirin.

Kengê avaniya pasîf tê bikaranîn?

- Bi awayekê asayî, avaniya aktif ji ya pasîf bêhtir tê bikaranîn, lê gava biker ne diyar be, bêhtir avaniya pasîf tê bikaranîn.

Mînak:

Gerdenî hatiye dizîn.
(Em nizanin kê dizîye.)

Gund ji demeka kevn ve hatiye avakirin.
(Em nizanin kê ava kirîye.)

- Gava ku berkar ji bikerê giringtir be û yek bixwaze balê bikêşe ser, wê hingê avaniya pasîf tê bikaranîn.

Mînak:

Kovara Hawarê di sala 1932yan da hatiye weşandin.

Mem û Zîn ji hêla Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn.

- Hin caran gava ku ji mebestê bê zanîn ka biker kî ye, avaniya pasîf tê bikaranîn.

Mînak:

Roja 8ê Adarê bi çoş tê pîrozkirin.
(Tê zanîn ku ji hêla jinan ve tê pîrozkirin.)

Zarok bi ked û westanê tîn xwedîkirin.
(Tê zanîn ku ji hêla malbatê ve tîn xwedîkirin.)

2.6.3.9.4.3. Avaniya hokarî

danşêre

Di vê avaniyê da biker karê xwe bi kesekî/tiştêkî dide kirin. Herçiqas ji aliyê watayê ve ew kes û tiştên ku kar bi wan tê kirin "kara" ne ango ew bi xwe bi karî rabûne ji ji aliyê ristesaziyê ve ew dibin "têrker" û kesê ku ew dane xebitandin dibe biker. *serûnê*

Avaniya hokarî bi alikariya kara alikar "dan" pêk tê. Kara "dan"ê li gor kes û deman tê kêşan û kara bingehîn wekî xwe dimine, eger kara bingehîn lêkdayî be, bi hev ve tê nivîsîn.

Di neyînîyê da ji kara "dan"ê tê neyînîkirin.

a) Raweya ragihandinî

Dem	Erênî	Neyînî
Dema niha	Mamosta waneyê bi xwendekaran dide şirovekirin.	Mamosta waneyê bi xwendekaran nade şirovekirin.
Dema dahatî	Em dê cilan bi wan bidin şûştin.	Em dê cilan bi wan nedin şûştin.
Dema borî ya sade	Me erebe bi wî da çêkirin.	Me erebe bi wî neda çêkirin.
Dema borî ya berdewam	Wê pez bi bêrivanan dida dotin.	Wê pez bi bêrivanan nedida dotin.
Dema borî ya temam	Wî zarokên xwe dane xwendin.	Wî zarokên xwe nedane xwendin.
Dema borî ya dûr	Wî karê xwe bi wan dabû kirin.	Wî karê xwe bi wan nedabû kirin.

karîger

b) Raweya dananî

Rawe	Erênî	Neyînî
Divêtî	Divê tu zevîyê bi wan bidî cotkirin.	Divê tu zevîyê bi wan nedî cotkirin.
Bilanî	Bila daran bi wî bide çandin.	Bila daran bi wî nede çandin.
Mercî	Eger tu karî bi wan bidî kirin, dê baş be.	Eger tu karî bi wan nedî kirin, dê baş be.
Xwastekî	Xwezî tu derdorê bi karkeran bidî paqijkirin.	Xwezî tu derdorê bi karkeran nedî paqijkirin.
Dibetî	Dibe ku mamostayî mijar bi xwendekaran dabin nivîsîn.	Dibe ku mamostayî mijar bi xwendekaran nedabin nivîsîn.

Herçiqas kara "dan"ê ya herî karîger e ku avanîya hokarî pê tê çêkirin, lê ev avanî bi karên "kirin û hiştin/hêlan"ê jî tê çêkirin.

Mînak:

Mîn kir ku ev xwendekar dora daran bixepêrin.

Mîn kir ku ew li vir bimînin.

Wan hişt ku em biçin.

Wî hişt ku karker doza mafê xwe bikin.

2.6.4. Hevalnav

Cureyekê bêjeyan ê têkildarî navdêran e; hevalnav navdêran jî aliyê reng, rewş, teşe, nîşan û hejmarê ve rave dikin û taybetmendiyên wan didin nasîn.

2.6.4.1. Cureyên hevalnavan

Hin hevalnav di binyada xwe da hevalnav in û navdêran jî aliyê çawanîyê ve rave dikin; hin hevalnav jî di binyada xwe da ne hevalnav in lê diyarker in, dema ku tên ber navdêran wan jî hêla çendani û hejmarê ve rave dikin.

2.6.4.1.1. Hevalnavên çawanîyê

Hevalnavên çawanîyê di koka xwe da hevalnav in, çawanîya navdêran jî hêla reng, rewş, dirûv û jêçêbûnê ve nîşan didin, bi tenê dema ku di rewşa piledariyê da tên kêşan, gireyan digirin.

Hin hevalnavên çawanîyê: reş, zer, sor, xweş, xweşik, baş, qenc, delal, jêhatî, jîr, bilind, gir, gilover, zîvîn, darîn ...

Mînak:

Rewş	xwişkî mezin, hevala delal, hespê qenc
Reng	gula sor, dara kesk, hibriya şîn
Dirûv	maseya gilover, perwaza çargoşe
Jêçêbûn	zincîra zîvîn, deriyê textîn

Ev hevalnav bi du awayan bi navdêran ra tên girêdan; bi alikariya "gireyên îzafê"yê û bi alikariya kara "bûn"ê.

a) Bi alikariya gireyên izafeyê

Mînak:

Ji hesinê xirab şûrê baş çênabe.

Hevalên baş di rojên teng da xuya dibin.

Ji çavên ziwa hêsir nabarin.

b) bi alikariya kara bûnê

Zimanê arî kevnar e.

Ew xort delal e.

Ev gul sor bû.

Berawirda hevalnavên çawanîyê

Ew taybetî ye ku du alîyan berawird dike. Berawirda hevalnavan asta navdêr û rewşa wan a li hember navdêrên din nîşan dide.

Pileya berawirdî: Ev pile du alîyan berawird dike; zêdebûn û kêmbûn an jî wekhevîya du alîyan a li beranber hev rave dike. Kêmbûn û zêdebûn bi alikariya gireya “-tir”ê pêk tê, wekhevî bi alikariya peyvên “wekî, mîna, bi qasî ...” pêk tê.

Mînak:

Zêdebûn û kêmbûn

Şam şeker e welat jê şîrîntir e.

Bager ji Ciwanî jîrtir e.

Hêlîn ji Darînê kintir e.

Wekhevî

Rojda wekî Nûdayê jîr e.

Nûkar û Rojhat mîna hev dirêj in.

Xemlîn û Rojda bi qasî hev qelew in.

Carinan asta berawirda hevalnavan bi alikariya hevalkarên radeyî pêk tê.

Mînak:

Ew mase piçekî jî vê mezintir e.

Ew gund gelekî kevtir e.

Ew dar hinekî bilindtir e.

Pileya bala

Ev pile berawirdê digihîne asta herî bilind, bi alikariya gireya “-tirîn”ê û hevalkara “herî/tewrî”yê pêk tê. Hevalkarên “herî û tewrî”yê bi heman watayê tî.

Mînak:

Xweştirîn hest, hestê serkeftinê ye.

Hestê herî/tewrî xweş ê serkeftinê ye.

Pirtûk baştirîn heval e.

Hevalê herî/tewrî baş pirtûk e.

Mezintirîn ode, odeya mêvanan e.

Odeya herî/tewrî mezin a mêvanan e.

2.6.4.1.2. Hevalnavên nişander (diyarokerên nişander)

Ev hevalnav bi xwe cihnavên nişander in, lê dema ku tên pêşîya navdêran û wan nişanî mirovî didin, dibin hevalnavên nişander. Hevalnavên nişander ên xwerû "ev" û "ew" in û hevalnavên nişander ên tewandî "vî, vê, van, wî, wê, wan" in.

a) Hevalnavên nişander ên xwerû

Hevalnavên nişander ên xwerû tên pêşîya navdêrên xwerû û li gor nêzbûn û dûrbûnê, wan nişan didin. Ji hêla zayend û hejmarê ve nêtar in. Ji bo navdêrên nêzik "ev" û ji bo ên dûr "ew" bi kar tê.

Mînak:

Mîn ev pirs bersivand.

Xwendekaran bi hev ra ew pirtûk xwend.

b) Hevalnavên nişander ên tewandî

Hevalnavên nişander ên tewandî tên pêşîya navdêrên tewandî. Ji hêla zayend û hejmarê ve diyar in.

Zayend û hejmar	Nêz	Dûr
Nêr û yekhejmar	vî	wî
Mê û yekhejmar	vê	wê
Nêtar û pirhejmar	van	wan

Mînak:

Vî mamostayî, ez fêrî zimanî kirim.

Vê hevalê gelek pirtûkên bisûd bi xwe ra anîn.

Van şervanan ev xak parast.

Wî camêrî ez ji belayekê rizgar kirim.

Wê mamostayê bi dilsozî kar kir.

Wan şanogeran şanoyek pêşkêş kir.

Peyvên wekî "wiha, wisa, wilo..." jî dema ku tên ber navdêran, tişteke behskirî nişan didin, ji ber vê yekê dibin hevalnavên nişander.

Mînak:

Te mijareka wiha rave kirîye?

Mirovên wisa tu carî bi ser nakevin.

Bivirekê wilo bikire.

2.6.4.1.3. Hevalnavên nenasyar (diyarokerên nenasyar)

Hevalnavên nenasyar di koka xwe da cihnavên nenasyar in, dema ku tên ber navdêran dibin hevalnavên nenasyar.

Mînak:

Hemû xwendekar dilxwazên serkeftinê ne.

Tu mirov nikare vî karî bike.

Gelek xaniyên nû li Amûdê hatine lêkirin.

Her xwendekarek waneyekê amade dike.

Hin hevalên baş ji xwe ra bike nimûne.

2.6.4.1.4. Hevalnavên hejmarîn (dîyarkerên hejmarîn)

Ew hejmarnav in ku tên ber navdêran û wan ji aliyê hejmar û rêzê ve didin nasîn. Hevalnavên hejmarîn li gor taybetmendiyên hejmarnavan dibin sê beş:

a) Hevalnavên hejmarîn ên resen

Hejmarên resen in, tên pêşîya navdêran û wan ji aliyê hejmarê ve dîyar dikin. Ji aliyê zayendê ve nêtar in. Gava ku di rewşa tewandî da bin, navdêra piştî wan ditewe.

Mînak:

Sê pirtûkên wî hene.

Du darên behîvan çandine.

Heft mamosta beşdarî panelê bûn.

Çar hevalan got.

Sed jinî civîn li dar xist.

Çardeh xwendekaran bawernameyên xwe wergirtin.

b) Hevalnavên hejmarîn ên rêzîn

Piştî navdêran tên û rêza wan dîyar dikin. Di kurmanciyê da hevalnavên rêzîn bi alîkarîya gireyên tewangê û “-em û -emîn”ê çêdibin, lê ji bo nivîsînê, gireya “em”ê hatiye hîlbijartin.

Mînak:

Di meha sêyem da şev û roj dibin mîna hev.

Di roja bîstem da gelek xebatên giranbiha hatin kirin.

Pirtûka wî ya yekem deng daye.

c) Hevalnavên hejmarîn ên dabeşî

Ev hevalnav tên pêşîya navdêran û beşeka tişteki dîyar dikin.

Mînak:

Min ji sêyan, duyê pirtûkê xwend.

Du kilo û niv birinc ji bo malê bine.

Niv nanî bixwe.

2.6.4.1.5. Hevalnavên pirsyarî (dîyarkerên pirsyarî)

Hevalnavên pirsyarî dikevin pêşîya navdêran û pirsra rewş, teşe û hejmara wan dikin, hevalnavên pirsyarî pirsra hevalnavên din dikin. Hevalnavên pirsyarî tu gireyan nagirin û gava ku di rewşa tewandî da bîn, navdêra piştî wan ditewe.

Hevalnavên pirsyarî: çawa, kîjan, çi, çend, çiças

Çawa: Pirsra hevalnavên çawanîyê dike.

Mînak:

Darên zeytûnan çawa ne? Darên zeytûnan bisûd in.

Rengê pênûsê çawa ye? Rengê pênûsê şin e.

Kîjan: Pirsra hevalnavên nişander dike.

Mînak:

Kîjan kevok bedew e? Ey kevok.

Kîjan xwendekarî teza xwe pêşkêş kir? Wî xwendekarî.

Çi: Ev jî pirsar hevalnavên nişander dike.

Mînak:

Tu çî tiştî dixwazî? Vî tiştî.

Çî mijar bala te dikişîne? Ev mijar.

Çend: Pirsar hevalnavên hejmarî dike.

Mînak:

Çend xwendekaran bawernameyên xwe wergirtin?

Çar xwendekaran bawernameyên xwe wergirtin.

Çend listikvan amade ne?

Heft listikvan amade ne.

Çiqas: Pirsar hevalnavên nenasyar dike.

Mînak:

Çiqas karên binirx hatin kirin?

Gelek karên binirx hatin kirin.

Çiqas aramî heye?

Piçek aramî heye.

2.6.4.2. Fraz û hevokên hevalnavî

Carinan frazek an jî hevokê hevalnavî navdêran dike û bi erka hevalnavê radibe.

Mînak:

Fraz

Xwendekara geleki jîr xelat wergirt.

Xaniyê li pêşîya gundî hatiye firotin.

Hevok

Kesê ku duh li vir bû, hevalê min ê dibistana seretayî bû.

Mala ku em lê bûne mêvan, mala xalê Kadari bû.

2.6.4.3. Bêjesaziya hevalnavan

a) Hevalnavên sade

Ev hevalnav jî rehekê pêk tên.

Mînak:

sor, reş, hêja, berz, qenc, baş, bedew, kesk, dirêj ...

b) Hevalnavên dariştî

Ev hevalnav jî rehekê û gireyên dariştinî pêk tên.

Mînak:

nexweş, bêbext, kelevajî, serdest, bîaqil, gundî, zîvîn, wêrek, kinik, tengazar, revok, hunermend, avî, navdar, beza ...

c) Hevalnavên lêkdayî

Ji du rehan an jî zêdetir pêk tên. Dibe ku hevalnavên lêkdayî gireyan jî bigirin.

Mînak:

destsivik, çavreş, porspî, çargoşe, çavxezal, nivgilover, kêmxwê, reşbelek, çavlirê, devliken, jidil, zikmakî, gulgulî, rasterast, xwaromaro ...

Nîşe: Hevalnav bi guhastinê hem wekî navdêran hem jî wekî hevalkaran tev digerin.

Mînak:

Wekî navdêran

Biçûkê malê hat.

Bedewa taxa jêrîn e.

Guh bide gotinên mezinan.

Wekî hevalkaran

Ev xwendekar baş dixwîne.

Zarok xweşik dilîzin.

Baz bilind difire.

Carinan li gor bikaranînê cureyên hevalnavan tên guhartin.

Mînak:

We çend xezal girtin? (hevalnava pirsyarî)

Me çend xezal girtin û em hatin. (hevalnava nenasyar)

2.6.4.4. Peywira hevalnavan a rêzimanî

Hevalnav di risteyê da dibe tamamkera bikerê, di frazê da dibe raveker.

Mînak:

Di risteyê da

Sorgul serkeftî ye.

Jineka jîr e.

Ciwanekê jêhatî ye.

Dilber mezin bû.

Zarok zana dibin.

Di frazê da

Cotkarê şareza

Ameda kevnar

Çar zarok

Vi hevalî

Kîjan mamostayê

2.6.5. Hevalkar

Cureyekê bêjeyan e ku kar, hevalnav û hevalkaran rave dike, herwiha hin hevalkar hevokekê rave dikin.

Ravekirina karan

Ew piçekî dixwîne.

Xelat gelekî diaxive.

Ravekirina hevalnavan

Rojên pir xweş li pêş me ne.

Hewa gelekî germ e.

Ravekirina hevalkaran

Ew gelekî baş dixebite.

Ew piçekî bi lez dimeşe.

Ravekirina hevokan

Xweşbextane, vê carê hûn neketin xefika wan.

Bi rastî, dema ku ev mizgînî giha min, ez pir kêfxweş bûm.

2.6.5.1. Cureyên hevalkaran

Kategorîkirina hevalkaran ji aliyê watayê ve hinekî zehmet e, ji ber ku gelek hevalkar hene watayên cuda cuda didin, ji bilî vê jî gelek navdêr û hevalnav jî bi erka hevalkaran radibin, heta hinek hevok jî wekî hevalkaran tev digerin û watayên cuda li risteyê zêde dikin.

2.6.5.1.1. Hevalkarên çawanîyê (rewş)

Ev hevalkar rewş û çawanîya karê ku tê kirin, nişan didin.

Hin hevalkarên çawanîyê: zû, dereng, hêdî, bi lez, yekser, rasterast, cuda cuda, yeko yeko, sê bi sê, kolan bi kolan, bi dilsarî, bi xemsarî, bi çavan, wekî guran, wekî şêran ...

Mînak:

Hûn zû fêr dibin.

Em dereng dinivisin.

Hin mirov ji dil û can kar dikin; hinek ji bi xemsarî kar dikin.

Armanca xwe rasterast ji me ra bibêje.

Dergehî hêdîka veke.

Zarok yeko yeko derbasî gulistanê dibûn.

Zembîlfiroş kolan bi kolan digeriya.

Karker bi dilsarî çûn karê xwe.

Nîşe: Hevalkarên "zû, dereng"ê ne tenê çawanîyê, lê carinan demê jî diyar dikin.

Mînak:

Ew dereng hat malê.

Ew zû çû karê xwe.

2.6.5.1.2. Hevalkarên demê

Ev hevalkar dema karê ku tê kirin, diyar dikin.

Hinek hevalkarên demê: duh, pêr, niha, îro, îsal, îşev, sibe, par, piştî nivro, êvarkî, berêvarkî ...

Mînak:

Zivistanê cilika feqîran diqete.

Îro gelek xebat ji me tê xwastin.

Di demsala payîzê da koça dawîn kir.

Berêvarkî em ê li nav taxê bigerin.

Me par nîsk çandibûn, lê em ê îsal nokan biçînin.

Ew piştî nivro vedigere.

2.6.5.1.3. Hevalkarên cihî

Ev hevalkar cih û aliyê karî, nişan didin.

Hin hevalkarên cihî: derve, xwar, hundir, bi şûn ve, bi wir da, ji dûr ve, li jêr, li jor, başûr, bakur, rojhilat, rojava ... herwiha hemû navên cihan li gel daçekan dikarin bibin hevalkar.

Mînak:

Ew li ser banî radikevin.

Gelek mirov ji dûr ve xuya dibin.

Pir teyr û tilûr li rojavayê wî welatî hene.

Ew derket derve.

Em bi hev ra diçûn dibistanê.

Ew li vir naxebitin.

Me gelek caran serdana wir kirîye.

2.6.5.1.4. Hevalkarên radeyî

Ev hevalkar rêje û radeya karî, nişan didin. Bi pîrsa "çiqas"ê bi dest dikevin. Herçî hevalkarên radeyî ne, pîvana wan ne ji sedî sed e. Ev hevalkar ne tenê karan, lê belê hevalnav û hevalkarên din jî rave dikin.

Hin hevalkarên radeyî: kêr, zêde, pîr, pîr kêr, gelekî kêr, ecêb, zêde zêde, ta radeyekê, zehf, bêhtir, zêdetir, gelekî, piçekî ...

Mînak:

Piçekî biaxive, gelekî guhdar bike.

Zelal ji Delalê bêhtir dixebite.

Zêde nede ber dasê, dê bimîne asê.

Dayik bi zarokên xwe ra pîr diwestin.

Ehmed pîr kêr dixwe.

Kes ji wan zêdetir nexebitiye.

2.6.5.1.5. Hevalkarên dubarekirinê

Ev hevalkar karên dubare diyar dikin.

Hin hevalkarên dubarekirinê: hertim, pîr caran, carinan, kêr caran, qet, dubare, dîsa, her saet, her hefte ...

Mînak:

Ew hertim hazir dibe.

Em pîr caran wî di rê da dibînin.

Carinan li gundî dimîne.

Ew qet nayê bajarî.

Mijarê dubare bixwîne.
Disa agahiyê bigihîne wî.
Her saet kesek diçe.

2.6.5.1.6. Hevalkarên sedemîn

Ev hevalkar mebest û sedema karekî nîşan dikin.

Mînak:
Ji tirsê te li vir nema. *Ji*
Ji bêaviyê baxçe hişk bûn. *Jibe*
Ji ber sermayê dilerizî.
Ji nezaniyê bi şûn da man.
Ji aciziyê destê wî li karî nedigeriya.

2.6.5.1.7. Hevalkarên cextdar *Cext*

Ev hevalkar teqezîya karekî diyar dikin.

Mînak:
Helbet, a ku zanîne dixemilîne sinc e.
Bê guman, hûn ê armanca xwe pêk binin.
Jixwe, em bi vî tiştî dizanin.
Xwedê hez bike, em ê vî karî bi serfrazî bibin serî.
Bila karê xwe bi zanebûn bikin.
Ji sedî sed, mijar dê bi vî awayî were çareserkirin.

Zanayî ji alikariya wan kir.
Pêwîst e her kes amade be, bi taybetî gundiyan wî.
Bi giştî, encama karê we baş bû.
Me qet dev ji we bernedaye.
Heta wan ji xwe ji piştê me da ali.

2.6.5.1.8. Hevalkarên guman û pêşbiniyê

Ev hevalkar rewşa karekê neteqez diyar dikin.

Mînak:
Belkî sala bê ji vir bar bike.
Xwezî daxwaza xwe bi cih binin.
Dibe ku her tişt wekî wan derkeve.
Ne ji sedî sed e ku ew ê careka din vegerin vir.

2.6.5.1.9. Hevalkarên nirxandinê

Axiver bi rêya van hevalkaran bûyereke dinirxîne. Ev hevalkar bêhtir girêdayî hevokê bi giştî ne.

Mînak:
Mixabin, kes bi me ve nehat.
Xweşbextane, hûn yekser bi wan ve gihîştin.
Mala Xwedê ava be, vê carê ji em zû ji vê belayê rizgar bûn.
Bi dîtina min, eger em zû biçin, baştir e.
Li gor wan, ev mijar ne zêde tevlihev e.

2.6.5.1.10. Hevalkarên neyîniyê

Ev hevalkar neyîniya karekî radigihînin.

Mînak:

Na, em bi wî ra kar nakin.

Nexêr, ew bi me ra nehatiye.

Em qet ji mafê xwe nayên xwarê.

Tu carî yeka we nabe du.

Zelalê hiç li stranên vî hunermendî guhdar nekiriye.

Em bi tu awayî vê yekê napejirînin.

Kes hew ji wan bawer dike.

2.6.5.1.11. Hevalkarên nişander

Hevalkarên nişander: wiha/wisa/wilo ...

Ev hevalkar çawanîya karî nişan didin, lê ji ber ku vê çawanîyê bi nişanê didin der, di nav hevalkarên nişander da cih digirin.

Mînak:

Kê wiha kirîye?

Kê wisa kirîye?

Wiha naçe serî.

Pêwîst e em wisa bi wan ra tev bigerin.

Wilo bi wan ra nameşe.

Va/wa: Ev hevalkar dûrbûn û nêzîkbûna karî nişan didin, "va" nêzîkbûnê û "wa" jî dûrbûnê nişan dide.^[27]

Mînak:

Va ji malê ve tê.

Va em ji civînê derketin.

Wa her kes bi derekê da çû.

Wa wî karê xwe qedand.

2.6.5.1.12. Hevalkarên pirsyarî

Ev hevalkar pirsra hevalkarên din dikin.

Hin hevalkarên pirsyarî: çawa, çima, gelo, ma, qey, kengê, heta kengê, ji kengê ve, ji ku, li ku, di ku ra, çiqas, wekî kê, wekî çi ...

Çawa: Pirsra hevalkarên çawanîyê dike.

Mînak:

Çawa diaxive?

Bi lez diaxive.

Çawa/wekî çi^[28] xwe parast?

Wekî şêran xwe parast.

Çawa/wekî kê tev digere?

Wekî dayika xwe tev digere.

[27] Li şûna "va û wa"yê carinan "ha va, ha wa" û "va ye, wa ye" jî tên bikaranin. Bo nimûne: Ha va ji malê ve tê. Va ye ji malê ve tê. Ha wa her kes bi derekê da çû. Wa ye her kes bi derekê da çû.

[28] Hevalkarên çawanîyê yên ku bi daçekên "mina, wekî, nola ..." çêdibin, hem bi pirsra "çawa"yê hem jî bi pirsra "wekî çi/mina çi/nola çi ..." tên bidestxistin. Eger mebest kes be, dikarin bi pirsra "wekî kê"yê jî bînin bidestxistin.

Kengê, heta kengê, ji kengê ve ...

Pirsa hevalkarên demê dikin.

Mînak:

Ji kengê ve hûn li vê mijarê dixebitin?

Em ji par ve li vê mijarê dixebitin.

Ew kengê diçin gerê?

Ew dawîya heftayê diçin gerê.

Ji ku, li ku, di ku ra ...

Pirsa hevalkarên cihê dikin.

Mînak:

Xemgîn ji ku ve tê?

Ji dibistanê ve tê.

Nûdem li ku dixwîne?

Nûdem li Amedê dixwîne.

Çiqas: Pirsa hevalkarên radeyê dike.

Mînak:

Çiqas dipeyive? Pir dipeyive.

Çiqas nexweş e? Gelekî nexweş e.

Çima: Pirsa hevalkarên sedemîn dike.

Mînak:

Çima bi we ra nehat? Ji ber baranê nehat.

Çima Amed koçber bû? Ji tirsaya sermayê koçber bû.

Gelo, ma, qey: Pirsa hevalkarên cextdar, guman û pêşbînî û neyînîyê dikin.

Mînak:

Qey ew ji geştyariyê venegeriyane?

Belê, ji duh ve vegeriyane.

Gelo hûn dê sibe biçin bajarî?

Ne ji sedî sed e ka em ê biçin an na.

Ma niha karê xwe neqedandiye?

Na, hîn gelek maye.

2.6.5.2. Fraz û hevokên hevalkarî

Fraz

Frazek dikare mîna hevalkarê tev bigere. Jixwe bi piranî hevalkarên kurmancî fraz in.

Mînak:

Helbest bi dengekê ziz dixwend. (çawanî)

Me berî sê salan ji Dihokê bar kir. (dem)

Em li bin wê dara mezin rûniştin. (cih)

Ji ber êrişên wan, gund vala bû. (sedem)

Bi qasî çar kesan dixebite. (rade)

Hevok

Hevok ji dikarin wekî hevalkaran tev bigerin.

Mînak:

Hevalkara çawanîyê

Mîna ku tu carî ew bajar nedîtibe, lê dinêrî.

Divê her tişt wekî ku ew dixwaze, biçe serî.

Hevalkara demê

Piştî ku ev kêşe qewimî, gelek karkeran xwe ji karî vekîşand.

Dema ku ew ji karê xwe vedigeriyan, rastî êrîşkê hatin.

Hevalkara cihî

Ew çûye dereka dût ku kes nikare bigihîje wir.

Her cihê ku em bixwazin, em dikarin biçinê.

Hevalkara sedemîn

Ji ber ku nexweş ketibû, bi ser me da nehat.

Çima ku min wekî wî nekir, xwe ji min xeyidand.

Hevalkara radeyî

Bi qasî ku dikare, xwe ji karî vedide.

Heta ji destê wî tê, dixebite.

Hevalkarên gihanekî

Carinan hevalkar ji bilî peywira xwe, hevokan ji bi hev ve girê didin.

Mînak:

Comerdî agahî da me, li ser vî esasî em hatin.

Ew bi serê xwe tev digerin, ji îro û pê ve kes têkiliyê bi wan ra neke.

Hûn karê xwe baş bi rê ve dibin, bi vî awayî hûn ê encameka pir baş bi dest bixin.

Dîlan li zanîngehê dixwîne, di heman demê da li kargehekê dixebite.

Me tu carî texsîriya we nekiriye, ji vî zêdetir hûn çî dixwazin.

We berî niha ji me ra zelal kiribû, bi rastî ji wekî we derket.

Ez ê bi te ra bêm, dibe ku tu bi ser rê ve nebi.

Zimanê me li ber bişaftinê ye, dîsa ji gelek kurd pê naaxivin.

Bila mirin hebûya, calînkasyon kalbûn tune bûya.

2.6.5.3. Bêjesaziya hevalkaran

a) Hevalkarên sade

Ev hevalkar ji rehekê pêk tên.

Mînak:

zû, qet, pir, kêr, jî, wir, vir, duh, par, pêr ...

b) Hevalkarên dariştî derîstî

Ev hevalkar ji rehekê û gireyên dariştinî pêk tên.

Mînak:

îsal, îşev, îro, êvarkî, serserkî, hêdika, zûka, mehane, salane, rojane, şêrane, berêvarkî ...

c) Hevalkarên lêkdayî lêkdayî

Ev hevalkar ji du rehan an zêdetir pêk tên.

Mînak:

bi şev, bi roj, piştî nîvro, bi nezanî, bi rehetî, bi xweşî, berî nîvro,
li jêr, li jor, car caran, ji niha ve, ji par ve ...

Têkiliya di navbera hevalkar û cureyên bêjeyan ên din da

Herwekî di pênaseyê da ji hatiye zelalkirin, hin cureyên bêjeyan ên din bi erka hevalkaran radibin, ev yek di kurmancîyê da, pir berbelav e.

Navdêr wekî hevalkaran

- Navdêr bi daçekan dibin hevalkar

Mînak:

Li malê dixebite.

Wekî şêran li ber xwe dide.

Sal bi sal rewşa me baştir dibe.

Kar bi rûniştinê naçe serî.

- Navdêr bi "ane"yê dibin hevalkar

Mînak:

şêrane, mêrane, jinane.

Hevalnav wekî hevalkaran

- Hin hevalnav bi guhastinê dibin hevalkar

Mînak:

Ew çûk bilind difire.

Ev hemwelatî azad tev digerin.

- Hevalnav bi daçeka "bi"yê û gireya "î"yê dibin hevalkar.

Mînak:

Bi dilxwazî karî bi rê ve dibe.

Bi xweşî radestî me bike.

Hejmarnav wekî hevalkaran

- Bi dubarekirin û daçekan

Mînak:

Sê bi sê derbasî holê dibin.

Pênc bi pênc derketin werzişê.

- Bi dubarekirin û "o"yê

Mînak:

Zarok yeko yeko li cejnê digeriyan.

Ew çaro çaro ji listikgehê hatin.

- Bi dubarekirin û "e"yê

Mînak:

Jinên gundî çarçar diçûne ser kaniyê.

Wan gul şeşe şeş kirin baq.

baq

2.6.5.4. Berawirda hevalkaran

Wekî hevalnavan, berawirda hevalkaran ji heye. Berawirda hevalkaran du alîyan ji hêla çawanîya karî ve dide ber hev.

berawird

Pileya berawirdî

Ev pile du aliyan ji hêla çawanîya karî ve berawird dike. Tê da kêmbûn û zêdebûn an jî wekhevîya du aliyan a li beranber hev diyar dibe. Kêmbûn an jî zêdebûna taybetmendîyan bi alîkarîya paşgira "-tir"ê pêk tê, wekhevî bi alîkarîya daçekên "bi qasî, fena, wekî, nola, mîna"yê pêk tê.

Mînak:

Ev zarok ji wê zarokê bi leztir dimeşe.

Ev hunermend xweştir dibêje.

Ew ji me zêdetir dixebite.

Mamostayê me waneyan hêsantir dide.

Azad bi qasî Ehmedî dixebite.

Ava vî çemî fena çemê din bi lez diherike.

Carinan asta berawirda hevalkaran bi alîkarîya hevalkarên radeyî pêk tê.

Mînak:

Delal hinekî zû hat, Laleş hîn jê zûtir hat.

Ev zarok piçekî hêdî bi rê ve diçe, ewa din gelekî hêdîtir bi rê ve diçe.

aya bîne
oyo bîn

Pileya bala

Ev pile berawirdê digihîne asta herî bilind, ango di vê pileyê da alîyek bi karê xwe ji yên din hemûyan zêdetir an kêmtir e. Ev pile bi alîkarîya hevalkara "herî/tewrî"yê pêk tê.

er/tewr

Mînak:

Herî/tewrî zû ew gihîşt dibistanê.

Ê ku herî/tewrî zêde diaxivî, ew bû.

Herî/tewrî kêm ew dimeşe.

Herî/tewrî dereng hûn çûn.

2.6.5.5. Peywira hevalkaran a rêzimanî

Têrker

Mînak:

Amed bi dilsarî çû.

Karker bi komî dixebitin.

Temamkera bikerê

Mînak:

Mala wan li vir e.

Kombûna wan duh bû.

2.6.6. Daçek

Cureyekê bêjeyan ê kargîn e, bi navdêr û cihnavan ra tê û têtikîliya wan bi kar û navdêrên dîn ên risteyê ra çêdike. Bo nimûne:

Ew li malê dixebite. Di vê risteyê da daçeka "li" yê têtikîliya "mal"ê bi kara "dixebite" yê ra çêkirîye.

Mamostaya li malê, hat. Di vê risteyê da daçeka "li" yê têtikîliya "mal"ê bi navdêra "mamosta" yê ra çêkirîye.

Herçî daçek in bi tena xwe bêwata ne, lê risteyê ji hêla "cih, alî, dem, sedem, mebest, jêderketin ..." ve sergihayî dikin.

Di kurmanciyê da pêşdaçek û paşdaçek hene, ev yek bazinedaçekan çêdike û bazinedaçek navdêr û cihnavan digirin nava xwe.

Ji ber ku têtikîliya daçekan bi navdêr û cihnavan ra ye, navdêr û cihnavên girêdayî daçekan dibin berkara daçekî.

2.6.6.1. Bêjesaziya daçekan

a) Daçekên sade

li

ji, ji ... ra, ji ... ve

bi, bi ... ra, bi ... ve, bi ... da

di ... da, di ... ra

Mînak:

Ew li dibistanê ye.

Ew ji Hewlêrê ye.

Wî ji min ra got.

Ji malê ve tê.

Ew bi destê çepê dinivîse.

Bi wî ra neçe nêçirê.

Mar bi diwarî ve hilkişî.

Keda wî bi avê da çû.

Di hewşê da dixebite.

Di taxê ra derbas bû.

b) Daçekên lêkdayî

Li: li ser, li dor, li ber, li nav, li cem, li hember, li rex, li kêlek, li gor

Ji: ji dor, ji nav, ji ber, ji ser, ji bilî, ji kêlekê ve, ji aliyê ...

Bi: bi dû, bi bin, bi dor, bi nav, bi qasî, bi ser ve, bi aliyê ...

Di: di ber da, di bin da, di nav da, di ser ra, di bin ra ...

Mînak:

Destê westiyayî li ser zikê têt e.

Li gel neyaran neçe beyaran.

Li gor wan ev mijar zehmet e.

Belaya mirovî ji ber lingê mirovî tê.

Ji xeynî wî her kes hat.
Bi dû tiştên pûç ketîye.
Bi qasî xwe bixwe, bi qasî xwe biaxive.
Gelek kesên zana di nav wan da hebûn.

2.6.6.2. Peywira daçekan

Bi: Van peywiran pêk tîne:

- Tişt û alava ku kar pê tê kirin, nişan dide.

Mînak:
Ew bi pêûsê dinivîse.
Mal bi zarokan şên dibe.
Av bi bêjîngê nayê komkirin.

- Bi wataya "li gor"ê tê bikaranîn.

Mînak:
Bi min ev mijar ne cihê nîqaşê ye.
Bi te em ê çawa vê pirsgirêkê çareser bikin?

- Di sondxwarinê da tê bikaranîn.

Mînak:
Bi Xwedê wiha ye.
Bi serê te, rast e.

- rastgeh
- Bê: Ev awayê neyînî yê daçeka "bi"yê ye.

Mînak:
Bê wan civat ne xweş e.
Bê te em nikarin vî karî bibin serî.

- Bi ... ra: Ev daçek pêrabûnê nişan dide. =

Mînak:
Ev bi birayê xwe ra li hev hat.
Em xebatên xwe bi wan ra dikin.
Ez bi wî ra neçûm.

- Bi ... ve: Ev daçek bi van erkan radibe: =

Pêvebûnê nişan dide.

Mînak:
Wêne bi diwarî ve ye.
Sêv bi darê ve ye.

Liv û tevgera rastgehî ya ber bi aliyekî ve diyar dike.

Mînak:
Bi darê ve hildikişê.
Dilop bi diwarî ve tîn.
Xişinde bi erdê ve dixuşin.

- Bi ... da: Tevgera ber bi jêr û ber bi pêş ve nişan dide. //

Mînak:

Baran bi ser wî da barîya.

Wekî guran bi ser me da hatin.

- Ji: Ev daçek cihê jêderketin, jêhatin û jêbûna tiştan diyar dîke.

Mînak:

Av ji kaniyê, nan ji banîyê.

Baran ji ewrên reş tê, kar ji dilê xweş tê.

Ew ji Mehabadê ye.

- Ji ... ra: Karê ku ji bo yekî/tiştêkî tê kirin, nîşan dide.

Mînak:

Her car ji mirovî ra li hev nayê.

Ji xelkê ra masîgir e, ji xwe ra kûsîgir e.

Bitirî ji gayê cot ra namîne.

- Ji ... ve: Dema destpêkirina tevgerê yan cihê ku tevger jê derdikeve, nîşan dide.

Mînak:

Ji zanîngê ve tê.

Ji wê demê ve çûye Wanê.

Ji hêla wî ve hat xwendin.

- Di ... da: Ev daçek wataya tiştêkî di nav tiştêkî din da diyar dîke.

gevîzandin

Mînak:

Bazara masîyan di avê da nayê kirin.

Baz di warê xwe da xweş nêçîrvan e.

Das di destê kê da be, ew pale ye.

- Di ... ra: Wataya derbasbûna di cihêkî/tiştêkî ra nîşan dide.

tê ra re

Mînak:

Xwe di ser hevalên xwe ra neqevêze.

Mirovê ku di rêya rast ra dimeşe, digihîje armanca xwe.

Ji bo ku wî nebînin, di nav zevîyan ra hat.

- Li: Ev daçek cihê lêmana tiştêkî/kesêkî diyar dîke. Ev daçek hertim bi tena xwe ye ango tu paşdaçekan wernagire. Ji aliyê watayê ve, nêzîkî daçeka "di ... da" yê ye, lê ev daçek bi gelemperî cihêkî fireh diyar dîke û daçeka "di ... da" yê cihêkî sînorkirî û teng diyar dîke.

Mînak:

Dawet li malê ye, dahol li çolê ye.

Pez li mêrgê diçêre.

Wî li Mêrdînê zanîngê xwendîye.

Hin daçekên din

- Heta: Ev daçek cihê demê diyar dîke.

Mînak:

Ew heta zanîngê meşin.

Em heta sibehê hişyar man.

- **Wekî, nola, fena, mîna:** Ev daçek hemû bi watayekê tên û ji bo şibandinê tên bikaranîn. *Sey, seke*

Mînak:

Ev zarok wekî bilbilan dike fixan.

Ew ji nola birayê xwe ye.

Ew fena bavê xwe ye.

Miletê kurd mîna şêran li ber xwe dide.

- **Ji bo:** Ev daçek armancê diyar dike.

Mînak:

Me alikarî ji bo wan xwast.

- **Ji ber:** Ev daçek sedemê diyar dike.

Mînak:

Ew ji ber çî nehatiye?

- **Der barê ... da, der heqê ... da, li ser ...**

Ev daçek agahdariyê der barê tişteki/keseki da didin.

Mînak:

Wî tu agahî der barê mijarê da nedan.

Semînerê der heqê jîyana Celadet Bedirxanî da hat dayîn.

Me pir caran li ser vê mijarê niqaş kirîye.

*Der barê ... da
Der heqê ... da) bestir dide*

2.6.6.3. Têkilîya daçekan bi beşên din ên axiftinê ra

Herçiqas di pênaseyê da hatiye zelalkirin ku erk û peywira daçekan a sereke têkilîya bi navdêr û cihnavan ra ye, lê tevî vê yekê ji daçek ji bilî vê erka xwe ya sereke, bi hin peywirên din jî radibin.

Daçek û gihanek

Gelek daçek hene ku wekî gihanekan tên bikaranîn û peywira wan bi cih tînin. Li vir êdî ev daçek ji erka xwe ya daçekbûnê dikevin û dibin gihanek.

- **Heta**

Mînak:

Wekî daçek

Ava golê dimîne heta salê.

Fira mirîşkê heta kadinê ye.

Çira derewçinan heta razanê ye.

Wekî gihanek

Heta ku ez wî nebinim, ez naçim.

Heta ku xirab nebe, ava nabe.

Heta ku em gihîştin, ew çûbû.

- **Ji bilî**

Mînak:

Wekî daçek

Ji bilî wî em hemû kurd in.

Çav ji bilî xwe her tiştî dibîne.

Ji bilî Mizgînê, yê din tev hatibûn.

Wekî gihanek

Ez tu sedemên nehatina wî nabînim, ji bilî ku duh nexweş ketibû.

Ez tu agahîyan nizamim, ji bilî ku hin dibêjin wan qeza kirîye.

• Mîna, wekî, fena, nola

Mînak:

Wekî daçek

Ew wekî mezinan tev digere.

Keça wî mîna wî ye.

Ew fena dayika xwe jîr e.

Sal nola rojan tên û diçin.

Wekî gihanek

Mîna ku kesî jê ra negotibe, xwe nebihîstî dikir.

Fena ku eskeran girtibe ser, ji tirsan dilerizî.

• Ji bo, ji ber

Mînak:

Wekî daçek

Em ji bo wê dereng man.

Ew ji ber me hatin.

Wekî gihanek

Ji bo ku em bi ser bikevin, divê em bixebitin.

Ji ber ku karekê wan derket, ew bi me ve nehatin.

Herwekî xuya ye, ev daçek bi “ku”yê dibin gihanek û hevokan digihînin hev, lê carinan, nemaze di biwêj û gotinên pêşîyan da “ku” dikeve.

Daçek û hevalkar

Têkiliyeka zêde di navbera daçek û hevalkaran da ji heye, herçi daçek in pir caran hevalkaran pêk tînin.

Mînak:

Heta kengê hûn ê dûr bimînin?

Heta sibehê xew bi çavê min neket.

Miletê kurd mîna şêran li ber xwe dide.

Bixwe mîna mêran, rabe mîna şêran.

Ew nola xezalan dibenze.

Bi xemgînî bar kir.

Daçek û hevalnav

Daçekên “bi, bê”yê dibin pêşgir û hevalnavên dariştî pêk tînin. Herwekî: bîaqil, biol, bihiş, bêaqil, bêhiş, bêol ...

Daçekên “li, ji”yê, hevalnavên lêkdayî pêk tînin, wekî: licih, lirê, jipêya, jidil ...

Daçek û kar

Hin kar ji bi alîkarîya daçekan pêk tînin, bêhtir ji karên biwêji. Wekî: li dar xistin, bi kar anîn, li ber ketin, bi dawî kirin ...

2.6.6.4. Hin xalên din der barê daçekan da

a) Daçek û tewang

Taybetmendîyeka daçekên kurmancî ew e ku bandorê li navdêr û cihnavên girêdayî xwe dikin û wan ditewînin.

Mînak:

Ê ji agirî ditirse, di avê da dixeniqe.

Dîn ji dawetan, zarok ji listikan têr nabin.

Dinya bi sebirê ava bûye.

b) Gelek caran, nemaze di zargotinê da, pêşdaçekên "li, ji, bi, di" ji daçekên lêkdayî yên wekî "li dor, li ser, ji ber, ji rex, ji cem ..." dikevin, peyvên "dor, ser, ber, rex, cem ..." bi tena xwe dimînin û peywira daçekê bi cih tînin.

Mînak:

Çavê kê li çî be, ew tê ber deriyê wî.

Çû ser çemî, çem çikîya.

Deyndaran xwe avêt paş xwînxwaran.

Serê bikeve ber minetan, bila biçê nav ziyaretan.

c) Carinan ji bo sivikbûnê pêşdaçek dikeve, êdî paşdaçek bi peyva berî xwe ve tê nivîsîn.

Mînak:

Me xwarin xwar, piştra me li televîzyonê temaşe kir.

Heta derengî şevê dixebitî, lewra sibehê dereng mabû.

Niha ez diçim, dûra kî tê bila were.

Lê eger pêşdaçek hebe, pêwîst e paşdaçek cuda bibe.

Mînak:

Me xwarin xwar, bi pişt ra me li televîzyonê temaşe kir.

Heta derengî şevê dixebitî, ji lew ra sibehê dereng mabû.

Niha ez diçim, bi dû ra kî tê bila were.

d) Carinan pêşdaçek dikeve û gireya "î"yê cihê wê digire û erka wê pêk tîne.

Mînak:

Piştî tengasîyan firehî ye. (Li pişt tengasîyan firehî ye.)

Dûrî dilan dûrî aqilan jî. (Dûr ji dilan, dûr ji aqilan jî.)

Tevî wî, em dibin deh. (Tev li wî, em dibin deh.)

Nêzî me çêbû. (Li nêz me çêbû.)

e) Daçekên "der barê, der heqê"yê daçekên lêkdayî ne, loma nabe ku bi hev ve bînin nivîsîn. Herwiha nabe ku daçeka "di"yê li pêşiya wan bê nivîsîn, ji ber ku peyva "der"ê wataya "di"yê dide.

Mînak:

Der barê karî da hûn çî dibêjin?

We der heqê wan da lev kir.

2.6.7. Gihanek

Ew cureyê bêjeyan e ku peyv, fraz û hevokan digihîne hev û têkiliyeka watayî di navbera wan da çêdike.

2.6.7.1. Gihanek li gor peywirê

Gihanek li gor peywirê dibin du cure: hevgihanek û bingihanek

2.6.7.1.1. Hevgihanek

Ev gihanek hêmanên yeksan bi hev ve girê didin, mebest ji hêmanên yeksan ew e ku ev hêman di heman pileya rêzimanî da ne. Ango du navdêr an du hevalnav an du fraz an jî du hevokên sereke û hwd digihînin hev.

Hin hevgihanek: û, lê, bes, an, herwiha, anga, ne ... ne jî, an ... an jî

Mînak:

Azad û Dilan bi hev ra serdana welatî dikin. (navdêr + navdêr)

Tu ji kîjanê hez dikî, şîn an sor? (hevalnav + hevalnav)

Bavê min û apê min bi hev ra çûn bajarî. (fraz + fraz)

Ne gelekî erzan e ne jî gelekî biha ye. (hevok + hevok)

2.6.7.1.2. Bingihanek (gihanekên alîkar)

Ev gihanek hevokên nesereke (alîkar) bi hevokên sereke (bingehîn) ve girê didin.

Hin bingihanek: piştî ku, berî ku, dema ku, gava ku, ji ber ku, ji bo ku, heta ku, tevî ku, ji ber vê yekê, loma, lewra, çinku ...

Mînak:

Piştî ku ji dibistanê were, dê dest bi xwendinê bike.

↓
hevoka nesereke

↓
hevoka sereke

Gava ku ji malê derdikeve, deriyî li pey xwe digire.

↓
hevoka nesereke

↓
hevoka sereke

2.6.7.2. Gihanek li gor watayê

2.6.7.2.1. Gihanekên zêdeker

Ev gihanek agahiyekê, tişteki li yên din zêde dikin. Hin gihanekên zêdeker: û, herwiha, herwekî, bi ser da jî, hey ...

Mînak:

Xwar û li wir rûnişt.

Ziman dergûşa çanda gelan e, herwiha bingeha nasnameya mirovan e.

Herwekî tê zanîn, azadî pir şîrîn e.

Hey tu karê te nîne, îro alîkariya me bike.

2.6.7.2.2. Gihanekên dijber

Ev gihanek du agahiyên dijberî hev destnîşan dikin.

Hin gihanekên dijber: lê, lê belê, bes, tevî ku, herçend, herçiqas ...

Mínak:

Dixwast were, lê karekê wî derket.

Tevî ku astengî hene, ew karê xwe berdewam dikin.

Ew dixebite, bes yeka wî nabe du.

Herçend wî şîret dikin jî ew guh nade wan.

2.6.7.2.3. Gihaneke ronîker

Ev gihaneke sedem û rewşê rave dikin.

Hin gihaneke ronîker: lewra, loma, ku, ji ber vê yekê, ji ber ku, ji bo ku, çinku, ango ...

Mínak:

Ew ji karî hez dike, ji ber vê yekê hertim dixebite.

Me jê ra negotibû, loma dilê xwe girtiye.

Ew hatiye ku vê mijarê ji me ra zelal bike.

Dijmin zimanê me dide bişaftin ango helandin.

Ji ber ku nexweş ketibû, bi me ra nehat.

2.6.7.2.4. Gihaneke demê

Ev gihaneke hevokan ji aliyê demê ve dîyar dikin.

Hin gihaneke demê: piştî ku, berî ku, dema ku, gava ku, heta ku ...

Mínak:

Piştî ku baran barîya, zevî şîn bûn.

Berî ku tu bigihîji malê, agahiyê bide min.

Dema ku wî dixwend, min bi gogê dilîst.

2.6.7.2.5. Gihaneke mercî

Ev gihaneke encama karekî bi mercan ve girê didin.

Hin gihaneke mercî: ku, eger, eger na, an na, bes, lê, herçiqas ... ewqas, herçend ... ewçend ...

Mínak:

Ku tu bixebitî, tu yê bi ser bikevî.

Ez ê bidim te, bes nede kesî.

Eger karê min zû biqede, ez ê biçim konserê.

Divê em çareyekê ji vê rewşê ra bibînin; eger na rewş dê kambaxtir bibe.

Dermanê xwe bixwe; yan na tu baş nabî.

Herçend mirov dixwîne, ewçend zana dibe.

2.6.7.2.6. Gihaneke cudaker

Ev gihaneke du tiştan ji hev cuda dikin.

Hin gihaneke cudaker: an, an ... an jî, ne ... ne jî ...

Mínak:

Bila Lîlav an Dilvîn alîkarîya me bike.

An bimîne yan jî biçe alîkarîya wan bike.

Ne bide wan ne jî ji wan bistîne.

2.6.7.2.7. Gihaneke hevkarîyê

Ev gihaneke pêwendiyê di navbera du tiştên têkildar da çêdikin.

Hin gihanekên hevkarîyê: hem ... hem, geh ... geh, ha ... ha

Mînak:

Hem dixwînin hem kar dikin.

Geh dibêje geh dinivîse.

Ha hûn bixwînin ha ew bixwînin, tişteke nabe.

2.6.8. Bang

Cureyekê bêjeyan ê berteng e ku hestên mîna: “kelecan, tirs, heyirîn, hêrs, kêfxweşî, ecibandin, xemgînî ...” nişan dide. Bang ji aliyê ristesazîyê ve bi tu beşên din ên risteyê ra ne têkildar e, dikare bi tena xwe jî risteyekê pêk bîne. Herwiha ji aliyê morfolojîyê ve nakeve ber pîvanên bêjesazî û kêşanê.

2.6.8.1. Cureyên bangê

2.6.8.1.1. Bangên sereke

Ev peyv di bingeha xwe da bang in û ne girêdayî tu cureyên bêjeyan ên din in.

Mînak:

- Ax!
- Of!
- Êh!
- Wi!
- Wa!
- Wax!
- De!
- Ha ho!
- Tew!
- Ey!
- Yaw!
- Oy!

- Weh!
- Ay!
- Gidî!
- Ūûû!
- Wey!
- Waa!
- Ox!
- Wiş!
- Hey!

Herwiha hin bang hene ku ji dengên hin tiştan û dengên siruştî hatine, wekî: teq, bom, gurm, ring, fir, xişt, vizz ...

Mînak:

Got gurm! Kes li wir nema.
 Got ring û li ber guhê me ket!
 Ji nişka ve got fir û firîya!

2.6.8.1.2. Bangên nesereke

Hin cureyên bêjeyan ên din û riste jî dikarin bi awazeyê, bangê pêk binin.

Mînak:

Rabe! Dinya nîvro ye.
 Mixabin! Te her tişt ji bîr kir.
 Aferîn! Vê carê te dilê me hênîk kir.

Pîroz be! Tu hêjayî vê xelatê yî.

Hawar e! Vî mala me li miratê gerand.

Xorto! Tu yê bi ku ve biçî?

Ay li min û li vî halî!

Xwezî ew bihatina!

Eger bangkirina navan bi hestekê xurt be, ew nav dibin bang, lê eger bi hestekê asayî be, nabin bang û bêhnok li ber wan tê nivîsîn.

Mînak:

Bangkirina asayî	Bangkirina bi hestekê xurt
Xwişkê, te rêya xwe winda kirîye.	Xwişkê! Te rêya xwe winda kirîye.
Xwendekarino, gelek kar ji me tê xwastin.	Xwendekarino! Gelek kar ji me tê xwastin.
Wa Ehmed, ka bi vir da were.	Wa Ehmed! Ka bi vir da were.
Wa Delalê, çima tu xeyidîyî?	Wa Delalê! Çima tu xeyidîyî?

2.6.8.2. Bang ji aliyê watayê ve

2.6.8.2.1. Bangên kêfxweşî û ecibandinê

Mînak:

Ox! Tîma me bi ser ket.
 Aferîn, tu wekî şêran î!
 Êh, ev çi guleka bêhnxeş e!
 Ax! Ev der gelekî hênîk e.

2.6.8.2.2. Bangên xemgînî û acizîyê

Mînak:

Off! Bêhna min teng bûye.

Hey wax! Em di vê rewşê da man.

Heyf! Kes li wî napirse.

Hawar e! Kes li halê me napirse.

2.6.8.2.3. Bangên matmayînê

Mînak:

Qey ev aqil nagire gidi!

Wa! Ev guh nade tu kesî.

Wi! Ev disa vegeyriya.

Tew! Ev ji me kêmbû.

Hin bang hene ku ji bo hestên cuda tên bikaranîn.

Mînak:

Ax! Kezeba min şewitî. (xemgînî)

Ax! Ev hinar pir xweş e. (ecibandin)

Ox! Ma çî ji destê me tê? (heyirîn)

Ox! Dawiyê ev gihîşt a xwe. (kêfxweşî)

3. RISTESAZÎ



Ristesazî: Avahiya risteyan vedikole ka li gor çî rêz û rêzikan, bêje dibin fraz, fraz dibin hevok û hevok dibin riste.^[29]

3.1. Fraz, hevok û riste

3.1.1. Fraz (phrase)

Bireka peyvan e ku ji du peyvan an zêdetir pêk tê, bi hev ra di nav pêwendîyekê da ne û wekî yekeyeka rêzimanî di risteyê da kar dike. Ji bilî fraza karî, di frazan da kar nîne.

Herçiqaq fraz wekî bireka peyvan hatibe pênasekirin jî lê di rêzimanê da terma frazê ji bo sereyê (serbêje)^[30] tenê jî tê bikaranîn. (Nelson û Greenbaum, 2016: 78-79)

Di frazan da "ravekirin" çêdibe. Di ravekirinê da hinek bêje, bêjeyên din rave dikin, bi vê yekê hêmanek heye tê ravekirin û jê ra "ravekirî" tê gotin, hêmana din jî bi erka ravekirinê radibe, jê ra "raveker" tê gotin. Bo nimûne: Gula sor, gul "ravekirî" ye û sor "raveker" e.

Raveker hem berî ravekirîyê cih digirin hem jî piştî wê, ango bêje hem bi bêjeyên piştî xwe, hem bi bêjeyên berî xwe tînin ravekirin, lewra "pêşraveker" û "paşraveker" hene. Wekî nimûne:

^[29] Celadet Bedirxanî terma "komek"ê li şûna "sentence" a inglîzîyê bi kar aniye û terma "hevok"ê li şûna "clause" a inglîzîyê bi kar aniye. "Hevok (m) - Ji her birê komekê re hevok dibêjin. Komek carina ji çend û carina jî ji hevokê bi tenê tîte pê. Di her komekê de herçend lêker hene ewçend jî hevok peyda dibin." (Hawar, c2: 716)

Di pey Celadet Bedirxanî ra, her du term berevaji û li şûna hev hatine bikaranîn, ango hevok li şûna komekê û komek li şûna hevokê hatiye bikaranîn. Di zaravayê soranî da, ji bo "sentence" a inglîzîyê riste tê bikaranîn. Loma "riste" jî bo "sentence"ê hatiye bikaranîn û ji bo "clause"ê jî cardin wekî Celadet Bedirxanî terma "hevok"ê hatiye bikaranîn.

^[30] Sere: Bêjeya bingehîn e ku fraz li ser tê avakirin, bi tena xwe jî peywira frazê bi cih tîne.

du	gulên	sor
↓	↓	↓
pêşraveker	ravekirî	paşraveker

3.1.1.1. Cureyên frazan

3.1.1.1.1. Frazaya navdêrî

Sereya vê frazê navdêr e, dibe ku hevalnav û cihnav jî tê da hebin, lê hemû bi navdêrekê ve girêdayî ne, ango hemû bi hev ra wekî navdêrekê kar dikin.

Mînak:

Wî kulilkên biharê bêhn kirin.

Vî xwendekarî bersiva pirsê da.

Hemû mêvan hazir bûn.

Ravekirina frazaya navdêrî: Frazaya navdêrî bi du awayan tê ravekirin.

a) **Pêşraveker:** Ev peyv tîna pêşîya navdêran (ravekirî) û wan rave dikin.

Mînak:

Diyarkera nîşander: Wan pêncûsan bigihîne dibistanê.

Diyarkera hejmarî: Du xwendekar nehatine dibistanê.

Diyarkera nenasyar: Gelek qencî bi me kirîye.

Diyarkera pirsyarî: Kîjan hevalî ev kar qedand?

b) **Paşraveker:** Ev piştî navdêran (ravekirî) tîna û wan rave dikin.

Mînak:

Hevalnava çawanîyê: Ez ê gula sor jî te ra binim.

Diyarkera hejmarî (rêzî): Pirtûka çarem pîr dewlemend e.

Diyarkera pirsyarî: Pênûseka çawa binim?

Navdêr: Dara zeytûnê bisûd e.

Cihnav: Gundê wan bi daran hatiye xemilandin.

Frazaya daçekî: Karê bi wan ra zehmet e.

Hevoka pêwendîyê: Gundê ku koçber bûbû, hatiye talankirin.

3.1.1.1.2. Frazaya karî

Ev fraz jî karê û hêmanên girêdayî wê pêk tê, bi vî yekê pêvebera risteyê pêk tîne. Hêmana girêdayî karê dikare kara alîkar be yan jî tîrker û temamker be.

Mînak:

Pirtûk tîna çapkirin.

Pirtûk bi lez tîna çapkirin.

Her sal pirtûk tîna çapkirin.

Wan ev pirtûk li Amedê çap kirin.

Ravekirina frazaya karî: Frazaya karî bi du awayan tê ravekirin.

a) **Pêşraveker**

Mînak:

Hevalkar

Ew serbest çû.

Ev kevok bilind firiya.

Fraza daçekî

Ez bi wî ra çûm.

Ew bi Zînê ra dixebite.

b) Paşraveker

Mînak:

Hevalkar

Ew sibehan diçe zanîngehê.

Zana vegeŕiya gundî.

Hevokên armanc û sedemê

Ez hatim ku te bibînim.

Ew çû ku çareyekê ji vê pirsgirêkê ra bibîne.

3.1.1.1.3. Fraza hevalnavî

Birek peyv e ku bi hev ra wekî hevalnavekê tev digere û navdêrekê rave dike. Sereya vê frazê hevalnav e.

Mînak:

Ev çîya pir bilind e.

Gundê wan zêde xweş e.

Ev zozan gelekî sar in.

Ravekirina fraza hevalnavî: Fraza hevalnavî bi pêşravekeran tê ravekirin.

Mînak:

Hevalkar

Ev zarok gelekî bedew e.

Ew zêde kêfxweş e.

Dar hinekî hişk bûne.

3.1.1.1.4. Fraza hevalkarî

Birek peyv e ku bi hev ra wekî hevalkarê tev digere û karekê rave dike. Sereya vê frazê hevalkar e.

Mînak:

Ew stranên gelekî xweş dibêje.

Qenco pir azad tev digere.

Nîşe: Fraza daçekî jî dikare wekî fraza hevalkarî tev bigere.

Mînak:

Me li ber sîya daran bêhna xwe veda.

Ew li rex çemî rûnişt.

Ravekirina fraza hevalkarî: Fraza hevalkarî jî bi pêşravekeran tê ravekirin.

Mînak:

Hevalkar

Ew gelekî zû tê.

Hûn piçekî dereng dimînin.

Ew pir xweş diaxive.

3.1.1.1.5. Fraz a daçekî

Ev fraz ji daçek û berkara wê pêk tê. Herçî berkara daçekê ye, dibe navdêr an cihnav be.

Mînak:

Xemgîn bi wî ra çû.

Li bin ewrên reş difiriya.

Çûk li ser darê ne.

Ravekirina fraza daçekî: Fraz a daçekî bi pêşravekerê tê ravekirin.

Mînak:

Hevalkar

Ez bêhtir li dibistanê spartekên xwe çêdikim.

Ew tenê ji te ra helbestan dixwîne.

Ew hew bi te ra tê werzişê.

Hema li ber deriyê parkê raweste heta ez bêm.

3.1.1.2. Peywira frazan a rêzimanî

Fraz a navdêrî

Mînak:

Biker

Vi zilamî destek da me.

Hevalê min peyamek ji min ra şand.

Berkara rasterast û nerasterast

Me birek zarok li kolanê dît.

Wî pirtûka min da hevala xwe.

Temamkera bikerê

Ew kes mamostayê min e.

Gundê me gundekê mezin e.

Temamkera berkarê

Wan ew kir berpirsê dezgehê.

Me ew hişt mamostayê zimanî.

Têrker

Hefteya borî em çûn zanîngehê.

Wê salê gelek baran barî.

Di van her du mînakên borî da fraza navdêrî wekî fraza hevalkarî tev digere.

Fraz a karî

Mînak:

Pêveber

Ew çû.

Dar tîn avdan.

Fraz a hevalnavî

Mînak:

Temamkera bikerê

Ew gul gelekî xweşik e.

Derdora wan pir paqij e.

Temamkera berkarê

Te em pir hejar hiştin.

Fraza hevalkarî

Mînak:

Têrker

Ew gelekî zû hat.

Em pir xweş stranan dibêjin.

Fraza daçekî

Mînak:

Temamkera bikerê

Pirtûka wî li dibistanê ye.

Ew ji Amedê ne.

Berkara nerasterast

Wê listokek ji Xelilî ra anî.

Mîna ji mamostayî pirsî.

Têrker

Ew li bajarî dixwîne.

Em bi wan ra hatin.

3.1.2. Hevok

Yekeya risteyê ye ku ji frazê mezintir e, ji biker û pêveberê pêk tê.

Mînak:

Agirîn nameyekê dinivîse.

Her dar li daristana xwe geş e.

Mêvan bi nan û ava xwe tê.

3.1.2.1. Cureyên hevokan

3.1.2.1.1. Hevoka sereke (bingehîn)

Ev hevok ji aliyê rêzimanî ve dikare bi tena xwe risteyekê ava bike.

Mînak:

Dilvîn li Amûdê dixwîne.

Dema ku ez te dibînim, ez geş dibim.

Ez dixwazim ew bi me ra were.

Min dît ku ew êdî kar nake.

3.1.2.1.2. Hevoka nesereke (alîkar)

Ew hevok e ku xweserîya wê ya rêzimanî bi tena xwe nîne, ew girêdayî hevoka sereke ye û pê ra risteyekê ava dike.

Mînak:

Dema ku me karê xwe qedand, em hemû pê ve çûn.

Min zanî ku ew nikare vî karî bibe serî.

Min bihîst ku wî bar kiriye.

3.1.2.1.2.1. Cureyên hevokên nesereke (alîkar)

3.1.2.1.2.1.1. Hevoka navdêrî

Ev hevok bi giştî wekî navdêrekê tev digere. Bi vê yekê ew dikare bibe hêmana risteyê.

Mînak:

Wekî biker

Xelata ku min wergirtibû, pir biha bû.

Xwendekarê ku me behsa wî dikir, gelek karên bisûd kirin.

Wekî berkar

Pêşiyên me gotiye: "Kesê neke, naxwe."

Min zanî ku ew hew bi ser me da tê.

3.1.2.1.2.1.2. Hevoka pêwendiyê (hevoka hevalnavî)

Ev hevok navdêrekê rave dike. Bo nimûne, "Pirtûka ku min xwend, min sêdeka mezin jê girt." Hevoka "a ku min xwend" pirtûkê dide nasîn wekî çawa hevalnavêk pirtûkê rave bike û wê bide nasîn.

Mînak:

Kovara ku min ji zû ve dixwend, qedîya.

Zarokên ku baş tîr perwerdekirin, civakê bi pêş da dibin.

3.1.2.1.2.1.3. Hevoka hevalkarî

Ev hevok mîna hevalkarekê tev digere û karê rave dike. Ew bi xwe jî mîna hevalkarên din, hevoka sereke ji aliyê çawanî, dem ... ve rave dike.

Mînak:

Çawanî

Wisa bixebite, wekî ku min ji te ra zelal kirîye.

Di axivî, mîna hinan çîrok jê ra gotibe.

Dem

Piştî ku ez ji karê xwe vegerim, ez ê te bibim pirtûkxaneyê.

Berî ku biçê dibistanê, karê xwe qedand.

Sedem û armanc

Ji ber ku par hişkesalî bû, îsal kesî erdê xwe neçand.

Dixwîne da ku zanîngeha xwe bi şanazî derbas bike.

Rade

Heta jê hat, qîr kir.

Bi qasî ku dixwîne, encamê bi dest dixê.

Merc

Ku em sûtê ji vê yekê nebînin, em ê poşman bibin.

Eger karê me biçê serî, em ê gelekî dilşad bibin.

3.1.2.1.3. Hevoka navberî

Ev hevok bi mebesta zelalkirin û ravekirina boçûnekê di nav risteyê da tê bikaranîn. Girêdana vê hevokê ji aliyê rêzimanî ve bi beşa din a risteyê ra nîne.

Mînak:

Ehmedê Xanî, dilovanîya Xwedê lê be, Destana Mem û Zînê nivîsiye.

Ez ne şaş bim, ew berî du salan çûbû Amedê.
Her roj, wekî tu dizanî, ew dereng tê.
Me çend caran, wekî te jî didît, hewl dida kêşeyê çareser bikin.

3.1.3. Riste

Koma bêjeyan e ku li gor rêzikên rêzimanî li pey hev rêz dibe û watayeka temam radigihîne. Dibe ku riste ji hevokekê yan çend hevokan pêk were.

Mînak:
Min pirtûkek kirî.
Dê û dotê şer kir, kêmaqîlan bawer kir.
Piştî ku ez ji dibistanê vegeriyam, min karê malê kir.

3.1.3.1. Hêmanên risteyê

Destpêkê riste li ser du hêmanên sereke "biker û pêveber" tê dabeşkirin, di pêveberê da jî hêmanên wekî, "kar, temamker û têrker"ê cih digirin.

3.1.3.1.1. Biker

Ew kes an tişt e ku tevger û kirinê pêk tîne.

Mînak:
Wan erdê xwe cot kir.
Raman û Azadî name ji hev ra dişandin.
Dil fireh be, rê fireh e.

Vê zarokê şanoyeka xweş pêşkêş kir.
Pênûsa ku min kiribû, pir xweş dinivîse.

Bikera veşartî

Carinan biker veşartî ye, bi alikariya gireyên kesî xuya dibe.

Mînak:
Ji erebeyê peya bûn û bi rê ketin. (ew)
Hatim û çûm. (ez)
Dibêjî nabêjî wekî hev e. (tu)

3.1.3.1.2. Pêveber

Hêmana risteyê ye ku karekî, bûyerekê yan rewşekê radigihîne. Ji bilî bikerê, tiştê mayî hemû dibe pêveber.

Mînak:
Ew çûn.
Wê nameyek nivîsî.
Gelek kes di pêşbirkan da tîn xelatkirin.
Me pirtûkên kurdî ji bo dibistanan anîn.
Duh bi şev, gelek kes li wir civiyabûn.
Zivistana par, em li gundî bûn.

Pêveber di risteya lêkdayî da

Ji ber ku risteya lêkdayî ji du hevokên serbixwe pêk tê, her du hevok xwedî pêveber in.

Mînak:

Ehmed li Amedê ma, Rizgar ber bi Wanê ve çû.

Me xwendina xwe qedand û wan jî karê xwe qedand.

Pêveber di risteyên têkel da

Di risteyên têkel da jî du pêveber hene; pêvebera hevoka sereke û ya hevoka nesereke. Eger hevoka nesereke bûbe têrker an jî berkar, ew jî dibe beşek ji pêvebera hevoka sereke. Bo nimûne: **Dema ku ez çûm gundî, gundiyan dest bi şahîyê kiribû.**

Di vê risteyê da hevoka "dema ku ez çûm gundî" nesereke ye, "dema ku ... çûm gundî" pêvebera wê ye, lê ev hevok bi giştî têrker e û dibe beşek ji pêvebera hevoka sereke.

Mînak:

Piştî ku me ew razî kir, em vegehiyan malê.

Ji ber ku gelek berf baribû, rê girtî bûn.

Min ew çenteyê te yê ku te duh dabû min, gihand mala we.

Min xwast ez nêrîna te jî bigirim.

Eger hevoka nesereke biker be, nabe beşek ji pêvebera risteyê.

Mînak:

Baxçeyê ku me par çandibû, îsal kesk dike.

Çivîkên ku carê li van bajaran bûn, êdî koç dikin.

Hêmanên ku di pêveberê da cih digirin:

Di pêveberê da jî hêman hene: kar, temamker û têrker

3.1.3.1.2.1. Kar

Hêmana herî giring e ku kar, tevger, rewş û rûdanê destnîşan dike.

Mînak:

Ew li Qamişloyê gerîyan.

Dicle ji Serhedê ye.

Wan destên xwe paqij kirin.

3.1.3.1.2.2. Temamker

Ew hêman e ku hêmanên risteyê yên din ji aliyê watayê ve temam dike, temamker jî risteyê nayê avêtin. Temamker di nav xwe da wiha dabeş dibe:

Berkar

Temamkera bikerê

Temamkera berkarê

• Berkar

Ew hêman e ku kar û tevger li ser pêk tê û wataya karê temam dike. Berkar di nav xwe da dibe du beş; berkara rasterast û berkara nerasterast.

Berkara rasterast

Ew kes û tişt in ku bandora karê rasterast li wan dibe.

Mînak:

Hêlînê gul av dan.

Me pirtûkên helbestan çap kirin.

Ew zarokên xwe bi keda xwe xwedî dike.

Min ew çûkê birîndar ê ku min li çolê dîtibû, derman kir.

Berkara nerasterast

Ew kes û tişt in ku karê berkara rasterast werdigirin.

Mînak:

Şêrgoyî pirtûk da Bahozi.

Lezgîni pezê xwe firot cîranê xwe.

Min çirokek ji wan ra got.

Temamkera bikerê

Ew hêman e ku wataya bikerê tamam dike, ew jî dikare navdêr, cihnav, hevalnav û hevalkar be.

Mînak:

Ew xwendekar e.

Ew bû mamosta.

Ê serkeftî ew e.

Pirtûka me ya nû ev e.

Ew feqîr man.

Ev mirov camêr xuya ye.

Ew li Qamişloyê ye.

Ez li gundî bûm.

Temamkera berkarê

Ew hêman e ku wataya berkarê tamam dike. Temamkera berkarê di kurmanciyê da bêhtir bi karên mîna "kirin û hiştin"ê ra derdikeve holê.

Mînak:

Te ew kir berpirs.

Wan em kirin hêz.

Te ew hişt cotkar.

Te em xizan hiştin.

3.1.3.1.2.3. Têrker

Ev hêman, karê ji gelek aliyên mîna, "çawanî, cih, dem ..." ve têr dike.

Mînak:

Kevok bilind firîya.

Azad gelekî dixebite.

Me ji bajarî bar kir.

Em li warê Siyabend û Xecê gerîyan.

Par karê me zû qedîya.

Ez ji wî ra xebitîm.

Nîşe: Carinan hêmanên risteyê veşartî ne, lê wataya risteyê tê famkirin.

Mînak:

Te ew kar bir serî?

Belê. (Belê, min bir serî.)

Hûn kengê ji Wanê vegeŕîyan?

Duh. (Em duh ji Wanê vegeŕîyan.)

Spas. (Ez spasîya te dikim.)

Dem baş. (Dema te baş be.)

Bi xatirê te. (Ez xatirê xwe ji te dixwazim.)

Ku em gihîştin? (Ku em gihîştin, em ê çi bikin?)

- Peyvên bangê jî bi tena xwe dikarin risteyekê pêk bînin.

Mînak:

Ax! (Ax, ev çi hal e!)

Of! (Of, ev kêşe çareser nebû!)

- Carinan di biwêj û gotinên pêşîyan da hêmanên risteyê veşartî ne.

Mînak:

Hin bi malê xwe, hin bi canê xwe.

Baz bi bazan ra, qaz bi qazan ra.

3.1.3.2. Peyvrêzî

Di her zimanekî da bêje li gor hin rêzikan li pey hev rêz dibin. Di kurmanciyê da bi gelemperî rêgeza rêzbûna bêjeyan wiha ye:

biker + berkar + kar

Mînak:

Biker	Berkar	Kar
Wan	em	birin
Me	pirtûka xwe	xwend
Delalê	dar	çand

3.1.3.3. Rêkeftina biker û berkarê bi karê ra

Di kurmanciyê da kar di dema niha û dahatî da, li gor bikerê û di dema borî da eger kar têper be li gor berkarê tên kêşan.

Mînak:

Kar	Têper	Têneper
Dema niha	Tu gulan diçînî.	Hûn diçin pêşangehê.
Dema dahatî	Tu dê gulan biçînî.	Hûn dê biçin pêşangehê.
Dema borî	Te gul çandin.	

3.1.3.3.1. Ergatîfî

Ergatîfî, ew rewş e ku bikera kara têneper û berkara kara têper ji hêla rêzimanî ve di heman rewşê da ne. Di kurmanciyê da ev rewş di dema borî da heye, ji ber vê yekê kurmancî nîvergatîf e.

Mînak:

Têneper	Têper
Ez çûm.	Wan ez ditim.
Tu hatî.	Wê tu ditî.

Hin taybetmendiyên ergatîfiya kurmancî

- Di demên borî da eger kar têper be, biker tewandî ye.

Mînak:

Ehmedî kar kir.

Zilanê mal paqij kir.

Min av vexwar.

- Di demên borî da eger kar têper be, berkar xwerû ye û kar li gor wê tê kêşan.

Mînak:

Mamostayan wane da.

Mamostayan wane dan.

Min tu dîtî.

Wî ez birim.

Çend nişe der barê ergatîfiyê da

- a) Di hin devokan da ergatîfi tîk çûye û li şûna cihnavên xwerû, cihnavên tewandî tîk bikaranîn. Di nivîsînê da pêwîst e mirov ergatîfiyê biparêze.

Mînak:

Awayê ergatîfiyê	Têkçûna ergatîfiyê
Mî tu dîtî.	Min te dît.
Te ez dîtîm.	Te min dît.

- b) Dema ku bikera pirhejmar veşartî be, herçiqas berkar yekhejmar be jî kar pirhejmar tê kêşan, ev yek ne li gor pîvanên ergatîfiyê ye, lê ji bo nasîna hejmara bikerê ev awa likar e.

Mînak:

Bi bikerê	Bêyî bikerê
Wan pirs min kir.	Pirs min kirin.
Wan mala xwe ava kir.	Mala xwe ava kirin.
Wan av li hev vexwar.	Av li hev vexwarin.

3.1.3.4. Dahûrandina hin risteyan

Min li Amedê pirtûka xwe nivîsî.

Hêman

min: biker

li Amedê pirtûka xwe nivîsî: pêveber

li Amedê: tîrker

pirtûka xwe: berkar

nivîsî: kar

Em dixwazin ku hûn alîgirên me bin.

Ev riste tîkel e, du hevokan dihevine; hevoka sereke "em dixwazin" û hevoka nesereke "hûn alîgirên me bin"

Hêman

em: biker

dixwazin hûn alîgirên me bin: pêveber

dixwazin: kar

Xwastin kareka têper e, lewra pêwîstî bi berkarê heye, bi pirsra em çî dixwazin, hevoka "hûn alîgirên me bin" derdikeve pêş, lewra ew hevok bi giştî dibe berkar.

hûn alîgirên me bin: berkar

Di vê berkarê da jî ev hêman hene:

hûn: biker

alîgirên me bin: pêveber

alîgirên me: temamkera bikerê

bin: kar

Ez hatim ku te bibînim.

Ev riste têkel e, du hevokan dihewîne; hevoka sereke "ez hatim" û hevoka nesereke "te bibînim"

Hêman

ez: biker

hatim te bibînim: pêveber

hatim: kar

Hatin kareka teneper e, lewra pêwîstî bi berkarê nîne. Hevoka "te bibînim" hevoka sereke ji aliyê rewş û sedemê ve zelal dike, lewra dibe *têrker*.

Ev hêman di vê *têrkerê* da hene:

te bibînim: pêveber

te: berkar

bibînim: kar

Ev zevî hatine avdan.

Hêman

ev zevî: biker

hatine avdan: pêveber

hatin: kara alîkar

avdan: kara bingehîn

3.1.3.5. Riste ji aliyê binyadê ve

3.1.3.5.1. Risteya sade

Ev riste ji hevokekê pêk tê.

Mînak:

Şivanî serdana mirovên xwe kir.

Qencî, qenciyê tine.

Zivistana îsal gelekî sar e.

3.1.3.5.2. Risteya lêkdayî

Ev riste ji du yan jî zêdetir hevokên sereke (serbixwe) pêk tê. Hevokên vê risteyê hevseng in, ango hevokên bingehîn in. Ev hevok bi bêhnok, xalbêhnok û hevghanekan bi hev ve tîr girêdan.

Mînak:

Mal dibistan e, dê û bav mamosta ne.

Rastan zewal nine; xwaran kemal nîne.

Li zanîngê dixwîne û çend karên din bi rê ve dibe.

3.1.3.5.3. Risteya têkel

Ev riste herî kêr ji hevokeka sereke (serbixwe) û hevokeka nesereke (alîkar) pêk tê. Ev hevok bêhtir bi alîkarîya bingihanekan û cihnavên pêwendiyê "a ku, ê ku, ên ku" bi hev ve tîr girêdan.

Mînak:

Dema ku min li zanîngê dixwend, ew mamosta bû.

Heta ku ew bigihîje malê, ez ê karê xwe biqedînim.

Pênûsa ku te dîyarî min kiribû, wînda bû.

Eger te waneya xwe qedand, agahîyê bide min, ji bo ku ez ji bêm.

3.1.3.6. Riste ji aliyê watayê ve

3.1.3.6.1. Risteya ragihandinî

Ev riste, kar û tevgera ku hatiye kirin, tê kirin an dê bê kirin, radigihîne. Risteyên ragihandinî bi alîkarîya raweyên ragihandinî tîr sazîrin.

Mînak:

Cotkar zevîya xwe cot dike.

Ez ê sibe biçim pêşangehê.

Ew sê rojan li Efrînê ma.

3.1.3.6.2. Risteya fermanî

Di risteya fermanî da fermanek heye ji bo ku karek bê kirin.

Mînak:

Çareyekê ji vê pirsgirêkê ra bibîne.

Wî deriyê bigire.

Îsal xaniyê xwe boyax neke.

3.1.3.6.3. Risteya pirsyarî

Ev riste bi rêya pirsê agahîyan dixwaze. Bi alîkarîya cihnav, hevalnav û hevalkarên pirsyarî tê bidestxistin.

Mînak:

Ew kî ye ji wir ve tê?

Heta kengê em ê li vir bimînin?

We çend dar çandin?

Çima kesî bersiv neda?

Nîşe: Risteyên pirsyarî bi alîkarîya awazeyê jî tîr sazîrin.

Mînak:

Hûn ê bi me ra werin?

We mêvan vexwendin?

3.1.3.6.4. Risteya dananî

Ev riste watayên xwastek, merc, divêti, dibeti û bilanîyê dide. Bi alîkarîya kar û hevalkarên raweyî tê bidestxistin.

Mínak:

Xwezî zû miradê wan bi cih bihata.

Divê hûn li paqijîya vir miqate bin.

Bila mirin hebûya, kalbûn tune bûya.

3.1.3.6.5. Risteya bangî

Ev riste hestên kêfxweşî, xemgînî, xiroş, tirs, ecibandin ... dîyar dike.

Mínak:

Ax! Derdê wî ji bîr nabe.

Wax, ev aqil nagire!

Karê wan pir bi rêk û pêk e!

Cureyên risteyên navborî, wekî erênî û neyînî dabeş dibin. Eger erênî bin, dibin risteya ragihandinî ya erênî, risteya fermanî ya erênî ... lê eger neyînî bin, dibin risteya ragihandinî ya neyînî, risteya fermanî ya neyînî ...

Risteya erênî

Mínak:

Ew di arşivê da dixebite. (risteya ragihandinî ya erênî)

Pê ra bilîzin. (risteya fermanî ya erênî)

Te ew dar çandin? (risteya pirsyarî ya erênî)

Xwezî hûn îşev biçin. (risteya dananî ya erênî)

Nîşe: Hin riste hene ku bi reng û teşeyê xwe neyînî ne, lê bi wataya xwe erênî ne.

Mínak:

Ne ku min negotîye, lê we şaş fam kirîye.

Ne ku naçe, lê li benda derfetekê ye.

Risteya neyînî

Mínak:

Ew di arşivê da naxebite. (risteya ragihandî ya neyînî)

Pê ra nelîzin. (risteya fermanî ya neyînî)

Te ew dar neçandin? (risteya pirsyarî ya neyînî)

Xwezî hûn îşev neçin. (risteya dananî ya neyînî)

Riste bi alîkarîya hevalkarên neyîniyê yên mîna "hew, qet, tu carî, na, nexêr ..." jî dibin risteyên neyînî

Mínak:

Qet haya wî ji tiştêkî nîne.

Nexêr! Em ê herin.

Na, qîma me nayê.

3.1.3.7. Veguhastina axiftinê

Carinan mirov dixwaze gotina yekî ji hinên din ra vebêje, ji vê ra gotina veguhastî tê gotin. Gotin bi du awayan tê veguhastin:

3.1.3.7.1. Veguhastina rasterast

Gotin çawa be, wiha tê veguhastin. Ev gotin di nav dunikan da tê nivîsîn.

Mînak:

Kawayî got: "Ez ji ber baranê nikarim biçim geştê."

Pêşiyên me gotiye: "Malê xirab ê xwedîyan e."

3.1.3.7.2. Veguhastina nerasterast

Di veguhastina nerasterast da gotin ne wekî çawa hatiye gotin, lê îfade û naveroka wê tê veguhastin. Ev gotin ne di nav dunikan da lê bi gihanekên "ku, ka"yê bi hevoka din ve tê girêdan.

Mînak:

Delalê got: "Ez îro naçim dibistanê." (rasterast)

Delalê got ku ew îro naçe dibistanê. (nerasterast)

Serhedî got: "Bi wan ra biçe." (rasterast)

Serhedî got ku divê ez bi wan ra biçim. (nerasterast)

Hêminî ji Ramanî pirsî: "Kê erd cot kirîye?" (rasterast)

Hêminî ji Ramanî pirsî ka kê erd cot kirîye. (nerasterast)

Di veguhastina nerasterast da hin guhartin çêdibin.

a) Dema borî ya sade dibe dema borî ya temam.

Mînak:

Rojdayê got: "Min pirtûk bir." (rasterast)

Rojdayê got ku wê pirtûk birîye. (nerasterast)

b) Kes ji tê guhartin.

Mînak:

Serdarî got: "Ez pir dixebitim." (rasterast)

Serdarî got ku ew pir dixebite. (nerasterast)

Rêberî got: "Tu bi wan ra biçe." (rasterast)

Rêberî got ku divê ez bi wan ra biçim. (nerasterast)

c) Di risteyên fermanî û xwastekî da, carinan karên mîna xwastin, şîret kirin, hêvî kirin, pêşniyaz kirin ... ji tînan bikaranîn.

Mînak:

Serdarî jê ra got: "Her sibeh werzişê bike." (rasterast)

Serdarî jê xwast ku her sibeh werzişê bike. (nerasterast)

Xezalê ji Nazdarê ra got: "Eger ew projeya xwe bihêle demeka din, dê baştir be." (rasterast)

Xezalê ji Nazdarê ra pêşniyaz kir ku eger ew projeya xwe bihêle demeka din, dê baştir be. (nerasterast)

d) Cihnav û hevalnavên nîşander ên nêzik ji eger tiştê amajekirî hîn li ber çavan be, nayên guhartin, lê eger ne li ber çavan be, bi yê dîr tînan guhartin.

Mînak:

Serhedî got: "Ev pirtûka min e." (rasterast)

Serhedî got ku ew pirtûka wî ye. (nerasterast)

Serhedî got ku ew pirtûka wî ye. (nerasterast)

e) Hevalkarên cihî "li vir, li wir" ji li gor kontekstê dikarin bînan guhartin.

Mînak:


Delalê got: "Ez li vir namînim." (rasterast)

Delalê got ku ew li wir namîne. (nerasterast)

Bahozî got: "Her tişt li wir heye". (rasterast)

Bahozî got ku her tişt li vir heye. (nerasterast)

4. WATANASÎ



Watanasî: Ew beşa zimannasîyê ye ku bala xwe dide watayê. Ev beş li ser wataya peyv, fraz û risteyan radiweste.

Pragmatîk jî qadeka din a watayê ye ku bala xwe dide axiverî ka çi dibêje û bihîzer ka çi fam dike, lê ji ber ku mijara me watanasî ye, dê tenê li ser wê bê rawestandî.

4.1. Cureyên watayê

4.1.1. Wataya bingehîn

Jê ra wataya ferhengî jî tê gotin, dema ku peyv tê gotin yekser ew wata tê bîra mirovî.

Mînak: kevir, av, ax, dar, welat, ken ...

4.1.2. Wataya mecazî

Di wataya mecazî da peyv ji wataya xwe ya bingehîn û resen dûr dikeve û bi watayeka din tê bikaranîn.

Mînak:

Kulîlkên vê dibistanê jîr in. (xwendekar)

Ez bi vî karî ra mirim. (westîn)

Gula min hat. (keç)

4.2. Têkiliya watayî ya di navbera peyvan da

Dema ku mirov bala xwe dide peyvan, diyar dibe ku peyv di nav têtikilyeka watayî da ne. Hin peyv hene hevwatera ne, hin diwatera ne, hin jî hevnav in. Têtikilya watayî bala xwe dide van alîyan.

4.2.1. Peyvên hevwatera

Peyvên ku nivîsa wan cuda ye, lê wataya wan yek e û pir caran li şûna hev tîn bikaranîn.

Mînak:

poz	bêvil
kevir	ber
livîn	lebitîn
nivîstin	raketin
kêşe	arîşe

Carinan hin peyv hene tevî ku hevwatera ne, lê nikarin di risteyê da cihê hev bigirin. Ji ber vê yekê di hevwaterayê da hevwateraya temam û netemam heye.

Hevwateraya temam

Mebest jê ew e ku peyvên hevwatera dikarin di risteyê da li şûna hev werin bikaranîn, bêyî ku tu guhartin di wataya risteyê da çêbe.

Mînak:

Ew li ser banî nivîstîye.

Ew li ser banî raketîye.

Ew li ser banî razaye.

Hevwateraya netemam

Ev peyv ne hertim dikarin li şûna hev bîn bikaranîn; carinan cihê hev digirin, carinan jî nikarin cihê hev bigirin.

Mînak:

Biha/giran

Ev tişt giran (biha) e, ji me nayê em bikin.

Ev tişt giran e, ez nikarim ji erdê rakim.

Di mînaka yekem da peyvên "biha û giran"ê dikarin li şûna hev werin bikaranîn. Lê di mînaka duyem da mirov nikare peyva "biha"yê li şûna peyva "giran"ê bi kar bîne.

4.2.2. Peyvên dijwatera

Ew peyv in ku ji aliyê watayê ve dijberî hev in.

Mînak:

spî	reş
ronahî	tari
sar	germ
baş	xirab
jîyan	mirin
frotin	kirin

Di mijara dijwaterayê da jî hin peyv hene ku tam li dij hev in. Hebûna yekê tê wataya nebûna ya din, wekî "sax û mirî, şîn û şahî ..." ev peyv bi pileyan nayên pîvan, ango mirov nikare bibêje "hinekî sax e" yan jî "hinekî mirî ye". Lê hin peyv hene herçiqas dijwatera ne lê pile di navbera wan da hene, wekî peyvên "mezin û biçûk"ê dikarin wekî mezintir û biçûktir, gelekî mezin û gelekî biçûk ... bîn pîvan.

4.2.3. Peyvên hevnav

Ew bêje ne ku navên wan yek in, lê wataya wan cuda ye, hevnavî di axiftinê da hevdengan, di nivîsînê da jî hevtîpan digire nava xwe.

4.2.3.1. Peyvên hevdeng

Ew peyv in ku dengên wan yek in, lê wataya wan cuda ye. Di kurmancîyê da peyvên hevdeng hevtîp in, lê di hin zimanan da carinan peyvên hevdeng ne hevtîp in. Wekî nimûne, di îngilîzîyê da peyvên "see û sea"yê hevdeng in lê ne hevtîp in.

Mînak:

xal: birayê dayikê	xal: niqte
gav: dem	gav: gavên meşê
rovî: ajel	rovî: hinav

4.2.3.2. Peyvên hevtîp

Ew peyv in ku nivîsa wan yek e, lê deng û wataya wan ji hev cuda ne.

Mînak:

par: sala borî	par: beş
ker: kesê ku nabihîze	ker: ajel
gir: cihê bilind	gir: rik

4.2.4. Pirwatayî

Hin peyv hene zêdeyî watayekê didin, pirwatayîya peyvyan bêhtir di konteksta risteyê da diyar dibe.

Pirwatayî ji aliyekî ve barê zimanî sivik dike, îro ji encama dahênan û pêşketina mêjîyê mirovahîyê, bi hezaran tişt derketine, li şûna ku mirov ji bo her tiştêkî peyveka nû çêke, peywir û erka peyvyan tê zêdekirin. Bo nimûne, peyva "kar"ê ji bo xebatê tê bikaranîn û îro wekî termeka rêzimanî jî cih girtiye.

Mînak:

ajotin

Wî erebe ajot. (meşandin)

Civîna me saetekê ajot. (dirêj kir)

Ew hîn erdê xwe bi gayan diajo. (cot kirin)

Ser

Serê min diêşe. (serê mirovî)

Em hîn negihane serê çemî. (destpêk)

4.2.5. Cotpeyv

Cotek peyv e ku bi hev ra tê û di risteyê da wekî hêmanekê tev digere. Ji bo ku wataya vegotinê xurttir û tekûztir bibe, mirov wan bi kar tîne.

Mînak:

şert û merc, dê û bav, pîr û ciwan, xwişk û bira, hûr û girs, cih û war, dar û ber, bejn û bal, dost û yar, cil û berg, hiş û sewdan, kul û derd, şîn û şahî, fen û fût, dek û dolab ...

Cotpeyvên hevwatera: şert û merc, heval û hogir ...

Cotpeyvên diwatera: yar û neyar, baş xirab, kêr zêde ...

Cotpeyvên nêzwata: çol û çiya, dar û ber ...

4.3. Yekeyên watayê

4.3.1. Morfema bend

Yekeya herî biçûk a watayê ye ku bi tena xwe nayê bikaranîn û watayê nade, lê li gel morfemên serbixwe tê bikaranîn.

Mînak: daristan, mirovatî, vexvarin, rabûn ...

4.3.2. Bêje

Yekeya watayê ya ji morfemê mezintir e.

Mînak: dar, ax, kirin, çûn, hildan, bejnbilind, rûbiken, zû ...

4.3.3. Fraz

Yekeya watayê ya ji bêjeyê mezintir e; çend bêje ne ku bi hev ve girêdayî ne. Fraz yekeyeka watayê ye ji ber ku ne hertim peyvên ku di frazê da cih digirin wataya xwe ya bingehîn didin, carinan watayeka din ji didin.

Bo nimûne, "Serê Kanîyê", mebesta me jê ne serkanî ye, lê belê navê bajarekê Kurdistanê ye.

Mînak:

Girikê Legê

Kanîya Kurdan

4.3.4. Riste

Ew yekeya watayê ye ku ji rêzileyeka bêjeyan pêk tê. Hinek zimannas vê yekeya watayê wekî yekeya herî girîng dibînin, heta ji peyvên girîngtir dibînin. Ji ber ku li gor wan peyv bi tena xwe nayê bikaranîn, lê belê di risteyê da tê bikaranîn. (عمر, 1998: 38)

Mînak:

Ehmed Azadî dibîne.

Zinê gul av dan.

4.3.5. Deq (text)

Deq ew yekeya watayê ye ku ji çend risteyên têkildarî hev pêk tê.

Yekeyên watayê yên wekî, biwêj, gotin û gotarê ji hene ku yekeyên pragmatîkê ne.

4.4. Rolên watayî

Hêmanên risteyê yên wekî biker, berkar û hwd ne hertim bi pênaseya xwe ra diguncin. Bo nimûne, biker ne hertim bi kar radibe. Ji bo ku ev pirsgirêk çare bibe, hêmanên risteyê ji hêla watayê ve ji tîr dabeşandin. Di vê dabeşandinê da cihê hêmanê di risteyê da li ber çavan nayê girtin, lê belê wata û rola hêmanê ya rasteqîne di risteyê da li ber çavan tê girtin. (دزویی, 2015: 96)

Hêmanên risteyê ji aliyê watayê ve:

4.4.1. Kara

Ew hêman e ku bi karî radibe, bi karên tevgerî ra tê.

Mînak:

Ehmed çû malê.

Wan dar birî.

4.4.2. Kartêkirî

Ew hêman e ku kar li ser tê kirin.

Mînak:

Azadî pirtûk xwend.

Derî vebû.

Di mînaka yekem da berkar bûye kartêkirî, lê di mînaka duyem da "derî" herçiqas ji hêla ristesaziyê ve "biker" e, ji hêla watanasîyê ve bûye "kartêkirî", ji ber ku di rastîyê da "derî" yî tu kar nekiriye lê belê kar li ser hatiye kirin.

4.4.3. Taqîker

Bi karên rewşê ra tê ku di wan da bizavek nîne. Li vir biker tişteki nake, bi tenê di rewşekê ra derbas dibe.

Mînak:

Delalê dengêk bihist.

Me ajelek dit.

4.4.4. Wergir

Ew hêman e ku tişteki werdigire.

Mînak:

Min gulek da Dilanê.

Wî ji min ra bazinek anî.

4.4.5. Encam

Ew hêman e ku ji encama karekî çêbûye.

Mînak:

Min name nivîsî.

Wan xaniyek ava kir.

4.4.6. Navgîn

Ew hêman e ku kar pê tê kirin.

Mînak:

Bahozî bi kilidê derî vekir.

Wan bi tirimbêlê rê girt.

4.4.7. Cih

Ew hêman e ku cihî nîşan dide.

Mînak:

Çivîk li ser darê ye.

Dibistan dûr e.

4.4.8. Wext

Ew hêman e ku wextî diyar dike.

Mînak:

Em par çûn seyranê.

Îşev dinya hênîk e.

4.4.9. Jêderk û armanc

Dema ku bûyer ji cihekî ber bi cihekê din ve diçe, cihê jêderketinê "jêderk" e û cihê çûnê "armanc" e.

Mînak:

Delal ji sûkê hat pirtûkxaneyê.


(sûk jêderk e û pirtûkxane armanc e.)

Dilgeş ji malê çû dibistanê.

(mal jêderk e, dibistan armanc e.)

5. RASTNIVÎSÎN

R



Rastnivîsîn: Rê û rêgezên nivîsîna zimanekî nişan dide. Ew rê û rêgez li gor hin pîvanên lihevkerî diyar dibin.

5.1. Nivîsîna tîpên girdek û hûrdek

Di van rewşan da tîpên girdek tîpên nivîsîn:

a) Riste bi tîpên girdek dest pê dike.

Mînak:

Ken ji dilê geş tê, baran ji ewrên reş tê.

Ber li cihê xwe biqedir e.

Em ji hevalê xwe bi dûr ketin.

b) Nav û paşnavên mirovan bi girdekan dest pê dikin.

Mînak:

Melayê Cizîrî, Reşîdê Kurd, Celadet Bedirxan ...

c) Nasnavên (leqeb) mirovan dema ku bi navên wan ra bûbin yek, wekî navên taybet tîpên hesibandin û bi girdekan dest pê dikin.

Mînak:

Kawayê Hesinkar

Mîr Celadet Bedirxan

Qazî Mihemed

d) Navên xweda, firîşte, pirtûkên pîroz û cihên olî (mizgeft, dêr, kilîse ...) bi tîpên girdek dest pê dikin.

Mînak:

Yezdan, Xweda, Cebrail, Ezraîl, Îsrafil, Avesta, Quran, Tewrat, Încil, Zebûr, Mizgefta Mezin, Dêra Dêrikê, Kilîseya Ezrayê ...

e) Navên lehengên çîrok û efsaneyan bi girdekan dest pê dîkin.

Mînak:

Zerka Zêran, Şahmaran, Libhinarok, Pepûkê ...

Di çîrokê da Zerka Zêran xwişka heft birayan e.

Ji tîrsa jinbava xwe, Pepûkê birayê xwe kuşt.

Li gor efsaneyê, Şahmaran nîvmar û nîvmirov bû.

f) Navên gund, bajarok, bajar, welat û parzemînan bi girdekan dest pê dîkin.

Mînak:

Endîwer, Amed, Kurdistan, Sûriye, Afrîka, Amerîka, Asya ...

Ava Mezin di gundê Endîwerê ra derbas dibe.

Navenda wan li Amedê ye.

Gelek çiyayên Kurdistanê hene.

g) Navên kolan, tax û meydanan bi girdekan dest pê dîkin.

Mînak:

Meydana Azadiyê, Qada Şehîdan, Taxa Sor, Taxa Qidûrbegê, Kolana Avestayê ...

21ê Adarê dê li Meydana Azadiyê bê pîrozkirin.

Ew ji Taxa Qidûrbegê ye.

Pêşangeha wêneyên dijital li Kolana Avestayê tê lidarxistin.

h) Navên birc, kele, pir û parkan bi tîpên girdek dest pê dîkin.

Mînak:

Birca Belek, Parka 19ê Tîrmehê, Parka Vejinê, Pira Dehderî, Keleya Dimdimê ...

Birca Belek li Cizîrê ye.

Pira Dehderî li Amedê ye.

Her sal festîvalên hunerî li Parka Vejinê çêdibin.

i) Navên çem, rûbar, derya, kendav, gol, okyanûs, deşt û çiyayan bi tîpên girdek dest pê dîkin.

Mînak:

Ava Spî, Çemê Dicleyê, Çemê Xabûrê, Çemê Firatê, Gola Wanê, Okyanûsa Hindê, Kendava Besrayê, Deşta Hesinan, Deşta Heranê, Deşta Cizîrê, Çiyayê Nemrûdê ...

Nîşe: Dema ku peyvên wekî "çem, rûbar, derya, kendav, gol, okyanûs, deşt û çiya" bi navên xwe yê taybet ra bîn, dibin parçeyek ji nav û ew jî bi tîpên girdek dest pê dîkin.

Mînak:

Gelek bendav li ser Çemê Dicleyê hatine avakirin.

Gola Kurdistanê ya herî mezin Gola Wanê ye.

Bajarê Dêrikê li Deşta Hesinan hatiye avakirin.

j) Navên stêr, gerestêr û peykan gava ku di stêrnasîyê da wekî navên taybet bên bikaranîn, bi tîpên girdek dest pê dikin:

Mînak:

Gelawêj, Heyv, Roj, Erd, Kadiz, Neptun, Jupîter, Venus ...

Stêrka sibehê Gelawêj e.

Heyv^[31] li dora Erdê dizivire.

k) Navên pirtûk, kovar, rojname û sernavên gotar û nivîsan bi tîpên girdek dest pê dikin.

Mînak:

Kovar: Kovara Hawarê, Kovara Ronahîyê

Rojname: Rojnameya Xwebûnê, Rojnameya Kurdistanê

Pirtûk: Dîroka Wêjeya Kurdî, Rêzimana Kurmancî

Sernav: Bikaranîna Gireyan, Peyvsaziya Karan

Alfabeya kurmancî ya latînî cara yekem di Kovara Hawarê da hatiye weşandin.

Gelek mijar di Rojnameya Xwebûnê da hene.

Li zanîngê gotara bi navê Peyvsaziya Karan hat nîqaşkirin.

Mîna ev mijar di pirtûka Rêzimana Kurmancî da xwendibû.

l) Navên sazî, dezgeh, deste, dadgeh, şaredarî, enstîtu, şirket, bank û komeleyan bi tîpên girdek dest pê dikin.^[32]

^[31] Gava ku peyvên wekî, دنیا, erd, roj, heyv ne wekî navên stêr, gerestêr û peykan bin bi tîpên hûrdek tîpên nivîsîn.

^[32] Dema ku mebest ne navê sazî yan jî komeleyeka taybet be, tîpa pêşîn bi hûrdekê tîpên nivîsîn.

Mînak:

Sazîya Zimanê Kurdî

Desteya Perwerde û Fêrkirinê

Şaredarîya Amedê ya Mezin

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Banka Şamê ya Navendî

Komeleya Lêkolînên Kurdî

m) Navên partî, tevger û rêxistinên bi tîpên girdek dest pê dikin.

Mînak:

Tevgera Ziman û Çandê

Rêxistina Kar û Barên Xwendekaran

Dadgeha Gel a Qamişloyê

n) Navên qanûn, destûr û biryarnamayan bi girdekan dest pê dikin.

Mînak:

Qanûna Trafikê ya Giştî

Destûra Encûmena Qanûnsaz

Hevpeymanîya Civakî ya Rojavayê

o) Navên aliyan gava ku wekî navên herêman ango bi warayeka taybet bên bikaranîn, bi tîpên girdek dest pê dikin.

Mînak:

Li Rojavayê zarok bi kurdî dixwînin.

Amerîkaya Başûr parzemîneka nû ye.

Li Rojhilata Navîn gelek cihên dîrokî hene.

p) Navên peyman, şer û serdemên dîrokî bi girdekan dest pê dîkin.

Mînak:

Peymana Lozanê

Şerê Cihanê yê Yekem, Şerê Kendavê

Serdema Kevirîn, Serdema Neolîtîkê

q) Navên roj, cejn û serdemên taybet bi tîpên girdek dest pê dîkin.

Mînak:

Her sal Cejna Karkeran tê pîrozkirin.

15ê Gulanê Roja Zimanê Kurdî ye.

Cejna Remezanê cejneka olî ye.

r) Peyvên ku piştî xal, pirsnişan, bangnişan û cotxalê tên, bi tîpên mezin dest pê dîkin.

Mînak:

Cotkar rojane diçin cot. Karê wan pir zor e. Berêvarkî vedigerin malê.

Gelo hûn ê kengê biçin bazarê? Dema ku hûn çûn, gazî min jî bikin.

Wax wax! Ev çi bela bû bi serê me da hat.

Pêşiyên me gotiye: "Bi gotinan ziv nabe zêr."

Nîşe: Dema ku piştî cotxalê mînak bên rêzkerin, mînaka pêşîn jî bi hûrdekê dest pê dîke.

Mînak:

Di wê mijarê da gelek peyvên cuda hene, weki: hevalnav, hevalkar, kar, navdêr ...

Di van rewşan da tîpên hûrdek tên nivîsîn:

a) Hemû navdêrên cureyî bi hûrdekan dest pê dîkin

Mînak:

dar, çiya, çem, kolan, tax, pirtûk, rojname, kovar, dibistan, çav, aqil, derî ...

b) Navên gel û neteweyan bi hûrdekan tên nivîsîn.

Mînak:

kurd, ereb, faris, inglîz ...

c) Navê ziman û zaravayan bi hûrdekan dest pê dîkin.

Mînak:

Ziman: kurdî, erebî, farisî, inglîzî ...

Zarava: kurmancî, zazakî ...

d) Navên ol, bawerî û mezheban bi hûrdekan dest pê dîkin.

Mînak:

êzidîtî, misilmantî, xirîstîyanî, elewîtî, ortodoksî ...

e) Navên êl û hozan bi hûrdekan tên nivîsîn.

Mînak:

harûnî, bawelî, goyî, berazî, hesinî, şêxbizinî, mîrî ...

f) Peyvên ku ji navên ol, felsefe, kes û cihan hatine çêkirin û mensûbîyetê nîşan didin, bi hûrdekan dest pê dikin.

Mînak:

manîzm, marksîzm, amedî, dihokî, cizîrî, kurdistanî, almanî ...

g) Navên hêlan bi hûrdekan dest pê dikin.

Mînak:

Li başûrê Kurdistanê şikeftoka dîrokî heye.

Qamişlo li rojhilatê Sûrîyeyê ye.

h) Daçek, gihanek û gireyên îzafeyê gava ku di sernavan da wekî peyvên serbixwe bînin, bi hûrdekan dest pê dikin.

Mînak:

Rêzimana Zazakî ya Devoka Gimgimê

Rastnivîsîn û Rêzimana Kurmancî

Pêşangeha Ş. Herekol ya Qamişloyê

Nivîsîna Gireyan di Kurmanciyê da

5.2. Nivîsîna "î, ê" ya berî "y"yê

Herçiqas berê ji hêla Celadet Bedirxanî ve hatibû diyarkirin ku dengên "î û ê"yê berî "y"yê sivik dibin û dibin "î", lê ji ber ku vê rêgezê bandor li dirûvê peyvê dikir, a baştir ew e ku mirov wêneyê peyvê biparêze û tîpên "î, ê"yê neguhêre.

Li gor Rêbera Rastnivîsînê tîpa "î"yê di zazakî û soranîyê da ji berî "y"yê wekî xwe tê nivîsîn. (Rêbera Rastnivîsînê, 2019: 54)

Mînak:

Hêviya me

Rêwiyê jar

Hevaltiya rast

Vîyan

Jîyan

Dîyar

Rêya gundî

Dêya min

Nîşe: Baştir e ku peyvên wekî çiya, ziyaret, siyaseta, qiyas, xiyana, nîyaz, nîyet, pêşniyaz, gîyan, gîya, zîyan ... ji bi "î"yê bînin nivîsîn, ji ber ku di bilêvkirin û kîtekirina van peyvên da ji "î" tê bilêvkirin ne "i".

5.3. Nivîsîna paşdaçekan

Bedirxan û Lescotî di rêzimana xwe da awayê "de, re, ve" hilbijartîye. Herwiha wan dîyar kirîye ku di piraniya devokan da û bi taybetî di yên rojavayê da ew dibin "da, ra, va" (Bedirxan û Lescot, 1970: 242-243)

Bozarlanî di pirtûka xwe ya *"Baxçeyê zimên"* da zelal kirîye ku hem li gor peyivîna piranîya gelê kurd hem jî li gor edebîyata kurdî ya klasîk û folklorîya kurdî, divê paşdaçek bi awayê "da û ra"yê bînin nivîsîn, ne "de û re". (Bozarlan, 2008: 193)

Bahoz Baran dibêje ku du awayên paşdaçekan hene, "da, ra, va" û "de, re, ve". Baran diyar dike ku di nivîsê da awayê "de, re, ve"yê zêdetir hatiye bikaranîn ji ber ku Celadet Bedirxanî di Hawarê da ew bi kar anîye, lê ew zelal dike ku hem li erdnîgarîya Kurdistanê hem di klasîkên kurdî da hem jî di zaravayan da û di zimanên heman malbatê da dengê "a"yê serdest e. Lê ji bo "va"yê dibêje ku di klasîkan da "ve" hatiye bikaranîn û di berhemên folklorîk da jî "ve" lipêş e. Ji ber van sedeman wî awayê "da, ra, ve"yê hilbijartîye. (Baran, 2018: 132-133)

Li gor Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê, paşdaçekên kurmançî bi sê awayan derdikevin pêş, her sê awa jî ev in: "da, ra, va" "de, re, ve" "da, ra, ve". Komxebatê awayê sêyem ango (da, ra, ve) wekî standard tercîh kirîye (Rêbera Rastnivîsînê, 2019: 170)

Ji bo van sedemên ku li jor hatine dayîn û ji bo standardiyê awayê "da, ra, ve"yê hatiye hilbijartin.

5.4. Dubarekirina tîpekê

Di van rewşan da heman tîp tê dubarekirin.

a) Gava ku bêjeyên dariştî û lêkdayî saz dibin.

Mînak:				
bê	+	êl	→	bêêl
bê	+	êş	→	bêêş
ne	+	erzan	→	neerzan

dest	+	teng	→	destteng
kiras	+	sor	→	kirassor
ziman	+	nas	→	zimannas

b) Di neyînîkirina karan da:

Mînak:				
na	+	axêv	→	naaxêve
na	+	avêj	→	naavêje

c) Di berawirdiyê (hevrûkirin) da:

Mînak:				
kurt	+	tir	→	kurttir
rast	+	tir	→	rasttir
xurt	+	tirîn	→	xurttirîn

5.5. Nivîsîna gireya neyînîyê "ne-"

a) Di neyînîkirina karan da bi karan ve tê nivîsîn.

Mînak:	
Ez	neçûm şahiyê.
Ew	nehatibûn serdana wan.
Me	bi gogê nedilist.

b) Gava ku hevalnavêk an navdêrek pêk anibe, dibe pêşgir û bi peyvê ve tê nivîsîn

Mînak:

Ehmed nexweş e.

Em rastî çiyayekê nebilind hatin.

Van cilên neşûştî bişo.

Gulên avnedayî av bide.

Van cilên ranexistî raxin.

Haya te ji neqencan hebe.

Nezanî ji zordestîyê xirabtir e.

Wan nîyaza karnekirinê xistiye dilê xwe.

Nîşe: Rewşa karên lêkdayî yên ku bi "bûn"ê çêdibin cuda ye; gava ku "bûn" a rewşê be gireya "ne" yê tê destpêka kara lêkdayî, lê gava ku "bûn" a guhartina rewşê be, gireya "ne" yê tê pêşîya "bûn"ê.

Mînak:

Nezelalbûna rewşê bandor li karî kir. (rewş)

Zelalnebûna rewşê bandor li karî kir. (guhartin a rewşê)

c) Gava "ne" neyînîkirina kara "bûn"ê ya rewşê be, cuda tê nivîsîn.

Mînak:

Ev ne Ehmed e.

Baxçeyê wan ne mezin bû.

Kesê ku behsa wî dikin, ne ez im.

d) Herçiqas kêr be, carinan hevalkar jî tîn neyînîkirin, gava "ne" hevalkaran neyînî bike, cuda tê nivîsîn.

Mînak:

Em ne bi serbestî diçin û tîn.

Ew ne bi kêfxweşî alikariya karkeran dike.

Ew ne bi dilê xwe vê xwarinê dixwe.

5.6. Nivîsîna daçekên "bi" û "bê"yê

a) Dema ku wekî daçekeka serbixwe yan beşek ji daçek a lêkdayî bin, cuda tîn nivîsîn.

Mînak:

Ew bi pênuşê dinivîse.

Bê te ev der sar e.

Bi ser avê ket.

Kes bi qasî wî nizane tiştan ji hev derxe.

b) Dema ku hevalkarek pêk anîbin, cuda tîn nivîsîn.

Mînak:

Bê guman, her tişt wiha nabe.

Bi zorê nabe, bi xweşî wan bide famkirin.

Ez bi lez jî wir dûr ketim.

c) Dema ku hevalnavek pêk anîbin, dibin pêşgir û bi peyvê ve tîn nivîsîn.

Mînak:

Mala bêsermîyan wekî pezê bêşivan e.

Dijminê bîaqîl, ji dostê bêaqîl çêtir e.

Dara zeytûnê dareka bisûd e.

d) Dema ku navdêrek pêk anîbin, dibin pêşgir û bi peyvê ve tên nivîsîn.

Mînak:

Mala bêkaran tazi û rijî ye.

Bêdengîya wan ne baş e.

5.7. Ketina "bi-"ya dananîyê ji kara bûnê

Kara "bûn"ê du watayan dihevine; rewş û guhartina rewşê. Di kêşana "bûn"ê a rewşê da gireya "bi"yê dikeve.

Mînak:

Eger av sar be, ez ê vexwim.

Bila rê be, bila dûr be.

Xwezî ez zarok bûma.

Piroz be.

Noşican be.

5.8. Nivîsîna gireyên kesî (im/me, î/yî, e/ye, in/ne)

Gireyên kesî bi karan ra tên û bi wan ve tên nivîsîn.

Mînak:

Ez dixwînim.

Tu dixwînî.

Ew dixwîne.

Em dixwînin.

Hûn dixwînin.

Ew dixwînin.

Nîşe: Dema ku "im/me, î/yî, e/ye, in/ne" bi navdêr, hevalnav, cihnav û hevalkaran ra tên ne gire ne, kara "bûn"ê ne, lewra di van rewşan da cuda tên nivîsîn.

Mînak:

Ew war e, lê ne ew bihar e.

Tu bar î ne heval î.

Ev cîranên hev in.

Dildar birayê min e.

Ez li vir im.

Bozan li jor e.

Çîyayên me bilind in.

Ev gul geş e.

5.9. Nivîsîna hin peyvan

- "çiqas, evqas, ewqas, evçend, ewçend, herçiqas, herwiha, herwekî, herwisa, hertim ..."

Ev peyv bi hev ve tên nivîsîn.

Mînak:

Çiqas xwarin maye?

Ewqas ked di ber da hat dayîn.
Herçend dixebite, ewçend zana dibe.

- Nivîsîna peyvên "roj baş, beyanî baş, êvar baş, şev baş, dem baş, dest xweş, malî ava, spas xweş ..."

Ev peyv ji hev cuda tèn nivîsîn.

Mînak:
Roj baş xwendekarino!
Êvar baş geli gundîyan!
Malî ava, qencîya te ji bîr nakim.
Dest xweş, te textsîr nekir.

5.10. Nivîsîna karên lêkdayî

Di van rewşan da ji hev cuda tèn nivîsîn:

- a) Dema ku li gor dem û raweyan tèn kêşan, ji hev cuda tèn nivîsîn.

Mînak:
Hûn dê çî ji mêvanan ra amade bikin?
Me îro civîna xwe li dar xist.
Azmûnên me bi dawî bûn.
Ew li nûçeyan temaşê dike.

b) Di raderê da

Mînak:
Amade kirin, av dan, dest pê kirin, hişyar bûn, li dar xistin, jê kirin, bi ser ketin ...

Di van rewşan da bi hev ve tèn nivîsîn:

- a) Gava ku wekî navdêran bèn.

Mînak:
Avakirin li bajarî zêde bûye.
Bikaranîna kompîterê kar hêsan kirîye.
Bi avdanê dar geş dibin.

b) Di avaniya pasîf da

Mînak:
Ji malperên înternetê gelek agahî tèn bidestxistin.
Di meha adarê da gelek kargeh dê bèn çalakkirin.
Xwendekarên jîr di şahiyê da hatin xelatkirin.

c) Di avaniya hokarî da

Mînak:
Gundî mizgeftê didin avakirin.
Wî kargeha xwe bi karkeran da paqijkirin.
Şaredariyê gelek projeyên nû dane destpêkirin.

e) Dema ku wekî hevalnav bèn.

Mînak:

Xanîyê avakirî ji binî ve hilweşîya.

Dara zerbûyî ji nû ve şîn dibe.

Pirtûkên amadekirî bi xwe ra bînin.

5.11. Nivîsîna cotpeyvan

Dema ku mirov bala xwe dide cotpeyvan, dibîne ku çend awayên cuda yên nivîsîna wan hene.

a) Cotpeyvên ku bi gihaneka "û"yê çêdibin, cuda tèn nivîsîn.

Mînak:

dar û ber

dek û dolab

fen û fût

şer û pevçûn

çûn û hatin

b) Cotpeyvên ku bi dubarekirinê çêdibin, cuda tèn nivîsîn.

Mînak:

cuda cuda, hêdî hêdî, zêde zêde

c) Cotpeyvên ku bi "bi, bê"yê û gihaneka "û"yê çêdibin, wekî: bi nav û deng, bi qedir û qîmet, bi rêk û pêk, bi dar û ber ...

• Dema ku dibin hevalkar cuda tèn nivîsîn.

Mînak:

Ew **bi rêk û pêk** tev digere.

Ew **bi lez û bez** hat.

• Dema ku dibin hevalnav cuda tèn nivîsîn.

Mînak:

Zevîya **bi xêr û bêr**

Kesê **bi nan û xwê**

"Di welatê kurdan da bi nav û deng e." (Hawar, c2: 692)

"Çiya û avên wê gelek bi xêr û bêr in." (Hawar, c2: 1135)

"Aporê - Ji mirovê şaş û bê ser û ber re tê gotin." (Ronahi, c1: 520)

• Bikaranîna van cotpeyvan wekî navdêr kême, lê dema ku wekî navdêr bèn bi hev ve tèn nivîsîn.

Mînak:

Vê bêserûberiyê

Binavûdengîya wan

Birêkûpêkî di karî da baş e.

5.12. Nivîsîna hejmarnavan

Hejmarnavên bingehîn: sifir, yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yazdeh, duwazdeh, sêzdeh, çardeh, panzdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, bist, sih, çil, pêncî, şeşt, heftê, heştê,

nod, sed, du sed, sê sed, çar sed, pênc sed, şeş sed, heft sed, heşt sed, neh sed, hezar, du hezar, sê hezar, milyon, du milyon, sê milyon, milyar ...

Mînak:

Me çar pirtûk dane çapkirin.

Bîst û pênc xwendekar hatin bajarî.

Sêzdeh xanî hatin avakirin.

Panzdeh dar hişk bûn.

Hejmarnavên rêzîn

Di kurmanciyê da hejmarnavên rêzîn bi du awayan tên bidestxistin; bi alîkarîya gireya "-em" û "-emîn"ê û bi alîkarîya gireyên tewangê. Li gor Rêbera Rastnivîsînê, ya baş ew e ku mirov gireya "em"ê ji bo standardbûnê bi kar bîne. (Rêbera Rastnivîsînê, 2019: 188)

Mînak:

Kevok li ser qata çarem xuya dibin.

Me lêkolîna xwe di roja dehem da bi dawî kir.

Cara sêyem bi ser ket.

Hejmarnavên hevalkarî

yek bi yek, çar bi çar, deh bi deh, sed bi sed, yeko yeko, şeşo şeşo, bîsto bîsto ... yeke yek, dehe deh, bîste bîst, sede sed ...

Mînak:

Vexwendî yeko yeko derbasî malê dibûn.

Em sê bi sê li nav gundî digerîyan.

Me zebeş dehe deh kom dikirin.

Hejmarnavên dabeşî

çaryek, nîv, sêyek, yek û nîv, ji çaran sê, ji pêncan du, ji dehan şeş, ji sedî sih, ji hezarî sed ...

Mînak:

Wî çaryek kilo dendik kirî.

Nîv nanî bide wê zarokê.

Ev mijar ji sedî sih ne zelal bû.

Ji hezarî sed wiha nake.

[Faint, illegible text on a cream-colored page, likely bleed-through from the reverse side.]

[]

6. XALBENDÎ

;

!



”

(-)



• • •

Xalbendî ew nîşandek in ku di nivîsînê da tîn bikaranîn, bi rêya xalbendîyan avahiya risteyan diyar dibe û cihê rawestan û bêhnvedanê, tixûbê fraz, hevok û risteyan ji hev tîn cudakirin. Herwiha xalbendî xwendinê hêsan dikin û têgihîştinê zelal dikin.

6.1. Nîşandekên xalbendiyê

Nîşandekên xalbendiyê ev in:

1. Navber	
2. Xal	.
3. Bêhnok	,
4. Xalbêhnok	;
5. Cotxal	:
6. Sêxal	...
7. Pirsnişan	?
8. Bangnişan	!
9. Dunik	“ ”
10. Yeknik	‘ ’
11. Ducarek	” ”
12. Dabir	’
13. Bendik	-
14. Xêzik	—
15. Xwarexêz	/
16. Kevanek	()
17. Goşebend	[]

6.1.1. Navber

a) Di navbera hemû bêjeyan da navber tê danîn.

Mînak:

Ew çû dibistanê.

Zanîngeha Rojavayê li Qamişloyê ye.

b) Piştî hin nişandekên xalbandiyê navber tê danîn.

Mînak:

Dema ku sibehê diçûm bajêr, min Azad dit. Min jê pirsî: "Gelo tu ji ku derê têtî?" Got: "Ez ji Amedê têm."

6.1.2. Xal .

a) Xal li dawîya risteyan tê danîn.

Mînak:

Dem tiriyê tirş şîrîn dike.

Ez bi hatina te kêfxweş dibim.

Ew havînan li zozanan dimîne.

b) Di kurtkirinên birî da li ber kurteyê xal tê danîn.

Mînak:

Prof. Qanatê Kurdo pirtûka bi navê "Tarîxa Edebiyeta Kurdi" nivîsiye.

C. Bedirxani bîngeha rêzimana kurmancî ya latîni danîye.

gih. gihanek

c) Di nivîsîna mêjûyê (dîrok) da di navbera roj, meh û salê da tê danîn.

Mînak:

21.03.2004

15.05.2021

6.1.3. Bêhnok ,

Bêhnok nişandeka bêhnvedan û vehesînê ye, di van rewşan da tê bikaranîn.

a) Di navbera peyvên hempeywir da ku li pey hev tîn.

Mînak:

Dîlan, Zîlan û Ehmed çûn bajarî.

Ez ji xwendina pirtûk, rojname û kovaran hez dikim.

b) Di navbera hevokên serbixwe yê risteya lêkdayî da.

Mînak:

Aş dike, aşvan dixwe.

Mal dibistan e, dê û bav mamosta ne.

Hûr binêre, kûr binêre, dûr binêre.

c) Di navbera hevokên sereke û nesereke yê risteya têkel da.

Mînak:

Eger baran raweste, em ê biçin seyranê.

Dema ku min ew dit, berê wî li malê bû.

Ku tu bi min ra werî, em ê zû biçin.

d) Dema ku hevalkarên cextdar, nirxandin û neyînîyê wekî "helbet, xweşbextane, erê, belê, tamam, na, baş e, erê wele, na wele, rast e ..." li serê risteyê cih digirin, piştî wan bêhnok tê bikaranîn.

Mînak:

Erê, em ji hatin.

Na, ez ne ji Efrînê me, ez ji Qamişloyê me.

Baş e, ez ê jê ra bibêjim.

e) Di hemanên navberî da^[33]

Mînak:

Keça min, Delal, bi ser ket.

Apê min, xwedanê kargehê, ne li vir e.

Çend caran, ku ez ne şaş bim, min jê ra gotiye.

f) Di risteyên dirêj da ji bo ku bikerê ji hemanên din veqetîne, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak:

Mamostayî, piştî çend saetên dersê, pirsek ji xwendekaran kir.

Xwendekar, ji bo ku di azmûnê da bi ser bikevin, pir dixebitin.

g) Di navbera navê cihan û dîrokê da

Mînak:

Amed, 05.05.2020

Qamişlo, 20.04.2019

^[33] Hin nivîskar di vê rewşê da bendikê ji bi kar tinin. Mînak: Çend caran -ku ez ne şaş bim- min jê ra gotiye. Lê ya jê berbelavtir bêhnok e.

h) Di bangkirinê da

Mînak:

Hevalino, werin em bixwînin.

Kanîwar, ka were vir.

Gelî hevalan, ez ji dixwazim tişteki bibêjim!

6.1.4. Xalbêhnok ;

a) Ev nîşandek dikeve navbera du hevokên sereke yê risteyekê ku têkilîyeka watayî di navbera wan da heye.

Mînak:

Nîvhekîm mirovî ji can; nîvmela mirovî ji îman dike.

Mirov bi zanîn û exlaqê xwe tîn nasîn; ne bi mal û milkê xwe.

Dar bi xwedîkirinê; mirov bi gotinê mezin dibe.

Xwe nêzikî wî mirovî neke; ew karên xirab û nebaş dike.

b) Di navbera hevokên lêkdayî da ku hemanên wan bi bêhnokê ji hev hatine cudakirin, tê nivîsîn.

Mînak:

Hin hene, bi gotinekê yekî geş dikin; hin jî hene, bi gotinekê jîyanê li ber çavên yekî reş dikin.

Eger zû bigihîje, em ê karê xwe biqedînin; eger zû negihîje, dê karê me dereng bimîne.

6.1.5. Cotxal :

a) Berî axiftina veguhastî ya rasterast tê bikaranîn.^[34]

Mînak:

Celadet Bedirxan: "Ziman şerta heyînê a pêşîn e."

Zanayî got: "Min her tişt amade kirîye."

b) Ji bo ravekirin û pênaseyan tê bikaranîn.

Mînak:

Van tiştan ji bala xwe neavêje: qencî, sebir û merdî

Kar: Ew bêje ne ku kar, tevger û rewşê nişan didin.

Ev tişt ji karmendan tên xwastin:

- Pêwîst e zû werin karê xwe.
- Divê karê xwe bi rêk û pêk bikin.
- Nabe xwe têkilî karên hev bikin.

c) Di demê da ji bo nişankirina tixûbê saet, xulek û çirkeyan tê bikaranîn.

Mînak:

12:30:45

10:20:25

d) Di diyalogê da piştî navê axiveran tê bikaranîn.

Mînak:

Ehmed:

- Te çima bangî min nekir?

^[34] Di vê rewşê da mirov dikare li şûna cotxalê, bêhnokê ji bi kar bîne.

Serdar:

- Tu neketî bala min.

6.1.6. Sêxal ...

a) Piştî risteyên ku nehatine temamkirin tê bikaranîn.

Mînak:

Min gelek caran ji te ra gotîye ku ...

Min gelek tişt anîn: xox, hinar, sêv ...

Di vê rewşê da navber di navbera sêxal û peyvên da tê danîn, lê dema ku nişandekên xalbendiyê yê wekî bangnişan, pirsnişan û dunikê hebin, navber nakeve di nav wan û sêxalê da.

Mînak:

Aldarî got: "... lê vê carê ji xem nake."

Bi ser me da hîlbû û ...!

Tu çima hertim ...?

b) Dema ku mirov bêjeyekê bibire, sêxalê li şûnê bi kar tîne.

Mînak:

Te ew çep... li ku hişt. (çepel)

Wekî qan... ye û fam nake. (qantir)

Ew dev ji pa... bernade. (parsekî)

Di vê rewşê da divê navber di navbera peyva birî û sêxalê da nebe. Eger peyva birî li dawîya risteyê be ji mirov xalê zêde nake.

Mînak:

Kes guh nade wî pî... (pîsî)

c) Gava hin beşên jêwergirtinê nehatibin nivîsîn, sêxal di nav goşebendê da tê dayîn.

Mînak:

“Ji ber ko Hawar di panzdehê Gulana
sala hezar û neh sed û sih û didowan de
*hatiye dinyayê, di panzdehê vê Gulanê de
diviya bû Hawar bibe nehsalî. [...]*

Hawar îro bi tenê nûzake sêsalî ye.” (Hawar, c2: 688)

6.1.7. Pirsnişan ?

a) Piştî risteyên pirsyarî tê bikaranîn

Mînak:

Tu kîjan berhema Ehmedê Xanî dixwînî?

Çima tu dereng mayî?

Rizgar vegeşîya?

b) Li dawîya risteyên temamnêbûyî ku armanca wan pirskirin e, tê danîn.

Mînak:

Kî?

Xwendina te?

Ehmed?

Bavê wî?

c) Li ber agahiya ku cihê şik û gumanê ye, pirsnişan di navbera kevanekan da tê danîn.

Mînak:

Dibêjin ew geleki jêhati (?) ye, lê aqilê min jê nabire.

Dibêjin bapîrên wan (?) ev gund ava kirîye.

d) Di risteyên lêkdayî da dema ku pirs pir bin, riste bi bêhnokan ji hev tînd cudakirin û pirsnişan piştî hevoka dawîn tê nivîsîn.

Mînak:

Tu çî ji min dixwazî, te çî divê?

Melayê Cizîrî ji ku ye, hevçaxê kê ye?

Kengê pirsnişan nayê bikaranîn?

- Gava mirov risteya pirsyarî ya rasterast veguhêze ya nerasterast.

Mînak:

Rasterast	Nerasterast
Ehmedî digot: “Çima hûn bi ser me da nayên?”	Ehmedî digot ka çima em bi ser wan da naçin.
Delilî pirsî: “Hûn di xwendina xwe da gihîştin ku derê?”	Delilî pirsî ka em di xwendina xwe da gihîştine ku derê.

- Gava ku pirsên nerasterast hebin

Mînak:

Rasterast	Nerasterast
Tu yê piştî xwarinê çi bikî?	Mîn dixwast bizanim ka tu yê piştî xwarinê çi bikî.
Gelo sibe dê baran bibare?	Dixwazim bizanim ka sibe baran heye yan na.

6.1.8. Bangnîşan !

- a) Piştî risteyên coş, kêfxweşî, xemgînî, tirs, ecibandin, acizî, heyirîn û hwd tê bikaranîn.

Mînak:

Ez nizanim çima ev hertim wekî xwe dike!

Kes li rewşa me napirse!

Xwezî wiha di karê xwe da jî jêhatî bûya!

- b) Piştî bêje û risteyên bangê tê bikaranîn.

Mînak:

Wî! Ev ji ku derket?

Ox! Dilê min rehet bû!

Xwedayo! Çiqas şîrîn e.

Wa Dilan! Tu yê bi ku ve biçî?

Mîrov dikare bêhnokê li ber bêjeya bangê binivîse û bangnîşanê li dawîya risteyê binivîse.

Mînak:

Ax, bêhna min fireh bû!

Wa, tu dixwazî her tiştî wekî xwe bikî!

- c) Piştî wan risteyên fermanî tê danîn ku acizî, hêrs, rica û hwd dihewînin.

Mînak:

Zû biçê û deriyî li pey xwe bigire!

Niha rabe dest pê bike!

Li min bibore!

- d) Ji bo tinazpêkirin, kêmxistin, bawernekirin û hwd tê bikaranîn. Di vê rewşê da di nav kevanekê da tê dayîn, eger di pey ra riste dom bike, pêwîst e bi tîpa biçûk be.

Mînak:

Gelekî bîaqil e (!)

Zêde zêde dixebite (!) heyran.

Gelek caran birîndar bûye (!) lê tiştek pê nehatiye.

- e) Gava di pirsê da ecibandin, heyirîn û hwd hebe, piştî pirsnîşanê, bangnîşan jî tê danîn, lê ev awa bêhtir di nivîsên wêjeyî da tê bikaranîn.

Mînak:

Te çi jê ra got?!

Wî çi li te vegerand?!

Ma wî alikariya te nekir?!

f) Di nivîsên wêjeyî da ji bo ku hestên ecibandin, heyirîn, tirs, acizî, kêfxweşî û hwd werin dupatkirin, zêdeyî bangnîşanekê tê bikaranîn.

Mînak:

Nexwe wekî xwe kir!!

Dîsa kete wê çalê!!!

Ev aqil nagire!!

6.1.9. Dunik “ ”

a) Di veguhastina rasterast da tê bikaranîn.

Mînak:

Pêşiyên me gotiye: “Rih dibe bost, dijmin nabe dost.”

Xweda di Qurana Pîroz da dibêje: “Bi qencî alîkariya hev bikin.”

Sîpanî got: “Min karê xwe qedandiye.”

b) Ji bo balkişandinê peyv dikevin nav dunikê

Mînak:

Em ê li “Zozanên Feraşîn”ê bigerin.

Celadet Bedirxanî Kovara “Hawar”ê weşand.

Me mijara “hevalnav”ê rave kir.

6.1.10. Yeknik “ ”

Dema ku mirov mecbûr bimîne hevoka di nav dunikê da dîsa bixê dunikê, wê demê “yeknik” tê bikaranîn. Navber nakeve navbera yeknikê û nivîsa di nav da.

Mînak:

Mamostayî ji xwendekarên xwe pirsî: “Pirtûka ‘Nûbara Biçûkan’ berhema kê ye?”

Rojhatî got: “Em rojekê ber bi ‘Wan’ê ve çûn.”

6.1.11. Ducarek “ ”

Dema ku peyvek, frazek, risteyek bê dubarekirin, ji bo careka din neyê nivîsîn, ducarek li şûnê tê bikaranîn.

Mînak:

	cihnav	
Ez	”	xwerû
Min	”	tewandî
Kê	”	pirsyarî
Ev	”	nîşander

6.1.12. Dabir ‘

a) Gava ku tîpek an çend tîp ji gotinekê ketibin, li şûna wan tê bikaranîn.

Mînak:

Te d’go ku di gel te sadîq im ez

Te d’go bi te ra muwafiq im ez (Xanî, 2019: 120)

b) Di helbestên klasîk da li şûna "eyn" a erebî (ع) tê bikaranîn

Mînak:

Şi'ir, Se'id, di'a ...

Wer'efû biki, 'eceb'eta ye (Xanî, 2019: 118)

6.1.13. Bendik -

a) Peyvên ku di rêzê da bi cih nebin û ji hev bîn qutkirin, bi bendikê tîn girêdan.

Mînak:

Hejmara pêşîn a Kovara Hawarê ku Mîr Celadet Bedirxan berpirsê wê bû, 15ê gulana 1932yan derketiye.

b) Ji bo tîkiliya di navbera du peyv an du hejmaran da tê bikaranîn.

Mînak:

Du-sê zarok di vir ra derbas bûn.

Ez di salên 2010-2014an da li Şamê bûm.

Bila ferhengêka "kurdî-erebî" bê amadekirin.

c) Dema ku morfemên peyvekê ji hev bîn cudakirin.

Mînak:

wer-ger-andin

çav-şîn

ve-xwarin

ra-bûn

hil-girtin

d) Ji bo kîtekirina bêjeyan tê bikaranîn.

Mînak:

miz-gî-nî

fer-man-dar

ça-la-kî

a-za-dî

6.1.14. Xêzik (xêzika axiftinê) -

Gava ku gotûbêj di navbera çend kesan da hebe, xêzik li ber gotinên wan tê danîn.

Mînak:

- Dayê tu yê kengê biçî bazarê?

- Ez ê sibe biçim kurê min.

- Dayê listokekê ji min ra bine.

- Bila delalê min, ez ê ji te ra binim.

6.1.15. Xwarexêz /

a) Dema ku rêzikên helbestan li cem hev bîn nivîsin, bi xwarexêzê ji hev tîn veqetandin.

Mînak:

“Dil ji min naket xeyalan / Bûme perwanê şemalan / Bêriya
husn û cemalan / Ay dilê min ay dilo” (Teyran, 2017: 417)

b) Li şûna gihaneka “yan”ê tê bikaranîn.

Mînak:

Divê tu li bin gotina erê/na îmza bikî.

Wê peyamê bide wî/wê berî ku tu biçî.

6.1.16. Kevanek ()

a) Wataya gotin, fraz û risteyan li ber wan di nav kevanekê da
tê dayîn.

Mînak:

Divê em xwe ji asimilasyonê (bişaftin) biparêzin.

Şênîyên gundî bacanên sor (firingî) diçînin.

Me ta bi derziyê ve kir (me bi zelalî got).

• Nişandekên xalbendiyê li derveyî kevanekê tên danîn.

Mînak:

Hawar e, ew fam nake (biaqil nabe)!

Kê wiha kirîye (ev ecêb rakirîye)?

• Eger tiştê di nav kevanekê da risteyek be, lê di nav risteya sereke
da be, divê bi tîpa biçûk dest pê bike.

Mînak:

Me got em ê jê ra bibêjin (bi her halî me niyaz kiribû), lê rewşek
derket û me xwe ji bîr kir.

b) Dema ku mirov agahiyekê ji berhemekê veguhêze, navê
nivîskarê berhemê, sala çapê û hejmara rûpelê di nav kevanekê da
tên dayîn.

Mînak:

Vejîne zimanê xwe ey xwendevan

Nebûye millet hiç kesek bê ziman

Zimanê me xoş û xeroş û ciwan

Eger baş bizanî tu nakî ziyan (Cegerxwîn, c2 2018: 78)

c) Liv û tevgerên şanogeran di nav kevanekê da tên dayîn.

Mînak:

Li ser dika şanoyê, Serdarî (hêdî hêdî xwe nêzi hevalê xwe kir)
got: “Kî ji we xwediyê vî wêneyî dinase?”

Egîd: (bi dengê bilind) Ev wêne yê wêjevanê kurd Feqiyê
Teyran e!

Rojhatî (ji erdê rabû û cilên xwe daweşandin) dest bi helbesteka
wî kir:

“Avê digo: Feqî rabe

Bê tedbîr û 'emel nabe

Ji halê te dê çawa be

J' kê ra diki vê subbetê” (Teyran, 2017: 121)

6.1.17. Goşebend []

a) Di jêwergirtin û xebatên folklorî da gava ku ravekirin, lêzêdekirin an jî serrastkirin pêwîst be, ew ravekirin, lêzêdekirin an jî serrastkirin di nav goşebendê da tê nivîsîn.

Mînak:

"Vê paşîyê Cegerxwînê me [helbestvanekê kurd ê navdar e] yê xweşewîst û hêja ji me re çend bend û xweşxwan rêqirine."
(Hawar, c1: 188)

"Danîyên vê civtê [civatê] hêvîdar in qo hon bi tevayî bi wan re biçin." (Hawar, c1: 43)

b) Gava ku mirov mecbûr bimîne beşekê ji tiştê di nav kevanekê da careka din bixê di nav kevanekê da, wê demê goşebend tê bikaranîn.

Mînak:

Me behsa rewşa zimani (bi taybet asimilasyon [helandin] û bandorên wê) kir.

Ferhengoka Termên Rêzimanî
Grammatical Terms

Kurdi	Îngilîzî
alofon	allophone
alomorf	allomorph
asîmilasyon	assimilation
avanî	voice
avanîya aktif	active voice
avanîya hokarî	causative
avanîya pasîf	passive voice
awaze	intonation
bang	interjection/exclamation
bangên nesereke	secondary interjections
bangên sereke	primary interjections
bangnîşan	exclamation points
bêhnok	comma
bêje/peyv	word
bêjesazî	word formation
bêjeyên dariştî	derived words
bêjeyên lêkdayî	compound words
bêjeyên sade	simple words
bendik	hyphen
berkar	object

berkara nerasterast	indirect object
berkara rasterast	direct object
beşên axiftinê (cureyên bêjeyan)	part of speech (word class)
biker	subject
bingihaneke	subordinating conjunctions
cihnav	pronoun
cihnavê paşnûsek	enclitic pronoun
cihnavê vegerok	reflexive pronoun
cihnavê hevûdinî	reciprocal pronoun
cihnavên kesî	personal pronouns
cihnavên nenasyar	indefinite pronouns
cihnavên nîşander	demonstrative pronouns
cihnavên pêwendiyê	relative pronouns
cihnavên pirsyarî	interrogative pronouns
cihnavên xwedîtiyê	possessive pronouns
dabir	apostrophe
daçek	preposition
dariştin	derivation
dema borî ya berdewam	past continuous
dema borî ya dûr	past perfect
dema borî ya sade	simple past
dema borî ya temam	present perfect
dema dahatî	future tense

dema dahatî ya temam	future perfect tense
dema niha	present tense
deng	sound/voice
dengdêr	vowel
dengnasî	phonology
dengnedêr	consonant
deynkirin	borrowing
dijwata	antonym
diyarker	determiner
dunik	double quotes
dutêper	ditransitive
ergatif	ergative
Fonem	phoneme
fonemên nekertî	suprasegmental phonemes
fraz	phrase
fraza daçekî	prepositional phrase
fraza hevalkarî	adverb phrase
fraza hevalnavî	adjective phrase
fraza karî	verb phrase
fraza navdêrî	noun phrase
gihaneke	conjunction
gihanekeên cudaker	disjunctive conjunctions
gihanekeên demê	time conjunctions

gihanekên dijber	adversative conjunctions
gihanekên mercî	conditional conjunctions
gihanekên ronîker	explanative conjunctions
gihanekên zêdeker	additive conjunctions
gire	affix
gireyên kesî	personal affixes
guhastin	conversion
guvaş	stress
hejmar	number
hevalkar	adverb
hevalkarên çawanîyê	manner adverbs
hevalkarên cextdar	emphatic/focusing adverbs
hevalkarên cihî	place adverbs
hevalkarên demê	time adverbs
hevalkarên dubarekirinê	frequency adverbs
hevalkarên gihanekî	conjunctive adverbs
hevalkarên guman û pêşbîniyê	epistemic adverbs
hevalkarên neyînîyê	negative adverbs
hevalkarên nixandinê	viewpoint adverbs
hevalkarên nişander	demonstrative adverbs
hevalkarên pirsyarî	interrogative adverbs
hevalkarên radeyî	quantity adverbs
hevalnav	adjective

hevalnavên çawanîyê	quality adjectives
hevalnavên nenasyar	indefinite adjectives
hevalnavên nişander	demonstrative adjectives
hevalnavên pirsyarî	interrogative adjectives
hevdeng	homophone
hevgihanek	coordinating conjunctions
hevok	clause
hevoka hevalkarî	adverbial clause
hevoka navberî	parenthetic clause/ comment clause
hevoka navdêrî	noun clause
hevoka nesereke/bend	dependent clause
hevoka pêwendîyê	relative clause
hevoka sereke	Independent/main clause
hevwata	synonym
hilmandî	aspirated
îzafe	ezafe
jêçûna dengî	elision
jêderk û armanc	source and goal
kar	verb
kara	agent
karên alîkar	auxiliary verbs
karên bingehîn	main verbs
karên nerêzîkî	irregular verbs

karên raweyî (modal)	modal verbs
karên rêzîkî	regular verbs
kartêkirî	patient
kêşan	inflection
kêşana karan	conjugation
kîte	syllable
lêkdan	compounding
morfem	morpheme
morfemên bend	bound morphemes
morfemên dariştinî	derivational morphemes
morfemên kargîn	functional morphemes
morfemên rêzimanî	grammatical morphemes
morfemên serbixwe	free morphemes
morfolojî	morphology
nasyarî	definiteness
navbergir	interfix
navdêr	noun
navdêrên cureyî	common nouns
navdêrên hejmarbar	countable nouns
navdêrên komî	collective nouns
navdêrên nehejmarbar	uncountable nouns
navdêrên razber	abstract nouns
navdêrên şênber	concrete nouns

navdêrên taybet	proper nouns
navgîn	instrument
nehilmandî	unaspirated
nenasyarî	indefiniteness
nêtar	neutral
pareng	participle
paşgir	suffix
paşraveker	postmodifier
pêşgir	prefix
pêşraveker	premodifier
pêveber	predicate
pevgirêdan (peydabûn dengî)	liaison
peyvîrî	word order
pirsnîşan	question mark
pirwata	polysemous
pragmatîk	pragmatic
qurm	stem
rader	infinitive
raveker	modifier
ravekirî	modified
ravekirin	modification
rawe	mood
raweya dananî	subjunctive mood

raweya fermanî	imperative mood
raweya ragihandinî	indicative mood
reh	root
rêkeftin	agreement
rewş	case
rewşa bangkirinê	vocative case
rewşa tewandî	oblique case
rewşa xwerû	direct case
rêziman	grammar
riste	sentence
risteya bangî	exclamation sentence
risteya erênî	positive sentence
risteya fermanî	imperative sentence
risteya lêkdayî	compound sentence
risteya neyinî	negative sentence
risteya pirsyarî	interrogative sentence
risteya ragihandinî	declarative sentence
risteya sade	simple sentence
risteya têkel	complex sentence
rolên watayî	semantic roles
sere (serbêje)	head
sêxal	ellipsis
wext	time

taqîker	experiencer
temamker	complement
temamkera berkarê	object complement
temamkera bikerê	subject complement
têneper	intransitive
têper	transitive
têrker	adjunct/adverbial
tewang	declension
tîp	letter
tîpên girdek	capital letters
tîpên hûrdek	small letters
veguhastina nerasterast	indirect speech
veguhastina rasterast	direct speech
watanasî	semantics
wergir	recipient
xal	full stop
xalbêhnok	semicolon
xalbendî	punctuation
xêzik	dash
xuyang	aspect
xuyanga adetî	habitual aspect
xuyanga berdewam	progressive aspect
xuyanga dubare	iterative aspect

xuyanga netemam	imperfective aspect
xuyanga temam	perfective aspect
xwarexêz	slash
yeknik	single quote
yektêper	monotransitive
zayend	gender
zimannasî	linguistics

ÇAVKANÎ

1. Aydogan, İ. S. (2013). *Guman-1*. Amed: Lis
2. Aydogan, M. (2012). *Rêbera Rastnivîsinê*. Stenbol: Rûpel
3. Baran, B. (2018). *Rêzimana Kurmancî*. Amed: Wardoz
4. Bedirxan, C. A. (2002). *Elfabêya Kurdi û Bingehên Gramêra Kurdmancî*. Stockholm: Nefel
5. Bingol, I. (2020). *Rêzimana Zazakî ya Devoka Gimgimê*. Stenbol: Avesta
6. Bozarslan, M. E. (2008). *Bexçê Zimên 1*. Amed: Deng
7. Bozarslan, M. E. (2013). *Bexçê Zimên 2*. Amed: Deng
8. Ebdulfetah, D. (2020a). *Nav di zimanê kurdi de kurmancîya jorîn*. Qamişlo: Neqş
9. Ebdulfetah, D. (2020b). *Kar di zimanê kurdi de kurmancîya jorîn*. Qamişlo: Neqş
10. Ebdulfetah, D. (2020c). *Cinav di zimanê kurdi de kurmancîya jorîn*. Qamişlo: Neqş
11. Ebdulfetah, D. (2018). *Mistek ji Hêvi û Arîşeyên Zimanê Kurdi*. Amed: Lis
12. Farqîni, Z. (2019). *Lêker û Rastnivîsina Wan (ji aliyê binyatî ve)*. Stenbol: Enstituya Kurdi ya Stenbolê
13. *Ferbenga Termên Ziman û Zimannasîyê* (çapnebûyî). Amed: Weqfa Mezopotamyayê
14. Kani, E. (2017). *Morfolojiya Kurmancî û Zimannasî*. Amed: J&J

15. Komxebata Kurmanciyê, (2019). *Rêbera Rastnivîsînê ç2*. Amed: Weqfa Mezopotamyayê
16. Kovara Hawarê c1. (1998). Stockholm: Nûdem
17. Kovara Hawarê c2. (1998). Stockholm: Nûdem
18. Kovara Ronahiyê c1. (1985). Stockholm: Jîna Nû
19. Kurd, R. (1990). *Rêziman a Zimanê Kurmancî*. Beyrût: Kombenda Kawayê
20. Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî* (werg. Zülküf Ergün). Stenbol: Nûbihar
21. Muhammed, H. (2016). *Peyvazî di zimanê kurdî de*. Çapeka taybet
22. Muhammed, H. *Dengnasî di Kurdî de*. Çapeka taybet
23. Ocek, N. (2019). *Rêzimana Kurmancî*. Wan: Sitav
24. Tan, S. (2015). *Rêzimana kurmancî*. Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê
25. Tigrîs, A. (2001). *Pêşkît û Parkît*. Stockholm: Meyda
26. Zal, A. (2015). *Zimanê Kurdî*. Amed: Enstîtuya Kurdî ya Amedê
27. Xanî, Ehmed. (2019). *Hemû Berhem* (amad. Lîs). Amed: Lîs
28. Teyran, F. (2017). *Feqîyê Teyran Jîyan, Berhem û Helbestên wî* (amad. M. Xalid Sadîni). Stenbol: Nûbihar
29. Cegerxwîn, (2018). *Ronahî li pey Tarî ye c1* (amad. Lîs). Amed: Lîs
30. Cegerxwîn, (2018). *Ji min Dil Bir bi Carek c2* (amad. Lîs). Amed: Lîs
31. Altinkiliç, Ü. (2020). *Xuyang û Forma Rêzimanî ya Rewşan di Kurmanciyê da*. Folklor û Ziman, c1/h2, r.135-158

32. Bülbül, M. (2020). *Hevokên Peywendiyê û Peyvêziya wan*, gotar
33. Bülbül, M. (2020). *Peyvêzi di frazên navdêri da* (devoka Mêrdînê). Mesopotamian Studies, c2/h1, r.89-117
34. Bülbül, M. (2020). *Rola Paşgira Partîsip di Çêkirina Raweyên Ragihandinê, Dananî û Merci da*. Folklor û Ziman c1/h1, r.110-126
35. Zilan, R. (1989). *Raweya neyînî ya lêkera bînê*. Kovara kurmancî, h5, 36-38
36. Farqînî, Z. (2020). *Morfolojiya Navdêri*. Notên waneyên rêziman û zimannasiyê yê Weqfa Mezopotamyayê, Online
37. Farqînî, Z. (2020). *Teşenasîya Navdêri*. Notên waneyên rêziman û zimannasiyê yê Weqfa Mezopotamyayê, Online
38. Muhammed, H. (2015). *Rebê Dema Niha yê Lêkeran*. Zimannas JULY 10, 2015 ZIMANNASLEAVE A COMMENT
39. Tan, S. (2020). *Kategoriyên Têkildari Lêkeran*. Notên waneyên rêziman û zimannasiyê yê Weqfa Mezopotamyayê, Online
40. Rizgar, B. Pirs û Mijarên Zimanê Kurdî. <https://sites.google.com/a/baranrizgar.co.cc/azadiya-kurdistane/baran-rizgar-ki-ye>

Kurmancîya behdîni û soranî

41. مارف، نه ج. (2015). فەرهنهنگی زاروهی زمانناسی. ههولێر: دهزگای چاپ و بلاوکردنهوهی رۆژهلآت
42. دزهیی، ع. م. (2014). ریزمانی کوردی. ههولێر
43. دزهیی، ع. م. (2015). زانستی سیماننیک. ههولێر
44. خوشناو، ن. ع. (2017). رسته‌سازی. ههولێر: چاپخانه‌ی رۆژهلآت
45. خوشناو، ن. ع. (2015). ده‌نگسازی. ههولێر: چاپخانه‌ی هیقی

46. خوشتا، ن. ع. (2013). ریزمانی کوردی. ههولیر: چاپخانه هیقی

47. عهلی، ش. س. (2011). واتا د ناڤههرا سیمانتیک و پراگماتیکیدا. دهۆک: سپیریز

Erebî

48. النوري، م. ج. (2007). علم الأصوات العربية. الأردن: جامعة القدس المفتوحة

49. حرکات، م. (1998). الصوتيات و الفونولوجيا. القاهرة: الدار الثقافية

50. الخولي، م. ع. (2000). مدخل الى علم اللغة. الأردن: دار الفلاح

51. الخولي، م. ع. (2001). علم الدلالة. الأردن: دار الفلاح

52. أنيس، ا. (1975). الأصوات اللغوية. مكتبة الانجلو المصرية

53. بشر، ك. (2000). علم الاصوات. القاهرة: دار غريب

54. حسنين، ص. (2006-2005). المدخل في علم الاصوات المقارن. مكتبة الآداب

55. علي، م. م. ي. (2004). مدخل الى اللسانيات. ليبيا: دار الكتب الوطنية

56. عمر، ا. م. (1997). دراسة الصوت اللغوي. القاهرة: عالم الكتب

57. عمر، ا. م. (1998). علم الدلالة. القاهرة: عالم الكتب

58. قدور، أ. م. (2008). مبادئ اللسانيات. دمشق: دار الفكر

Îngilîzî û fransîzî

59. Aarts, B., Chalker, S. & Weiner, E. (20014). *The Oxford Dictionary of English Grammar*. United Kingdom: Oxford University Press

60. Bedir Khan, D. & Lescot, R. (1970). *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)*. Paris: Librairie d'amérique et d'orient

61. Börjars, K. & Burridge, K. (2010). *Introducing English Grammar*. London: Hodder Education, an Hachette UK Company

62. Brown, K. & Miller, J. (2013). *The Cambridge Dictionary of Linguistics*. Cambridge University Press

63. Carstairs-McCarthy, A. (2002). *An introduction to English Morphology*. Edinburgh: Edinburgh University Press

64. Carter, R. & McCarthy, M. (2006). *Cambridge Grammar of English*. Cambridge University Press

65. Crystal, D. (2008). *A Dictionary of Linguistics and phonetics*. Blackwell

66. Farlex International, (2017). *Complete English Punctuation Rules*. USA & Ireland

67. Gelderen, E. (2010). *An Introduction to the Grammar of English*. Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company

68. Huddleston, R., K. Pullum, G. & Reynolds, B. (2022). *A Student's Introduction to English Grammar*. Cambridge University Press

69. Knight, R. (2012). *Phonetics*. Cambridge University Press

70. McMahon, A. (2002). *An Introduction to English Phonology*. Edinburgh: Edinburgh University Press

71. Miller, J. (2002). *An introduction To English Syntax*. Edinburgh: Edinburgh University Press


72. Neslon, G. & Greenbaum, S. (2016). *An Introduction to English Grammar*. London & New York: Routledge

73. Payne, T. E. (2011). *Understanding English Grammar*. Cambridge University Press

74. Plag, I. (2003). *Word-Formation in English*. Cambridge University Press

75. Yule, G. (2020). *The Study of Language*. Cambridge University Press

A3





 SZK
2007

RÊZIMAN

Rêz û rêzikên xebitîna zimanekî û avahîsazîya wî diyar dike, rêziman aliyên zimanî yê nêzelal zelal dike. Bi rêya rêzimanê mirov bêhtir serwestî zimanekî dibe û dikare di xwendin, nivîsin û axiftinê da bi kar bîne.

Rêziman bi wataya xwe ya teng binyada riste û bêjeyan ango ristesazî û morfolojîyê vedikole, lê bi wataya xwe ya fireh tevî ristesazî û morfolojîyê, dengnasî, watanasî û heta bi pragmatîkê jî vedihewîne.